KT

ZANÎNGEHA MARDİN ARTUKLUYÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYEYÊ

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

TEXEYYULA NASNAMEYA NETEWEYÎ DI OTOBIYOGRAFIYÊN REWŞENBÎRÊN KURD DE (1908-1960): EKREM CEMÎLPAŞA, KADRÎ CEMÎLPAŞA, NÛRÎ DERSÎMÎ

ÖMER FIRAT BAVLİ

16711032

ŞÊWIRMEND

Endamê Hîndekariyê Dr. SHAHAB VALI

MÊRDÎN 2022

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum *Texeyyula Nasnameya Neteweyî di Otobiyografiyên Rewşenbîrên Kurd de (1908-1960): Ekrem Cemîlpaşa, Kadrî Cemîlpaşa, Nûrî Dersîmî* adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- ☐ Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- ☐ Tezim sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- ☐ Tezimin … yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

06/04/2022

Ömer Fırat BAVLİ

KABUL VE ONAY

Ömer Fırat BAVLİ tarafından hazırlanan **Texeyyula Nasnameya Neteweyî Di Otobiyografiyên Rewşenbîrên Kurd De (1908-1960): Ekrem Cemîlpaşa, Kadrî Cemîlpaşa, Nûrî Dersîmî** adındaki çalışma, 06.04.2022 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği ile kabul edilmiştir.

[İ m z a]

Doç. Dr. Ayhan TEK (Başkan)

Dr. Öğr. Üyesi Shahab VALİ (Üye)

Dr. Öğr. Üyesi Yılmaz ÖZDİL (Üye)

SPASÎ

Dixwazim sipasiya wan kesan bikim ku beyî wan ne mimkun bû ev xebat derkeve holê. Di serî de spasiya mamoste Shahab Vali, dikim ku bi sebreke bêsînor rêberiya vê xebatê kir. Her tim alîkarî û piştgiriya xwe ji min kêm nekir. Yılmaz Özdil û Ayhan Tek bi rexne û pêşniyazên xwe kirin ku xebata min pêşve biçe û temam bibe, mala wan ava. Taybetî spas bo Kübra Özek Bavli ku hertim alîkarî û piştgirî da min û ez motive kirim. Spas bo Kenan Demir, Roni Bedirxan ku bi taybetî redaksiyona xebatê de gelek alîkarî dane min. Spas Salih Tanrıverdi, Havin Kiye, Sabih Özer, Robin Özel, Pelda Bal, Ekrem Yıldız ku di vê pêvajoyê de bi hevaltiya xwe hêz dane min.

KURTE

Rewşenbîr bi xebat û çalakiyên xwe yên entelektuel di avakirina nasnameya neteweyî de xwedî cihekî girîng in. Parçeyên çandî yên ku nasnameya neteweyî li ser tê avakirin, encama xebatên rewşenbîran e. Ligel vê bi çalakiyên propagandayê dikin ku nasnameya neteweyî di nava girseyên mezin de berbelav bibe. Ji ber van şertê hebûna nasnameya neteweyî ya modern di serî de hebûna entelîjansiya ye. Rewşenbîriya modern a kurdî di dawiya sedsala 19an de li Stenbolê derket holê û di pêşxistina nasnameya kurdî ya modern de roleke aktîf leyst. Van rewşenbîrên serdema pêşîn ku bi avabûna komara Tirkiyê re radeyeke mezin derketin derveyê welat, li vir xebatên xwe yên rewşenbîrî domandin. Bi lêkolînên li ser ziman, folklor, dîrok û edebiyata kurdî lîteraturek mezin afirandin ku otobiyografiyên wan jî beşek ji van xebatan e. Otobiyografî ew berhem in ku ji desta pêşîn jiyana mirov vedibêjin. Nivîskar di otobiyografiyên xwe de cî didin bûyerên jiyanê yên ku ji bo wan watedar û girîng in. Di otobiyografiyên ku ji aliyê rewşenbîrên Kurd ve hatine nivîsandin de nivîskar behsa têkoşîna nasnameya neteweyî û helwest û xebatên xwe yên di riya vê têkoşînê dike. Di vê xebatê de ku otobiyografyên Ekrem Cemîlpaşa, Kadrî Cemîlpaşa û Nûrî Dersîmî tê de cih digire, di otobiyografiyê her sê rewşenbîran de texeyyula nasnameya neteweyî dê were vekolîn. Texeyyula nasnameya neteweyî, têkoşîna nasnameyê û kifşa nasnameya neteweyî di vegotinên otobiyografîk de çawa derbûye, tê nîqaşkirin.

Peyvên Sereke: Rewşenbîr, Nasnameya Neteweyî, Otobiyografî

ÖZET

Aydınlar entelektüel çalışmaları ve eylemleriyle ulusal kimliğin inşasında önemli bir konuma sahiptirler. Ulusal kimliğin üzerine inşa edildiği kültürel parçalar entelektüel çalışmaların bir sonucudur. Aynı zamanda aydınlar ulusal kimliğin geniş kitlelere yayılmasını sağlayan propaganda faaliyetlerinde de bulunurlar. Bu yönleriyle modern ulusal kimliğin varlık şartı öncelikle bir entelijansiyanın varlığıdır. Modern Kürt entelijansiyası 19. Yüzyılın sonlarında İstanbul'da ortaya çıktı ve modern Kürt kimliğinin gelişiminde aktif bir rol üstlendi. Türkiye Cumhuriyeti'nin kurulması ile beraber büyük oranda yurt dışına çıkan bu erken dönem aydınları entelektüel çalışmalarına burada devam ettiler. Kürt dili, folklorü, tarihi ve edebiyatı ile ilgili çalışmalar ile geniş bir literatürün oluşmasını sağladılar, yazdıkları otobiyografiler de bu çalışmaların bir parçasıdır. Otobiyografiler kişinin hayatını birinci ağızdan anlattığı eserlerdir, yazarlar kendileri için anlamlı olan ve önemli gördükleri yaşam olaylarına yer verirler otobiyografilerde. Kürt aydınları tarafından yazılan otobiyografiler de yazarlar yoğunlukla ulusal kimlik mücadelesi ve bu mücadele içindeki konumları ve çalışmalarını anlatırlar. Ekrem Cemilpaşa, Kadri Cemilpaşa ve Nuri Dersiminin otobiyografilerini kapsayan bu çalışmada her üç aydının otobiyografilerinde ulusal kimlik tahayyülü incelenmektedir. Ulusal kimliğin keşfi, kimlik mücadelesi ve aydınların kürtlük algısının otobiyografik anlatılara nasıl yansıdığı ele alınmaktadır.

Anahtar Sözcükler: Aydın, Entelektüel, Ulusal Kimlik, Otobiyografi

ABSTRACT

Intellectuals have an important position in building national identity with their intellectual studies and actions. Cultural parts, which is the national identity was built on, are a result of intellectual studies. Intellectuals also have propaganda activities that allow spreading of national identity a wide range of audiences. With these aspects, the condition for the existence of modern national identity is primarily the existence of an intelligentsia. The modern Kurdish intelligentsia emerged in Istanbul in the late of 19th century and they took an active part in the development of modern Kurdish identity. After the establishment of the Turkish Republic, these early period intellectuals mostly went abroad and continued their intellectual studies there. They created a large literature with studies on Kurdish language, folklore, history and literature. Their autobiographies are also a part of these works. Autobiographies are the first-hand study of human life. Authors include life events that are meaningful and important to them in their autobiographies. In Kurdish intellectuals' autobiographies, writers mostly talk about the struggle for national identity, their position in this struggle and their studies. In this study, which includes the autobiographies of Ekrem Cemilpaşa, Kadri Cemilpaşa and Nuri Dersimi, the imagination of national identity is examined. The discovery of national identity, the struggle for identity and Intellectuals' perception of Kurdisness how reflected in their autobiographies are discussed.

Keywords: Intellectual, National Identity, Autobiography

NAVEROK

TAAHHÜTNAME ..... **I**
KABUL VE ONAY ..... **II**
SPASÎ ..... **III**
KURTE ..... **IV**
ÖZET ..... **V**
ABSTRACT ..... **VI**
NAVEROK ..... **VII**
DESTPÊK **9**
BEŞA YEKEM: REWŞENBÎR Û NASNAME **13**
1.1. Rewşenbîr 13
1.1.1. Vegira Têgeha Rewşenbîr: Rewşenbîr an Entelektuel? 14
1.1.2. Zayîna Rewşenbîr 17
1.1.3. Rewşenbîr Kî ye? 23
1.2. Nasname 35
1.2.1. Cûreyên Nasnameyê 38
1.2.2. Nasnameya Kolektîf 40
1.2.3. Nasnameya Neteweyî û Neteweperwerî 42
1.3. Nasname û Rewşenbîr 49
BEŞA DUYEM: ZAYÎNA REWŞENBÎRIYA KURDÎ YA MODERN **52**
2. 1. Bingehên Rewşebîriya Kurdî ya Modern 52
2.1.1. Di Sedsala Nozdemîn de Tevgerên Kurdî 52
2.1.2. Modernbûna Kurdî 55
2.2. Elîtên Kurd, Rewşenbîrên Pêşîn 64
2.2.1. Rojnameya Kurdistan 64
2.2.2. Pêşengê Neteweperweriya Modern: Hecî Qadîrê Koyî 67
2.3. Meşrûtiyeta 2emîn a Osmanî û Xebatên Rewşenbîriyê li Stenbolê 68
2.3.1. Kürt Teavun ve Terakki Cemiyetî (Komeleya Alîkarî û Pêşketina Kurdî) 69
2.3.2. Hêvi Kürt Talebe Cemiyetî (Hêvî Komeleya Xwendekarên Kurd) 70
2.4. Kürt Tealî Cemiyetî (Komeleya Pêşketina Kurdistanê) 72
2.5. Rewşenbîriya Kurdên Sovyetê 73
2.6. Ekola Binxetê 75

BEŞA SÊYEM: TEXEYYULA NASNAMEYA NETEWEYÎ DI OTOBIYOGRAFIYÊN REWŞENBÎRÊN KURD DE 79
3.1. Otobiyografî 79
3.1.1. Otobiyografiyên Rewşenbîrên Kurd 80
3.1.2. Otobiyografiyên Xebatê: Muhtasar Hayatım (Ekrem Cemîlpaşa), Doza Kurdistan (Kadrî Cemîlpaşa), Hatıratım (Nûrî Dersîmî) 81
3.2. Geşedana Nasnameyî ya Rewşenbîran di Otobiyografiyan de 82
3.3. Kifşa Nasnamaye Neteweyî 84
3.3.1. Qehwexaneyên Kurdî yên Stenbolê 86
3.3.2. Çalakî û Xebatên Çandî 88
3.4. Texeyyula Nasnameya Neteweyî di Otobiyografiyan de 92
ENCAM 102
ÇAVKANÎ 104

DESTPÊK

Rewşenbîr ango qismê perwerdebûyî/zana yê civakê, bo dewlet û neteweyên xwe aktorên girîng ên siyasî û civakî ne. Ew di veguherînên siyasî û civakî de weke hêmaneke jêneger derdikevin pêşberî me. Veguherîn, geşedan rêya bi rewşenbîran pêkan dibin. Nemaze ev du sed salên dawî li seranserê dinyayê dîrok şahidiya rolên rewşenbîran dike. Fonksiyona civakî ya rewşenbîran piştî Şoreşa Frensî ya 1789an berbiçavtir bû, bi şoreşê re monarşî û împaratorî pêl bi pêl hilweşiyan û cihê xwe ji netewe-dewletan re hiştin. Di pevajoya netewebûna civakan û di tevgerên polîtîk yên neteweyî de rewşenbîr xwedan roleke mezin bûn, hem bi xebatên entelektuel ên nivîskî hem jî bi çalakiyên polîtîk. Van pêncî salên dawî di zanistiyên civakî de xebatên ku li ser neteweperweriyê tên kirin bi taybetî li ser rewşenbîr radiwestin.

Entelîjansiya modern a Kurdî di dawiya sedsala 19mîn de li Stenbolê, li navenda Împaratoriya Osmanî, derket holê. Gelemperî ji malbatên arîstokrat dihatin ku berê di rêvebirina herêmên Kurdan de weke mîran roleke aktîf digirtin. Têkiliyên wan bi Kurdistanê re rasterast tune bû, qismek mezin di burokrasiya Osmanî de cî digirtin. Di pêvajoya hilweşîn û belavbûna dewleta Osmaniyan de rewşenbîriya Kurdî, xebatên xwe bo destkeftiyên neteweyî yên Kurdan pêk dianî. Pêşdebirina civaka Kurdan û bidestxistina statuyeke siyasî armancên sereke yên vê civatê bûn. Ji bo vê, bi komeleyan, birêxistina xwe ava kirin, bi kovar û rojnameyan hewl dan mafên civakî yên Kurdan bînin ziman. Lêbele, piştî avabûna Komara Tirkiyê çalakiyên wan li Stenbolê û li Kurdistanê rawestiya, rewşenbirên Kurd ji Stenbolê bere xwe dan derveyî welat.

Sûriyeya ku wê demê koloniyeke Fransî bû, bo rewşenbîrên Kurd bû wargeha çalakiyên rewşenbîriyê. Rewşenbîrên Kurd, bi rêya rêxistinên siyasî, xebatên xwe yên weşangeriyê û çalakiyên xwe li vê dere domandin. Di gelek cureyên edebî de berhem hilberandin û bi xebatên xwe yên çandî, dîrokî û folklorîk di geşedana nasnameya kolektîf ya Kurdî de roleke girîng leystin. Bi awayê polîtîk di avakirina nasnameya kolektîf a Kurdî de hewce ye rola wan were vekolîn û famkirin. Ez ê hewl bidim bi rêya otobiyografiyên sê rewşenbîrên serdemê fehma Kurdayetiya wan têbigihêm.

Otobiyografî aliye nivîskar, siyasetmedar, hunermend û leşkeran ve bo parvekirin û qeydkirina rûdanên civakî, qalkirina çîroka jiyanê tên nivîsandin. Di nava dorhêla rewşenbîr ya Kurdî kêm kes hene ku otobiyografiyên xwe nivîsandine. Weke bincûreyeke otobiyografiyê

bîranîn hatibin nivîsandin jî jimara wan jî pir kêm in. Li gor armanca nivîsandinê bîranîn xwedan qerekterên cihê ne. Rewşenbîrên Kurd ên ku bîranînên xwe nivîsandine kêm in, yên hatine nivîsandin jî gelemperî xwedan qerekterekî civakî û dîrokî ne. Bîranînên rewşenbîrên Kurd ji ber qerekterên xwe yên civakî û dîrokî di heman demê de belgeyên dîroka nêzik in jî. Derbarê geşedana cemaeta rewşenbîrên Kurdî û çalakiyên wan ên bo nasnameya Kurdî, rasterast ji kesên yekem tên ziman.

Otobiyografi piştî demek di ser wê bûyerê re derbas dibe tên nivîsandin, kesên ku dinivsînin, bûyerên ku bo wan watedar an jî pêwîst in hildibijêrin. Belam bûyer ji aliyê rewşenbîran ve tên bijartin û bîranîn hilberînên hafızaya wan e ji mudaxaleya rewşenbîr re vekirî ne. Ev mudaxale hin caran rasterast hin caran jî bi awayekî derhişî pêk tê. Ji ber vê yekê şexsiyet, çalaki, raman û baweriyên wan di avakirina van bîranîn de çawa bandor dike hewceyê vekolînê ye. Ez ê hewl bidim di vê xebatê de bandora nasnameya kolektîf a neteweyî, pêvajoya veguherînên nasnameyî ya rewşenbîran, rasterast ji tecrube û bîranînên wan vekolim. Pirsên wek: 'Rewşenbîrên Kurd xwe çawa pênase dikin? Pêvajoya avabûna vê pênaseyê di bîranînan de çawa cî digre? Têkiliya wan bi nasnameya kolektîf a neteweyî re çawa ye û Kurdbûnê çawa pênase dikin?' pirsên sereta yên vê xebatê ne ku çarçoveya lêkolînê pêk tînin.

Otobiyografiyên ku hatine analîzkirin di serdema 1950-1980yan de hatine nivîsîn. Wê demê em dibînîn ku li hemû derê dinyayê tevgerên rizgariya neteweyî aktîf û bihêz bûn, neteweperwerî li çar aliye cîhanê bihêz bû, li hember kolonîzasyonê têkoşînên neteweyî bilind bûbûn. Di wê atmosferê de, rewşenbîrên kurd, netewe û neteweperwerî çawa pênase dikirin? Di jiyana wan de nasnameya Kurdî xwedan giraniyek çawa ye? Nasnameya Kurdî bi dîskûrek çawa tê avakirin? Dîsa pirsên vê xebatê ne ku ez ê hewl bidim di otobiyorafiyan de li bersiva wan bigerim.

Yek ji armancên vê xebatê di avakirina nasnameya kolektîfa neteweyî de famkirina rola rewşenbîran e. Dixwazim bi vê xebatê fam bikim ku di vê pêvajoyê de bîreweriya ku rewşenbîr beralî têkoşîna nasnameyî dike çawa derdikeve holê. Ji ber vê yekê, ev xebat, li ser bîranînên rewşenbîrên nifşa pêşeng radiweste. Rewşenbîrên nifşa ewil di avakirina nasnameya neteweyî de hêmanên eslî ne. Rasterast ji ziman û tecrubeya wan analîza vê yekê girîng e ji ber ku di emê bi vî awayî bibinin ka rewşenbîr geşedana tevgera neteweyî de xwe li çawa bicih dike. Belam ji ber ku daxwaza min fehma dîskûra rewşenbîr bi xwe ye tenya li ser otobiyografiyên ku ji aliyê rewşenbîr bi xwe ve hatiye nivîsîn û çapkirin xebitîm.

Ji bo xebatê sê otobiyografî hatin bijartin. Ekrem Cemilpaşazade - *Muhtasar Hayatım*, Nûrî Dêrsimî – *Hatıratım*, Kadri Cemilpaşazade - *Doza Kurdistan.* Sê otobiyografî xwedan du hevpariyên girîng in. Her sê jî qala heman serdema dîrokî dikin û her sê rewşenbîr jî heman dorhêla rewşenbîriyê parvedikin. Di heman serdemê de xebatên polîtîk ên Kurdî nas kirin û têkoşînên hevpar dan. Ev yek piştî peydabûna hestên neteweyî heta dawiyên jiyanê berdewamkir. Sê rewşenbîr di sê xalên jiyanê de ji heman pêvajoya dîrokî derbas bûn: Perwerdehî, tekoşîn û sirgun. Ji ber van taybetmendiyên rewşenbîran, otobiyografiyên wan hatin bijartin.

Otobiyografî ji ber ku pêvajoya jiyanê ya demek dirêj dihundirînin derfet didin ku em li ser geşedana nasnameyî ya nivîskar şîroveyan bikin. Rûdanên siyasî, ekonomik, civakî çawa li ser nasnameyê bandor kiriye dikare were şopandin. Otobiyografî honandina jiyanê bi xwe ye, nivîskar di vê honakê-otobiyografî- de netewe, nasnameya neteweyî û xebatên bo nasnameyê çawa bicîh dike bi analîza naveroka otobiyografiyan dikare were eşkerekirin. Ezê jî di xebatê de bi metoda analîza naverokê hewl bidim ku texuyyula nasnameya neteweyî ya rewşenbîran di otobiyografiyên wan de vekolim.

Xebat ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem a tezê de ku ev beş di heman demê de çarçoveya teorîk a tezê pêktîne, nîqaşên derbarê têgeha kategoriya rewşenbîriyê û têgeha nasnameyê bi taybetî jî nasnameya neteweyîdê werin pêşkêşkirin. Wesf û terîfên rewşenbîriyê, fonksiyonên rewşenbîr, poziyona wî ya civakî dê li derdora pirsa "Rewşenbîr Kî ye?" were nîqaşkirin Koka dîrokî ya mefhûmê, pêkhatina entelîjansiya modern dê were pêşkêşkirin. Berdewamê de li ser têgeha nasnameyê de were rawestan. Piştî pêşkêşkirina lîteratura xebatên nasname û nasnameya neteweyî, têkiliya nasnameya neteweyî û neteweperwerî dê were nîqaşkirin. Di binbeşa dawî de, di avabûna hişmendiya neteweyî de rola rewşenbîr, dê were nîqaşkirin.

Di beşa duyem a lêkolînê de pêvajoya peydabûna rewşenbîriya modern a Kurdî dê were pêşkêşkirin. Bingehên rewşenbîriya modern, bandora pêvajoya modernbûna dewletên Osmanî û Îranê, pêvajoya hewldanên modernîzasyona Kurdî tê nirxandin. Dîsa di vê beşê de bandora tevgerên siyasî yên Osmanî çawa li ser tevgerên Kurdî bandor kiriye hatiye analîzkirin. Pirsên, dezgeh û weşanên neteweyî yên pêşîn kengê avabûn, armanca van saziyan çi bûn, di vê beşê de dê were bersivandin.

Di beşa sêyem de ku navenda vê lêkolînê ye, piştî agahiyek kurt ê derbarê otobiyografiyan texeyyula nasnameya neteweyî ya di otobiyografiyên sê rewşenbîrên kurd dê were vekolîn. Pêvajoya geşedana nasnameyê, cihê nasnameya neteweyî di jiyana wan de dê

were analîzkirin. Her sê rewşenbîr jî endamên nifşên ewil ên rewşenbîriya modern a Kurdî ne. Her çend beriya wan xebatên Kurdî hebin jî, bi naverokên xwe ew ne xwedan huviyetek polîtîk in. Kurdbûn cara ewil bi rêya nifşên pêşîn ên rewşenbîriye veguheriye kirûyeke sosyo-polîtîk. Ji ber vê yekê kifşa wan a nasnameya neteweyî ya takekesî di heman demê de xwedan wateyeke civakî ye jî. Rewşenbîrên Kurd Kurdbûna xwe çawa hisiyan û şûnde bo vê çi kirin dîsa di vê beşê de dê were destnîşankirin. Dawiyê de îdraqa wan a derbarê nasnameya neteweyî, nasnameya kurdî dê were pêşkêşkirin.

BEŞA YEKEM: REWŞENBÎR Û NASNAME

1.1. Rewşenbîr

Dema em li dîroka veguherînên civakî û siyasî yên dinyayê binêrin em dibînin ku rewşenbîr her tim roleke diyarker dileyzin. Ev yek ne rewşeke lokal e, bi herêmekê an jî bi cografyayekê ne sînorkirî ye. Bi wateya xwe ya îro rewşenbîr (an jî entelektuel) li Ewrûpayê, hem weke hîlberîn hem jî weke aktoreke girîng ya veguherînên civakî û siyasî ya Ewrûpayê derkete holê. Weke aktoreke girîng ê veguherînên Ewrûpî rol û berpirsyariyên mezin li ser milê xwe kir. Lêbelê rola rewşenbîra/ê modern bes bi erdnîgariya Ewrûpa –rojava- ve nikare were sînordarkirin û nirxandin. Rewşenbîr, di wan civakên ku di pêvajoyên netewebûn û moderbûnê de dereng mane, de jî xwediyê heman rolê ne. Dikare were gotin li ku derê aksiyonek siyasî, civakî hebe li wê derê rewşenbîr jî heye. Weke ku Edward Saîd (2013: 27) destnîşan dike, di dîroka modern de, di hemû bûyerên mezin û di şoreşan de rola rewşenbîr heye, ew "zarok" û "bav"ên van şoreşan in. Ji ber vê yekê, ku rol û bandora rewşenbîran di van pêvajoyan de neyê nirxandin, analîza veguherînên civakî dê qels bimîne. Xebatên ku dixwazin veguherînên civakî, çandî û polîtîk yên civakan fam bikin divê rola rewşenbîrên wê civakê jî ji bîr nekin.

Di vê peywendiyê de rewşenbîr û rewşenbîrî ku dînamîkeke sereke ya veguherîn û tevgerên rojavayê ye, di heman demê de yek ji mijarên sereke ya lêkolînên zanistiyên civakî ye. Di vê sedsala dawî de gelek xebat hene ku li ser rol, fonksiyon û terîfa rewşenbîr radiwestin û hewl didin di pêvajoya hilberîna zanînê de cihê rewşenbîr fam bikin. Ji roja zayîna rewşenbirê/a modern heta îro nîqaşên li ser rewşenbîr hîn berdewam in. Wisa ku lîteratura sosyolojiya rewşenbîran, roj bi roj berfirehtir dibe.

Entelîjansiyaya modern piştî ku li Ewrûpayê weke civateke nû derkete holê bi bandora kolonîzasyon û tevgerên modernbûnê pêl bi pêl belavî dinyayê bû û li gelemperê dinyayê cemaetên rewşenbîran peyda bûn. Helbet beriya rewşenbîr jî li her derê dinyayê sinifên civatên perwerdebûyî ango civatên bi zanînê re mijûl hebûn ku pêdiviyên entelektuel dianîn cî. Lêbelê weke sinifeke nû, rewşenbîrên modern îlhama xwe rasterast ji modelên Ewrûpayê digirtin. Ne tenê weke komekê, bi sekna takekesî jî fîgura Ewrûpî dihat mînakgirtin. Li erdnîgariyên cûda, lê xwedî heman perspektîfên ramanî bûn. Belavbûna perwerdehiya akademîk, geşedana tevgerên neteweyî teşekula van civatan leztir kir. Rewşenbîrên modern ên nifşa pêşîn ên civakên rojhilatî- em dikarin bêjin civakên misilman jî- bi gelemperî perwerdehiya xwe li Ewrûpayê dîtin û rasterast veguherînên ramanî yên civakên Rojavayî tecrûbe kirin, hem bi

berhemên xwe hem jî bi wergerên nivîskar û ramangêrên Ewrûpî bûbûn nûnerên ramanên rojavayî. Ji ber vê yekê, da ku em ji rewşenbîrên modern ên Kurd fam bikin, divê em pêşî fîgura rewşenbîrên Ewrûpî fam bikin.

Di jiyana civakî ya îro de milletekî bê rewşenbîr ne mimkun e. Her çiqas cudahiya di navbera milletan de biguhere jî, ji hêla bandor, hêz, hejmar û çawaniyê ve her millet xwediyê cemaeteke rewşenbîran e. Ji ber ku ji kabîleyên biçûk heta civakên modern perwerdehî pêdiviyek e (Shills, 2005: 179). Di civakê de vê pêdîviyê, entelîjansiya(civata rewşenbîr) pêk tîne. Li gor Shills (2005: 199) entelektuel ne tenê bo civakên endustriyel lê ji bo hemû civakan zarûrî ye. Civak çendî kompleks be cemaeta rewşenbîr jî ew çend misogertir dibe. Helbet wesfên rewşenbîriyê li gor civakan tê guhertin. Di civakekê de zêdebûna kesên ku dixwazin bi pîşeyên keda zihnî mijûl bin dike ku wesfên rewşenbîriyê dinimînin jî ewqas zêde bin. Li welatên dinyaya sêyem tenê dîplomayek ji bo nasnameya rewşenbîriyê hin caran têr dike. Lê belê li welatên ku xwediyê bi dehan zanko, saziyên perwerdehî û ramanê ne krîterên rewşenbîriyê jî zêdetir dibin (Aron, 1979: 258). Ji ber vê yekê entelîjansiyayên civakan divê li gor şert û mercên civakî werin nirxandin.

Kurd weke milletekî bênetewe–dewlet -helbet li Îraqê dewleteke federal heye lê belê ev rêveberî van sî salên dawî derketiye holê ango tradîsyoneke domdîrêj a vê rêveberiyê tuneye- ne xwediyê akademiyên kokdar an jî saziyên ramanê ne. Ligel vê hezekê ekonomîk an jî siyasî tune ku van saziyan ava bike. Di vê peywendiyê de zehmet e ku em behsa entelîjansiyeyeke kokdar bikin. Entelîjansiya Kurdî ji ber van wesfên xwe yên taybet nikare bi civatên entelektuel ên din re were berawirdkirin. Lêbelê ligel van hemû kemasiyan em dikarin behsa cemaeteke rewşenbîriya modern bikin ku emrê wê ji sed salî dirêjtir e.

Di vê beşê de fonsiyon û wesfên rewşenbîrî li gor nêrînên cûda dê were nirxandin û bersiva rewşenbîr kî ye? dê were bersivandin. Ligel vê kokên rewşenbîriya(entelîjansiya) modern a Kurdî, zemîna ku rewşenbîriya modern a kurdî afirandiye dê were eşkerekirin û rola rewşenbîr a li ser tevgera civaka Kurd dê were analîz kirin.

1.1.1. Vegira Têgeha Rewşenbîr: Rewşenbîr an Entelektuel?

Di lîteraturê de du têgehên sereke hene ku bo rewşenbîriyê tên bikaranîn: Entelektuel û Rewşenbîr. Her du têgeh her çend du kokên etîmolojîk ên cûda refere bikin jî heman kategoriyê îfade dikin. Jêderka têgeha entelektueliyê di zimanê frensî de "intellectuel" e û koka xwe ji peyva intellect-bi latînî întellectus-digre ku tê wateyên mêjî, îdraq, aqil, qudretê (Çağan, 2005: 11). Dîsa di zimanê frensî de têgeha "éclairé" di wateya ronîbûyî de bo têgeha rewşenbîr tê bikaranîn (Alan, 2019: 118, Hilav, 2008: 11). Peyva Intelligentsia ku tê maneya koma entelektualan, cara ewil, di salên sedsala nozdehan de li Rûsyayê bo wan kesên ku pîşeyeke perwerdehiya zanîngehê wergirtine hat bikaranîn, piştre vegira têgehê berfirehtir bû û bo hemû kesên ku karên zihnî dikin hat bikaranîn (Bottomore, 1997: 66). Di Rûsyaya wê serdemê de mamoste, diktor, nivîskar an jî karmendeke/î burokrasiyê endameke/î vê kategoriyê bû. Lê di wateya îroyîn de intelligensia ne kategoriyeke evqas berfireh e, bi taybetmendiyên xwe ve civateke sînordar îfade dike. Helbet sînorên vê kategoriyê dîsa li gor civak û erdnîgariyê diguhere.

Di zimanê Kurdî de ji entelektuelê bêtir têgeha rewşenbîr/ronakbîr tê bikaranîn, ev yek rasterast tekildarî rewşa cografîk û dîrokî ya Kurdan e. Rewşenbîr weke têgeh rasterast ji Ewrûpa nehat wergirtin. Kurdan weke gelek hîlberînên ramanî yên Ewrûpî têgeha rewşenbîr jî bi rêya dewletên dîtir -weke Osmanî û Îran, bêtir jî Osmanî – nas kir. Cemaeta rewşenbîrî ya Kurdan, di dawiya sedsala nozdemîn û di destpêka sedsala bîstemîn de peyda bûbû bi bandora tevgerên ramanî ya li nav Osmaniyan. Stenbola weke navenda entelektuel a împaratoriyê ji bo rewşenbîriya Osmanî û Kurdî wargehek bû. Stenbola wê serdemê qada têkiliyên rasterast bû bo têkiliyên digel rojavayiyan, beriya wê Kurdan rojava bi rêya mîsyoneran nas kiribûn. Rewşenbîrên Kurd, li Stenbolê, ramangeriya rojavayî bi rêya hilberînên entelektuelî – rojname, kovar, roman- û temsîlkarên cereyanan ji zimanên wan xwendin û nas kirin. Bi struktura xwe ya kozmopolît Stenbol bo pêkhateyên din ên Osmanî – Rûm, Ermenî, Ernawid, Ereb hwd.- jî navendeke entelektueliyê bû, civak xwedan rojnameyên bi zimanên xwe û xwedan dibistan bûn. Entelîjansiya Kurdî ya wê serdemê ku nû zîl dida parçeyeke Entelîjansiya modern a Osmanî bû û girêdayî vê yekê di bin bandora nîqaşên aktuel ya li dewleta Osmaniyan de bû.

Di pêvajoya modernbûna Osmaniyan de mirovên ku li Ewrûpayê perwerdehî dîtibûn weke rewşenbîrên pêşîn derketin holê û nifşên pêşîn ên rewşenbîriya modern a Osmanî ava kirin. Li Osmanî, ev civata perwerdebûyî, ku din bandora ramanên roşengerîxwaz ya Ewrûpayê de bûn weke "munewwer" hatin binavkirin. Împaratoriya ku li ber hilweşînê bû gelek berpirsyarî li rewşenbîran bar dikir. Paşdamayîna ilmî û teknîkî ya ji Ewrûpayê rewşenbîr bêtir derdixistin pêş. Rewşenbîr, weke pêşengekî/ê, bo dewletê çareseriya hemû problemên bingehîn

re rê nîşan dide. Ew, bi perwerdehiya zanistî û teknîkî ya ku li Ewrûpayê dîtiye, civaka xwe pêşde dibe. Weke Belge (2007: 50) jî desnîşan dike ji bo împaratoriyê munewwer ew kes e ku "bi roniya zanîna nû" -zanîna zanistî ya modern –" ronî bûye, ku dewlet hewcedariya wî/wê kesî/ê ye".

Rewşenbîr xwedan teswîreke hevpar e, ji bo rewşenbîrên civakên di bin desthilatdariya Osmaniyan de bûn. Tê dîtin ku têgeha munewwer (rewşenbîr, aydın) hem di zimanê Tirkî, hem di Erebî û hem jî di Kurdî de Roşengeriyê îşaret dike (Alan, 2019: 18). Bêşik ev yek bi mîsyona ku li rewşenbîr hatiye barkirin ve eleqedar e. Civakê peywira ronîkirinê daye rewşenbîr, divê ew civaka xwe ya di tariyê de maye ronî bike. Bo civakê her tişt jê tê hêvîkirin, weke xelaskarê civakê tê dîtin (Belge, 2007: 51). Civak tenya bi pêşengiya rewşenbîr dikare bigihêje asta dewletên Ewrûpî ku ew bi rêya zanîna modern gihîştine wê astê. Her tişt di destê rewşenbîr de ye ji ber ku amûra pêşveçûnê-zanîna modern- di destê wî/wê de ye.

Herçend entelektuel û rewşenbîr heman kategoriyê îşaret bikin jî, hin caran her du têgeh ji hev cihê tên nirxandin. Li gor Gürpınar (2013: 24), rewşenbîr û entelektuel du komên ji hev cûda ne. Kesê entelektuel li *barûya acê,* ji civakê îzole û di pirtûkxaneya xwe de asê ye, temaseke wî/wê bi civakê re tune ye, ji qatên bilind, li raserî civakê bi civakê re diaxive, berevajî vê rewşenbîr kesê ku di nav civakê de ye. Li gor wî entelektuelê ku dixwaze bibe rewşenbîr divê dakeve sikakan û tevlî civakê bibe. Beyî ku tevlî qada civakî bibe entelektuel nikare bibe rewşenbîr. Entelektuel li hember problemên civakî bêaleqe ye. Bo wî/wê zanîn feydeya civakî ji xwe re nake armanc. Di kategorîzasyona Gürpınar de krîtera girîng temasa bi civakê re ye. Entelektuel temsîla *barûya acê,* rewşenbîr jî ya sikakê ye. Ji ber vê yekê peyva entelektuel hin caran ji aliyê dijberên wan ve di wateya biçûkxistinê de tê bikaranîn.

Her çiqas hin caran li dewsa hev û hin caran jî weke du têgehên ji hev cihê were nirxandin jî, entelektuel û rewşenbîr weke du peyvên ji hev cûda li ser hîlberîna zihnî li hev dikin. Qada xebata entelektuel an jî rewşenbîr hilberînên zihnî ye, bi gotineke din ew karkerê/a mêjiyê ye. Perwerdehî bingeha van têgehan diafirîne, bes rewşenbîr/entelektuel di vê çarçoveyê de nayê niqaşkirin.

Di vê xebatê de rewşenbîr û entelektuel de heman kategoriya sosyolojik de ne ango nuansa di navbera her du têgehan de nayê dîtin, lewre her du têgeh jî gelek caran li dewsa hev tê bikaranîn. Lêbelê di vê xebatê de ji ber du sedemên sereke têgeha rewşenbîr hat tercîhkirin. A yekem peyva rewşenbîr li gor entelektuel xwedan bergeheke firehtir e. Ya duyem jî peyva

rewşenbîr weke têgehek atfî paşxaneyek dîrokî û felsefîk dike. Wateya Roşengerî ya li ser rewşenbîr/entelektuel were fikirîn sedema bijartina rewşenbîr zelaltir dê were famkirin.

1.1.2. Zayîna Rewşenbîr

Zanîn di pêvajoya dîrokî de, yek ji amrazên sereke ye, ji bo avakirina desthilatdariya li ser civakê. Wê her tim hêzeke berbirçav daye xwediyê xwe, jê re statuyeke bijarte ava kiriye. Ligel birêxistinbûna saziyên olan, rahîbên ku di derbarê jiyan, xeyb û rizgariyê de xwedî zanîn bûn, delîlên pêşîn ên vê rewşê ne. Ji ber vê yekê ye rahîbên ku xwediyê hêza gotinê bûn di pergala dinyayê de weke zûmreya pêşîn derketin holê (Im Hof, 2004: 29). Rahîb ne tenê xwediyê gotinê bûn, wan di heman demê de rayeya parvekirina zaninê kontrol dikirin. Helbet ev yek bi têkiliya wan a bi îqtîdarê re mimkun dibû. Elîtên leşkerî û siyasî tim di struktura îqtîdaran de pêdivî bi çîna rahîban dîtin, hêza leşkerî desthilatdariya li ser civakê bi rêya qewetê saz dikir lê berdewama vê desthilatdariyê, ango qîma civakê, ji aliyê çîna rahîban ve dihat avakirin. Hêza îqna û rizaya îqtîdarê girêdayî çîna rahîban bû (Gürpınar, 2013: 25). Tesîra çîna rahîban a li ser civak û îktîdara siyasî kontrola wan a li ser zanînê jî xurttir û hêsantir dikir. Di serdemên pêşîn ên dewletan de ligel rahîban komek din a bi navê *lîteratî* -kesên ku dizanin bixwînin û binivsînin- heye ku di pêvajoya hilberîna zanînê de weke çîna rahîban xwedan roleke girîng in, di esasê xwe de rahîp jî parçeyeke vê koma berfireh in. Lîteratî ew kes in ku di rêvebirina dewletê de peywira karmendiyê pêk tînin, koma lîteratî piştî kompleksbûna pergala dewletê weke zarûriyetek derkete holê. Mardîn (1991: 257), karîgeriya endamên vê çînê wiha terîf dike: "*Literatus(*pirjimariya literatî*) ku pîşeya wan zanîn e, di nav civakê de kareke girîng hildane ser milê xwe, ew jî temînkirina nirxên civakî yên bingehîn û veguhestina nirxan a ji bo nifşên din e.*" Armanca vê veguhestinê berdewama domdariya civakî ye. Lîteratî bi rêya zanînê vê yekê pêk tîne.

Lîteratî, ku gelemperî karmendên dewletan bûn, bi xebatên xwe rasterast girêdayî otorîteyekê bûn. Her çend xwedan zanîn bûn jî mecbûr bûn vê zanînê li gor hin qaîdeyan û bo armancên diyar bikar bînin. Mardîn(1991: 258), angaşt dike ku lîteratus tenê bi rêya hîcwê derdikevin derveyî karê xwe yê fermî. Di hîcwê de em nikarin behsa pozîsyoneke rasterast a rexneyî bikin, lêbelê hîcîwek biçûk jî carna bi mirînê biencam dibû. Kesên ku hîcîw dikirin ev rîsk didan ber çavên xwe. Rahîp û karmend weke lîteratî hîlberîna îdeolojiyeke xwecih in. Ew weke elîteke entelektuel parçeyeke struktura îqtîdarên tradîsyonel in. Ji îqtîdara siyasî ne serbixwe ne. Beyî wê ne hilberîn, ne jî hebûna wan mimkun e. Li gor Gürpınar (2013: 25), ew

rewş bi rêya îcada matbaayê guherî, kesên ku debara xwe bi hilberîna zanînê pêk dianîn piştî kifşa matbaayê êdî ji hîmayeya xwedanotorîte xelas bûn û bi rêya kitêban fikrên xwe bi erzanî û hêsanî bi derdoreke fireh re parve kirin û xwe ji wê berbendiya ekonomîk rizgar kirin. Bi vî awayî çapxaneyê rê li ber azadiya ramanî vekir û kir ku profîla rewşenbîrên rexneyî derkevin holê.

Kontrola li ser zanînê ya çîna rahîban ku xwe bi îqtîdarê radigirt heta pêvajoya sekularîzayonê li Ewrûpa berdewam kir. Îro her çend em dîsa behsa zûmreya mirovên olê bikin jî yekdestiya wan a li ser zanînê ev demeke dirêj e hatiye şikestin û raveyên wan ên di derbarê dinya û mirovahiyê de bi qadeke teng hatiye sînorkirin. Geşedanên fîkrî yên ku bi tevgera Ronesans û reformê destpê dikir, pozîsyona lîteratiyê de jî veguherînên mezin pêk anî. Li gor Şerif Mardin (1991: 259) di bingeha veguherîna lîteratiyê de Ronesans hebû. Koma lîteratî bi Ronesansê gav bi gav dev ji parezvaniya nirxan berda û ev nirx dan ber pirsyaran. Lîteratî ku berê tenê di neqilkirina zanînê de cî digirt di vê serdemê û şûnde li hember statukoyê helwestek rexneyî pêşde bir û bîzzat bû parçeyeke hîlberîna zanînê.

Bi daneheva sermiyanê sinifa ku nû hêz digirt-çîna navîn- li aliyekî derdiket sehneya polîtîkayê û li aliyê din bi piştgiriya fînansî rê li ber edebiyat û hunerê jî vedikir. Vê yekê tesîreke erenî li ser hîlberîna entelektuel dikir. Rizgariya pêvajoya hîlberîna zanînê, bû bingeha rewşenbîrî û qadake civakî ya azad ku rewşenbîr dikare ramanên xwe tê de parve bike. Zayîna rewşenbîrên modern vê pêvajoyê dişopîne.

Herçend rewşenbîr weke kategoriyekê aîdê modernîteyê bê zanîn jî hin lêkolîner kokên civata rewşenbîr di zankoyên serdema navîn de dibînin. Dîroknûs Jacques Le Goff di pirtûka xwe ya bi navê "*Ortaçağda Entelektüeller"ê*-Entelektuelên di Serdama Navîn de-(2017) de kokên vê civatê di sazbûna zankoyên pêşîn de dibîne. Li gor wî rewşenbîr, qadeke sînorkirî işaret dike ku ev jî dibistan û dorhêla mamosteyan terîf dike. Û ev dorhêl di serdema navîn- di sedsalên 12 û 13an- de di dibistan û zankoyên bajarên Ewrûpayê de zaye û berbelav bûye. (Le Goff, 2017: 3). Li gor Goff, di zayîna rewşenbîr de tesîreke mezin ên bajarên serdema navîn heye. Rewşenbîr weke encameke xwezayî ya bajarbûnê derdikeve pêşberî me. Li bajarên serdema navîn karbeşî weke zarûretekê derket û li van bajaran entelektuelên pêşîn weke pîşekar derketin holê. Bajarên ku navenda bazirganiyê bûn di heman demê de bazarên danûstandina entelektuelî bûn jî, bi vî awayî bajar cihê hevdîtinên ramanên cûda bûn. (Le Goff, 2017: 9-20).

Le Goff (2017: 32-35) di heman pirtûka xwe de behsa tîpeke din a entelektueliyê dike ku di vê serdemê de di berbelavbûna zanînê de roleke girîng leystine. Ev kom weke *Goliard*

(Goliardique) dihat binavkirin û cara pêşîn li Parîsê derketin meydanê û xwendekarên xizan û seyah terîf dikir. Endamên vê civatê ji sinifên-çîn- cûda yên civakê pêk dihatin. Hin ji wan mirovên bajarî, gundî û hin ji wan jî mirovên bi esl bûn. Goliard ji derfetên ekonomîk bêpar bûn, hin ji wan xulamê hevalên xwe yên dewlenmed bûn hinan ji wan parsekî dikir û bi sedeqeyan zanko dixwendin. Ev koma xwendekarên ku ne xwediyê mekan an jî qezencekî sabît bûn, dersên mamosteyên ku diecibandin, dişopandin. Bo perwerdehiyê bajar bi bajar digeriyan. Tevlî dersên mamosteyên navdar dibûn. Ji ber ku ji aliyê mekan û ekonomiyê ve serbixwe bûn, berevajî xwendekarên din li hember nirxên tradîsyonel û civakî xwedî sekneke rexneyî bûn, hin caran rasterast dijberiya van nirxan dikirin. Goliardan di temayên helbestên xwe de êrîşî nirxên civakê dikirin. Temayên weke qûmar, şerab û eşqê bikar dianîn ku di serdema xwe de di civakê de gelek acizî çêdikirin. Li gor Lee Goff(1997: 33) *Goliard* zemînek afirandin ku rexneyên li hember pergala civakê ya bicih, mimkun dibû. *Goliard*ên ji aliyê civakê weke mirovên tolaz û beredayî dihatin dîtin, ligel peydabûna ramanên rexneyî di veguhestina zanînê de roleke girîng leystin. Ew, li pey mamosteyan û bo perwerdehiyê bajar bajar digeriyan, buhayê pirtûkan zêde bû û veguhestina wan zehmet bû, *Goliard*an di vê pêvajoyê de di veguhestina zanînê de roleke girîng dileystin.

Louis Bodin (2000: 23) jî weke Le Goff, angaşt dike ku entelektuel cara pêşîn bi zankoyan derketin holê. Di heman demê de li gor wî zankoyan di vegotin, kirin û belavkirinê de teşeyeke mayinde dabû aqlê mirov. Zankoyên bajarên Ewrûpî yên serdema navîn hem di sazbûna perwerdehiya akademîk de hem jî di avabûna girseyeke perwerdebûyî de feydeyeke mezin çêkir. Li gor Bottomore(1997: 67) geşedana zankoyan ligel berbelavbûna perwerdehiya humanîst rê li ber sinifeke nû ya rewşenbîran vekir. Ew hem ji doktrînên serdest hem jî ji sinifa serdest a civaka feodal rizgar bû. Li gor wî ev sinifa ku bi rêya zankoyan derkete holê ramangerên Roşengeriyê afirand.

Roşengerî di hilatina Ewrûpa û rewşenbîrê modern de weke qozîberzê herî girîng derdikeve pêşberî me. Roşengerî di sedsala 18emîn de tevger û pêvajoyeke felsefîk e ku ji şerê navxweyî ya Îngilîzan heta Şoreşa Frensî berdewam dike. Vê tevgerê ji Ewrûpayê heta Amerîkayê erdnîgariyeke mezin xistibû bin tesîra xwe. Armanca bingehîn a Roşengeriyê ew bû ku mirovan ji baweriyên kevn – an jî *ancien régime*- xelas bike û bixe pergala aqlî ku ew aqil mirovan azad û baştir dike (Çiğdem: 1993: 11). Şikestinên ramanî yên Ewrûpayê ku bi Tevgera Reform û Ronesansê destpê kiribû û bi rêya matbaayê fikrên cûda li her deverê Ewrûpayê belav bûbû, bi Roşengeriyê gihişt lûtkeyê. Bo Kurdan Têgeha rewşenbîriyê ji aliyê etîmolojîk ve jî di Kurdî de îşaretî Roşengeriyê dike: “Bi raya me ‘ronakbîr’ ji ‘entellectuel’ zêdetir li ser şopa

‘enlightened’a ingilizî, ‘éclairé’ya frensî, ‘munewwer’a erebî û ‘aydın’a tirkî ye. Jixwe her wekî ku ji yek etîmolojiyê welidîbin di kakilê hemûyan de heman mehne(ron/rewşen, light, éclair, nûr, aydinlik) heye û têgehên wek ‘Ronakgerî’, ‘Enlightment’, ‘Tenwîr’, ‘Aydinlanma’ jî ji heman feraseta hevpar çêbûye.” (Alan, 2019: 118).

Kant (2005: 225) di gotara xwe ya navdar a bi navê *“ Roşengerî çi ye?”* de, wateya roşengerî weke, “xwe xilaskirina ji vesayeta xwe” terîf dike û dibêje mottoya roşengerî ev e: Sapara ande! -wêrek be, aqlê xwe bikar bîne-. Rizgarî bi azadiya zihnî mimkun e, mirovên li Ewrûpayê dijîn demeke dirêj ‘fikirîn’ ji saziya Dêrê re hiştine, bo insan, vê peywirê, dêrê bi cih dianî lê êdî wexta werekiyê ye. Roşengerî, ev werekî ye ku mirovan ji wesayeta xwe rizgar bike. Ji aliyekî ve ev pêvajoya kişfa aqil bû jî lewma ye roşengerî weke “serdema aqlî” jî tê binavkirin. Li gor Çiğdem (1993: 13) “roşengeriyê bêşik piştgiriyek da teşedana “civaka modern” hem bi encamên xwe yên siyasî û civakî ya nerasterast hem jî bi sazkirina bingeha dezgeha şoreşa aqlî”.

Ramangêrên Roşengerî di heman demê de mînakên pêşîn ên tîpa rewşenbîrên modern bûn. Kiryarên Roşengeriya Fransayê, *les philosophes,* fealiyetên xwe ji bo civakê dikirin û ronîkirin û perwerdekirina civakê girîng didîtin. Hin caran sekna wan a li hember civakê vediguherî “despotîzma entelekteul” (Çiğdem, 1993: 19). Zygmunt Bauman (2017) di teşegirtina rewşenbîriya modern de rola ramangerên roşangerî, *les philosophes,* di pûxteyek navêndî de bi cî dike. Li gor Bauman(2017: 33) di xwe-honandina rewşenbîrên modern de *bîranîna wan, mîtosa wan, hêmaya îdealîzekirî ya wan*- les philosophes- faktorên sereke ne. Bandor û rola *Les philosophes* di xwe-honandina rewşenbîrên modern de fonksiyona “utopyaya aktîf” bicî anî. Li gor Bauman entelektuelên modern têgeha *Les philosophes* rasterast bikar neanîn, ji ber ku êdî di serdema modern de felsefe weke qadeke sînordar a pisporiyê îfade dikir. Sinifa rewşenbîrên modern, xwedan pîşe û pisporiyên cûda bû, hîlberînên wan tenê bi felsefeyê ne sînordar bû. Paul Johnson (2008: 1) rola rewşenbîrên modern ji zaviyeyek cûda dinirxîne, amaje dike di sedsala 18an de piştî têkçûna desthilatdariya Dêrê û sinifa rihbanan valahiyek derket holê û ev valahî bi tîpeke nû ya mirovên zana hat dagirtin. Johnson, vê tîpê weke entelektuelên sekuler binav dike û angaşt dike ew jî weke alimên dînî amade ne rê nîşanî civakê bidin.

Rewşenbîrên modern ji aliyê hin lêkolîneran ve weke sinifeke nû hatine nirxandin. Alvin W. Gouldner (1993) yek ji wan e. Li gor Gouldner (1993: 7), ku çend epîzotan diyar dike, ku di hilatina vê sinifê de cî digre. Li gor wî pêvajoya zayîna rewşenbîrên modern bi Ronesans û

Tevgera Reformê destpê dike heta serdema modern berdewam dike, epîzotên vê pêvajoyê di wesf û geşedana sinifa nû de tesîr kiriye. Gouldner (1993:7-10) faktorên ku bingeha Sinifa nû-rewşebîrên modern- avakiriye bi kurtasî wiha rêz dike: Pêvajoya sekularîzasyonê, geşedana zimanên neteweyî, hilweşîna struktura patronajê, peydabûna bazereke anonîm ku ne di bin kontrola kesekî de ye, struktura Ewrûpayê ya bi pirneteweyî ku ne xwediyê rêveberiyeke ne-navendî bû, hilweşîna sîstemên malbatên fireh û patriyarkal, piştî şoreşa frensî berbelavbûna perwerdehiya akademîk. Dibistanên ku di perwerdehiya civakî de rol dileystin, bi reforman, ji berbendiya Dêrê xelas bû. Bi belavbûna dibistan û perwerdehiyê veguherînên kokdar ên civakî derketin holê. Bi rêya perwerdehiyê nirxên ji yên malbatî cûdatir derketin holê. Ligel zêdebûna tesîra dewletê ya li ser perwerdehiya ciwanan xwendekar ji nirxên herêmî dûr ketin gihiştin perspektîfeke berfirehtir, bi rêya sîstema dibistanan xwendekar ji zimanekî xwedî kodên sînordar derbasî zimanekî xwedî kodên giran bûn, çanda dîskûra nû ku bi perwerdehiyê derketibû holê derfet dida ku terîfên di derbarê rastiya civakê ya elîtên de bîne cih, ku bi yên din werin berawerdkirin û nîqaşkirin. Bi rêya berbelavbûna perwerdehiyê pozîsyona bijarte ya entelektuelên humanîstîk hilweşiya, epîzota dawî jî veguherîna rêxistina şoreşger e, rêxistina şoreşger ji rêxistineke veşartî veguherî partiya "pêşeng". Gouldner, weke marksîstekî li ser rola rewşenbîr a pêşeng radiweste. Di xerakirina hişmendiya şaş û di avakirina hişmendiya rast ya proleteryayê de partî weke sinifeke nû pêşengiyê dike.

Nîqaşên di derbarê kokên rewşenbîriya modern de berdewam bin jî, têgeha entelektuel – Rewşenbîr- di wateya xwe ya îro de yekem car di pêvajoya Doza Dreyfûsê de derkete ser sehneya dîrokê. Hin kes atfî serokwezîrê Fransayê Clemenceau, hin kes jî atfî aligirên ku li dijî cezakirina Dreyfûs bûn, dike. Lê beriya dawiya sedsala nozdemîn têgeh nedihat bikaranîn (Bauman, 2017: 30). Doza Dreyfûs di sala 1894an de hat lidarxistin. Dreyfûs fermanderekî arteşa Frensî bû, bi ajaniya Almanan tê tawanbarkirin û piştî mehkemeyekê heta dawiya jiyana xwe li "Girava Şeytên" hat sirgunkirin. Di dozê de weke delîl tenê bordroyek dihat nîşankirin. Li gor angaştê bordro ji aliyê Dreyfûs bo ateşeyê leşkerî ya Almanan hatibû şandin. Saleke mehkûmiyetê û şûnde Serbaz Picquard ku bûbû serokê îstîxbarata artêşê amaje kir ku qinyat aniye, sûcdar, ne Dreyfûs e, yeke/î din e. Piştî vê Serbaz ji peywirê hat dûrxistin û li Tûnisê bi karekî din hat peywirdarkirin. 1896an de, li hember dozê, li ser navê birayên Dreyfûs ji aliyê Bernard Lazare bi navê *Une erreur judiciaire: la verite sur l'affaire Dreyfus* [Xeletiyeke Hiqûqî: Rastiya Doza Dreyfûs] rîsaleyek hat weşandin. Serbaz Picquard mesûmiyeta Dreyfûs li Senatoyê îfade kir. Di Mijdara 1897an de dîplometekî girîng ê Frensî Georges Clemenceau ji bo ku doz ji nû ve were lidarxistin gavên pêşîn avêt. Di vê pêvajoyê de Emile Zola li hember

vê yekê bêdeng namîne û derbarê bêsûciya wî de di rojnameyan de gelek nivîsan dinivîsîne û daxwaz dike ku doz ji nû ve were vekirin. Di rojnameya Clemenceauê de, bi navê *J'Accuse* [Sûcdar dikim] gotarekî dinivîse. Gotar tesîreke mezin derdixe holê, hejmara wê rojnameyê di nava çend saetan de sê sed hezar difiroşe (Sennet, 2013: 317; Arendt, 2014: 167-168).

Bi nivîsa meşhûr û hewldanên Emile Zola, tevgereke rewşenbîran peyda bû ku li hember neheqiyê dixwestin raya giştî ava bikin. Piştî vê nivîsê qampanyayên îmze û "daxuyaniyên rewşenbîran" destpê kirin. Di daxuyanî û danezanan de daxwaz dihat kirin ku doz ji nû ve were dîtin. Îmzeyên rewşenbîrên weke Anatole France, Marcel Proust, Brunot, Octave Mirbeau, Paul Alexis jî di nav van daxuyaniyan de bûn. Tevgera ku bi xebatên Emile Zola pêk hatibû ji hêla neteweperwerên Frensî û ji hêla çapemeniyê ve pergî bertekê tund hatin û li hin cîhan ev bertek li dijî aligirên Dreyfûs vediguherîn êrîşan. Di heman demê de ji ber vê nivîsê Lijneya Wezaretê giliya Zola kir. Mehkemekirina Zola 1898an destpê kir. Di pêvajoya dadgehkirina Zola de, girseyên mezin li derveyê dadgehê dirûşmên weke "ji yahûdiyan re mirin", "ji xayînan re mirin" dihatin avêtin û xwepêşandan li dar dixistin. Hin xwepêşandêran êrîşî Yahûdî û rewşenbîrên aligirên wan kirin. Bûyerên bi vî rengî ne tenê li Parîsê li bajarên din ên Frenseyê jî rû dan, hetta li koloniyên weke Cezayîrê jî pêk hatin. Zola di parastinê de îthamên li dijî xwe red dike, amaje dike ku niyeta wî ne biçûkxistina artêşê ye bereksê vê kesên ku rûmeta artêşê binpê dikin ew zordestên ku xwe weke parazvanê arteşê nîşan didin, ew in. Zola li ser bêsûcîbûna Dreyfûs sond dixwe û parastina xwe bi van gotinan bi dawî dike: "rojek Fransa dê spasiya min bike" (Baysan, 2002: 189-190). Axirî, bi qampanya û xebatan Doza Dreyfûs di Pûşpera 1899an de dîsa hat vekirin û biryara pêşîn hat betalkirin. Di gelaweja heman salê de mehkemeyek din hat lidarxistin û Dreyfûs bi deh salan mehkûm bû. Piştre 1900î de Parlementoyê ji Dreyfûs re efû derxist û ji girtîgehê derket. Dreyfûs 1903an de daxwaznameyek nivîsî û xwest ji nû were darizandin. Heta ku Georges Clemenceau nebû serokkomar -1906- ev daxwaz nehat qebûlkirin. Mehkemeya temyîzê biryar da û 1906an de hemû sûcên Dreyfûs hatin daxistin (Arendt, 2014: 168-169).

Tevgera rewşenbîrên ku bi rola Emile Zola ya di doza Dreyfûsê de derketibû holê, di heman demê de zayîna rewşenbiriya modern bû jî. Emile Zola û rewşenbîr û nivîskarên aligirê Dreyfûs bûn weke fîgurên ewil ên rewşenbîrên modern. Hêmaya rewşenbîrên modern di şexsa Emile Zola de teşe girt. Encamên wê herçend neyînî be jî sekna li hember bêhiqûqiyê, li hember otorîte û hêzê parastina heqîqetê weke berpirsyariyên rewşenbîr hatine dîtin. Zola li hember xeletiyên civaka xwe, encamên wê çiqas giran be jî, bêsekin têdikoşiya û ji rastiyên xwe venegeriya. Vê

yekê li ser rêjeya xwendina pirtûkên wî jî bandor kiribû. Di firotina pirtûkên wî de Doza Dreyfûs bûbû mîladek, weke mînak pirtûka wî ya bi navê "Roma"yê di saleke pêşiyê de sed hezar hatibû firotin, lê di 1898an heta mirina xwe di nava çar salan de tenê şeş hezar hat firotin (Baysan, 2002: 193). Doza Dreyfûs nîqaş û hesabdîtinên navxweyî ya Fransayê wirdetir, di avakirina raya giştî de bo nîşankirina rol û bandora rewşenbîr jî gelek girîng bû. Ji Doza Dreyfûs û şûnde rewşenbîrên modern derketin ser sehneya dîrokê.

1.1.3. Rewşenbîr Kî ye?

Rewşenbîrên modern piştî Doza Dreyfûs derketin sehneya dîrokê, nîqaşên derbarê fonksiyon û peywirên wan de, ku îro jî berdewam in, dan destpêkirin. Pirsên wek; rewşenbîr kî ye, pozîsyona wan a civakî çî ye, têkiliyên wan ên bi îqtîdar û serdestan re çawa ye, bûn bingeha xebatên zanistiyên civakî û nîqaşên derbarê entelînjansiyayê. Rewşenbîr kî ye, ji bo kê tê gotin, ev yek ji kêşeyên mezin ê rewşenbîriyê ye. Terîfek an jî penaseyek hevpar nîne bo têgehê. Terîfên rewşenbîriyê, li gor hêmaya rewşenbîrî ya di mejiyê mirovan de ava dibe û li gor kesê ku tîne ziman diguhere. Zygmunt Bauman (2017: 15) vê yekê wiha îfade dike; "pênaseyên entelektuelî hemû, xwe-pênasekirin in. Rastî jî, kesên ku van pênaseyan dikin, endamên wê koma nadîde ne ku dixwazin pênase bikin; lewma her pênaseyeke ku pêşniyar dikin, teşebuseke xêzkirina sînorên nasnameyên xwe ne." Ji ber vê yekê rasterast penaseyeke kategoriya rewşenbîr nake Bauman. Li gor wî nîqaşên wek "kî rewşenbîr e, an jî kî ne rewşenbîr e" ji berhêla siyasî ve girîng e, lê ji aliyê sosyolojîk ve di plana duyem de ye. Nîqaşên li ser pirsa 'rewşenbîr kî ye', ji aliyê hin endamên vê kategoriyê ve hatiye pêşxistin, ûnsûreke retorîk a îqtîdarê ye, ji bo ku xizmeta "girtina qadê" bike. An jî hewldanên hin kesên ji qadên cûda ne, ku retorîka îqtîdarê û analîza sosyolojîk tevlîhev dikin (Bauman, 2017: 27). Dawiya dawî terîf, penaseyên derbarê rewşenbîriyê de sînorek derdixe holê û kesên di nava vê sînorê û yê derveyî vê sînore diafirîne, ku ji vê berhêlê dibe mudaxaleyek îdeolojîk. Her pênaseyek xwedan naverokek polîtîk e û rengvedana perspektîfeke îdeolojîk e. Ji ber vê yekê bersiva pirsa "rewşenbîr kî ye?" di heman demê de bersiva pirsa "divê rewşenbîr çawa be?" ye. Bêşik ev, bi rola rewşenbîr a bi dinyaya modern re alaqedar e. Rewşenbîr îro ew kes e ku hin berpirsyarî lê hatiye barkirin. Di demên krîzên civakî de rewşenbîr bi vê taybetmendiyên xwe bêtir derdikeve pêş. Û li gor şert û mercên demê rol, berpirsyarî, bandora wan vediguhere. Ji ber vê yekê terîf û penaseyên derbarê rewşenbîriyê de rasterast di bin bandora rewşa siyasî, ekonomîk û civakî de ye.

Ji sedsala bîstemîn û vir ve di lîteratura zanistiyên civakî de bi dehan xebat, lêkolîn hene ku nasname, taybetmendî û fonksiyona rewşenbîran radixîne holê. "Îxaneta Rewşenbîran" a Julien Benda weke yek ji berhemên ewil derdikeve pêş. Berhem di navbera du şerê cîhanê de hatiye nivîsîn, neteweperestî û antîsemîtîma ku di wê serdemê de bilind dibû tesîra xwe li ser berhemê nîşan dide. Julien Benda, di vê berhema xwe de di raperîna neteweperestî û nijadperestî de rola entelektulan nîqaş dike.

Benda (2017: 60) di vê berhemê de rewşenbîreke îdeal dîsêwirîne, rewşenbîrê/a Benda zana û aqilmed e, civakê û dewletê berhêlî başiyê dike û di riya başiyê pêşengiya civakê dike. Fîgura ku tê xêzkirin bi her awayî xwediyê wesfên berz û hêja ye. Li gor Benda karîgeriya pêşîn a rewşenbîr kontrolkirina îxtîrasên civakê ye. Rewşenbîr nirxên gerdûnî yên mirovahiyê temsîl dike. Xwe ji hemû îxtîrasên takekesî dûr xistiye. Lêbelê îro rewşenbîrên ku divê bibe xwediyê van taybetmendiyan êdî berpirsyariyên xwe yên civakî nayînin cî û îxanetî fonksiyonên xwe yên sereke dikin û li pey îxtîrasên xwe û civakê diçin.

Benda (2017: 17-21) amaje dike ku sê celebên îxtîrasên siyasî hene ku civak xistiye bin tesîra xwe: îxtîrasên nijadî, sinifî û neteweyî. Ev îxtîrasên siyasî bi xwe re pevçûn û dijberiyan jî ava dike, qelişîna di nav civakê de kurtir dike. Ji ber vê yekê Benda (2017: 29*)* wê serdemê wiha pênase dike: "serdema rêxistinbûnên ramanî yên nefretên polîtîk". Bi rastî jî piştî demek kurt desthilatdariya Nazî û pêkhatina Holokostê vê pênaseya Benda rast derxist. Rewşenbîra/ê Benda, ne li benda armancên pratîk e, ew ji huner, zanist û fikrên metafîzîk zewqê digre, tiştên ku ew daxwaz dike ne madî ne. Bi gotina wî rewşenbîr ew kes e ku bêje welatê min ne ev dinya ye.(Benda, 2017: 37-38). Li gor wî rewşenbîr li hember îxtîrasên mirovan rasterast an ne-rasterast li ber xwe dide. Mirovahî di du hezar salên dawî de "nebaşiyê, xerabiyê" şîn dike, lê bi saya rewşenbîr "başî"yê jî bilind dike. Ji vê berhêlê gelek caran faaliyetên rewşenbîr tevî dijeyatiya civakê pêk tê. Rewşenbîr ji ber ramanên ku diparêze gelek caran bûye armanca girseyên bêperwerde, ev rewş weke krîterek sereke tê qebûlkirin ji aliyê Benda ve, li gor wî, rewşenbîrên ku ji aliyê girseyên bêperwerde ve tê teeqdîrkirin, xayîn in û peywirên xwe yên rewşenbîrî bicî nayînin (Benda, 2017:43). Rewşenbîrên neteweperwer ên Almanyayê mînakên pêşîn ên rewşenbîrên xayîn in, ku li pey îxtîrasên civakî çûn. Wexta rewşenbîrên Alman hilberînên "Almanî" berz dikirin û biqiymet diditîn nirxên din biçûk dixistin, li welatên weke Fransayê rewşenbîrên li nirxên gerdûnî xwedî derdiketin, hebûna xwe didomandin. Lêbelê Almanyayê bi modela "rewşenbîrê neteweperwer" hêz girt, ji ber vê dewletên din jî ev yek bo hebûna xwe zarûrî dîtin (Benda, 2017: 48). Benda neteweperweriya Almanî mehkûm dike, beriya ku desthilatdariya Nazî û dewlet bikeve bin kontrola îdeolojiyek nijadperest û totalîter.

Amaje dike rewşenbîrên ku li hember dewletê divê waezên dadmendî û başiyê bikin, berevajî vê beriya her tiştî waeza bihêzbûnê bo dewletê dikin. Modela dewleta Prûsya meth dikin ku li wê derê millet di nav hiyerarşiyekê de ji bo berzbûn û bilindbûna dewletê dixebite (Benda, 2017: 84).

Benda, fîgureke rewşenbîr xêz dike, ku ew li hember otorîteyê nûnerê heqîqet û edaletê ye. Rewşenbîr xwe bi îktîdar û desthilatdaran xweş nake, endîşeya teqdîra girseyên mezin jî pê re tune. Xema xizmeta jî bo heqîqetê dixwe, hewl dide îxtîrasên civakî, ku her tim hazir e ji kontrolê derkeve, lixav bike. Rewşenbîrên ku li hember dewletê xwedan pozîsyonek rexneyî bin berevajî vê berjewendiyên dewletan li pêş dibînin, dewleta xurt meth dikin. Bi gotina wî rewşenbîrên îro xwe weke "wezîrê parastina neteweyî" dibînin (Benda, 2017: 85). Helbet bo wî jî rewşenbîr bi temamî ne dijberê civak û welatê xwe ye, bereksê wê xwedan sekneke welatperwer e, lê ev sekin welatperweriyeke neteweperest e (Benda, 2017: 126). Rewşenbîr ew kes e ku tevî hemû problemên wê, dîsa bo civaka xwe, bi fedekarî cehd dike.

Rewşenbîr piştî ku îxanetê li peywirên xwe yên eslî dike di heman demê de nasnameya xwe jî winda dike. rewşenbîrên ku îxtîrasên civakê parve dikin ji aliyê dewleta modern ve hatiye guhertin û bûye miroveke ji rêzê. Beriya ku kontrola îxtîrasên civakê bike, didomîne. Û ji îxanetê wirdetir problema mezin ew e ku êdî “rewşenbîr” berev tunebûnê ve diçe, rewşenbîr di dinyaya îro de êdî nikare hebûna xwe bidomîne. Divê pêşî ji vê yekê gazinc were kirin (Benda, 2017: 126). Pênaseya rewşenbîr ya Benda, bi sînorên teqez hatiye çarçovekirin, li derveyî van sînoran êdî behsa rewşenbîr nayê kirin. Perwerdehî, kariyer û hilberînên entelektuel bêwate ye, rewşenbîr dema fonksiyonên aslî bicî neyne. Ji ber vê yekê rewşenbîrê/a Benda, veguheriye nûnertiya civateke nadîr.

Rexneya berfireh a Julien Benda ya bo rewşenbîran, li ser dorhêleke mezin bandor kir, kesên weke Michael Foucoult û Edward Said jî nav de. Tew, Entelektuela "gerdûnî" ya Foucoult, figura rewşenbîr ya Benda pênase dike, îfade dike. Foucoult entelektuel- an jî rewşenbîr- wiha pênase dike; kesê ku zanîn, pisporî û tekîliya xwe bi heqîqetê di qada tekoşîna siyasî de bikar bîne. Ev modela entelektuel ku nûnera nirxên gerdûnî ye, ji şexsiyetek peyda bû ku xwedan hin taybetmendiyan e. Entelektuala gerdûnî ya Foucoult, nirxên herkesî temsîl dike û li hember bêadaletiya otoriteyê dengê xwe bilind dike. Li gor Foucoult di sedsala nozdemîn û destpêka sedsala bîstemîn de entelektuela gerdûnî bibandor bû, ku li hember desthilatdarî, despotîzm, sûîstîmal û kustexiya dewlemendiyê; gerdûniya edaletê û wekhevîtiya jiyaneke îdeal derdixist pêş (Foucoult, 2016: 78-79). Çavkaniya vê fîgura entelektuela “gerdûnî”

hiqûqnas e ku bo edaletê têdikoşe û vê figurê bi awayekî birêkûpêk nivîskar temsîl dike**.** Foucoult jî weke Benda, Emile Zola îşaret dike, wî weke "mîlîtanê wekheviyê" pênase dike, wek mînakekî baş bo "entelektuelê gerdûnî" dibîne. Lêbele bi şerê cîhana duyem û şûnde modela entelektuala gerdûnî dewsa xwe ji modela entelektuela spesifîk re hiştiye. Edward Said (2013: 76) vê spesipîkbûnê, pisporbûnê yek ji tehdîtên mezin dibine. Li gor wî, profesyonalîzm li ser rewşenbîr zextan diafirine.

Li gor Foucoult, entelektuel, berê gerdûnîtiyê îfade dikir lê ew êdî di qadên spesifîk de hînî xebatê bûn. Ji ber vê yekê entelektuel, êdî qadeke, beşeke spesifîk temsîl dike. Li gor Foucoult, ev veqetîn, nemaze jî, bi fîzîkvanên atomî yên serdema Şerê Cîhanê yê Duyemîn re derket holê. Saziyên teknîk-zanistî bi qadên ekonomîk û stratejîk belav bûn û vê yekê entelektuela spesifîk derxist pêş. Çawa ku çavkaniya entelektuela gerdûnî hiqûqnas be ya entelektuela spesifîk jî zana-pispor e. Li gor wî, êdî entelektuel ne ew kes e ku li hember desthilatderên bêedalet denge xwe bilind dike. Berevajî vê, êdî, ligel komek insan – ku di xizmeta dewletê de an jî li hember dewletê ne– xwedî hêzeke wisa ye ku dikare jiyanê ji holê rake (Foucoult, 2016: 76-80).

Rewşenbîrê/a Benda, bi taybetmendiyên xwe şexsiyetek sermirovî ye, bereksê wî, Antonio Gramsci, portreyek realîstir xêz dike. Entelektuela Gramsci, ne fîgureke der-civakî ye, bi wesfên berz nehatiye arastin û weke miroveke rîspî rêberiya civakê nake. Li gor wî her civak li ser têkiliyên hilberîna îktîsadî tebeqeyeke rewşenbîrî an jî zêdetir diafirîne. Nemaze bi kapîtalîzmê re têkiliya hilberîn û rewşenbîriyê xurtir bû. Ew angaşt dike ku karsaziya kapîtalîst bi xwe re tebeqeyeke rewşenbîran ava dike ku, bes ne di qada ekonomîk de, di qadên siyasî û civakî de jî teşe dide bîreweriyên wê. Saziya kapîtalîst teknîkerên sanayiyê, zanayên ekonomî-polîtîk, pisporên beşên cûda derdixe holê û ligel vê rêxistinsazên çandeke nû, hiqûqeke nû jî derdikeve holê (Gramsci, 2016: 246). Gramsci, kategoriya ku bi karzasiya kapîtalîst derketiye holê weke rewşenbîrên organîk binav dike. Rewşenbîrên organîk, encameke xwezayî ya pêvajoya hilberîneriya kapîtalîst in, ji ber vê yekê jî parçeyeke organik a civakê pêk tîne. Gramscî, veqetîna di navbera rewşenbîr û ne-rewşenbîran de bi rêya fonksiyona civakî ya bi kategoriya pîşeya rewşenbîr ava dike. Ango ji hewla entelektuel, an jî ji hewla fizîkî, kîjan zêdetir be, pênase jî li gor wê teşe digre. Li gor wî, herkes weke rewşenbîr dikare were pênasekirin, lê herkes ne xwedî fonksiyoneke rewşenbîriyeke civakî ye.(Gramsci, 2016: 251) Rewşenbîrên beriya kapîtalîzmê weke rewşenbîrên tradîsyonel pênase dike; hunermend, wêjevan, fîlozof endamên vê tîpê ne. Kategoriya Rewşenbîrên organîk ku di qada sinaiyê de peyda bûye gelek firehtir e (Gramsci, 2016: 261). Ji xeynî vê kategorîzasyonê –

tradîsyonel/organîk- Gramscî, çalakiyên entelektuel yên bajar û gundan jî ji hev cihê dike. Çawa ku têkiliyên civakî û ekonomîk ji hev cûda bin, wesf û taybetmendiyên rewşenbîr jî ji hev vediqetin. Li gor wî rewşenbîrên bajêr piştî geşedana endustriyê bi sinaiyê ve hatin girêdan, di planên avakirinê de ne xwediyê înîsiyatîfê ne. Gramsci, rola rewşenbîrên bajêr di avakirinê de dişibîne efserên artêşan, peywira wan pêkanîna kulberînê a li gor plansaziyê bû (Gramsci, 1967: 32-33). Rewşenbîrên organîk ku bi rêya karsaziya kapîtalîst derketibûn holê, di heman demê de rewşenbîrên bajêr îfade dikin. Rewşenbîrên gundan bi gelemperî tradîsyonel in, girêdayî civaka gundan û bûrjûwaya biçûk in, têkiliyên di navbera rêveberiya navendî û herêmî de saz dike. Ev kar hem karekî polîtîk hem jî civakî ye (Gramsci, 1967: 33). Mirovên olî mînakên herî baş ê vê tîpê ne. Lêbelê, veqetîna mezin di navbera rewşenbîrên tradîsyonel û organîk de ye. Li gor Gramsci, ev du tîp di hemû civakan de hene.

Ji bo Edward Said ku di raya giştî de bi têkoşîna xwe ya polîtîk jî tê nasîn rewşenbîr, hebûn û nasnameya xwe bi têkiliya xwe ya civakê re werdigre. Edward Said (2013: 27) rewşenbîr wiha terîf dike: "rewşenbîr ew kes e ku dikare ji bo qamûyekê li ser navê wê qamûyê mesajekê, nêrînekê, helwestekê, felsefeyekê ango qaneatekê berceste, temsîl, îfade bike". Entelektuel- rewşenbîr- ew kes e ku temsîl dike, lêbelê kê/çi? Di girseyên ku problemên civakî û siyasî dijîn de rola rewşenbîr- entelektuel- diyartir dibe. Qeyranên civakî rola nûnertî ya rewşenbîr berceste dike, ligel vê teşe dide sekna wî/wê ya îdeolojîk û pratîkên wê/wî. Edward Said yek ji mînakên vê modela entelektuelê ye. Said tevî ku bi xebatên xwe yên akademîk were naskirin jî, meseleya Fîlîstînê parçeyeke mezin a çalakiyên wî ye. Di hemû platforman de Said weke nûnerê doza fîlîstînê têdikoşe û radigihîne cîhanê. Helbet ev sekin divê li hember civakê were pêşkêşkirin. Çalakiya bi qada takekesî sînorkirî, sekna munzevî weke rewşenbîrî nayê dîtin ji aliye Said. Di vê kêliyê de nivîs derdikeve pêş, nivîsîn amraza sereke ye ku rewşenbîr digihîne civakê, nûneriya civakî û ramanên li ser navê civakê tên pêşkêşkirin bi riya nivîsê berceste dibe.

Rewşenbîr ew kes e ku berpirsyariya temsîliyetê/temsîlkirinê hildaye ser milê xwe, weke peywirekê. Encamên vê berpirsyariyê herçend giran bin jî, sekna rewşenbîr bêtawîz e. Saîd (2013: 28) girîngî dide, îredeya parastina heqîqetê **"**Dema ez Jean Paul Sartre an jî Bertrand Russel dixwînim tiştê ku li ser min tesîr dike, beriya tezên wan, deng û hebûna wan a celebîn û takekesî ye; lewre tiştê ku jê bawer dikin tînin ziman. Bi karmendekê/î an jî bi burokrateke/î biîhtiyat têkilhevkirina wan ne mimkun e". Entelektuel beyî ku ji gazinc û cezakirinê bitirse, helwesta xwe radixe ber çavan, dawiya dawî dengê xwe yê resen dibine.

Berbirsyariya rewşenbîr nikare tenê bi demekê an jî bi cîhekî ve bê sînorkirin. Daîmî ye. Nûnertiya civakê di demên xirab de girîngtir dibe. Di demên wisa de hêviyên civakê bilinttir dibin ji rewşenbîr. Endamên civakê ji rewşenbîr dixwaze şahidiya êşên civakê bike û li ser navê civakê biaxive û wê temsîl bike (Said, 2013: 51). Daxwaz û kêşeyên civakê divê ji aliye rewşenbîr bên ziman. Rewşenbîr bi çalakiyên xwe, di demên tarî de, dibin dengê civakên xwe, mînaka berçav Edward Said bi xwe ye. Ew di sehneya navneteweyî de pirsgirêka civaka Fîlîstînê di hemû qadan de tîne ziman, di fotoya xwe ya kult de, ku kevir diavêje ber bi îsraîle ve, sekna xwe ya polîtîk û îdeolojîk dide der. Ango temsîliyeta civakê bi temamî xwedan peywendiyek polîtîk e. Rewşenbîr, li gor Saîd, divê hafizaya civakê zexm bike, ligel temsîlkirina êşên civakê divê ew qrîzên civaka xwe globalîze bike, janên civakê di peywendiya mirovahiyê de bicih bike û wê tecrubeyê bi janên civakên din têkildar bike (Said, 2013: 51). Têkiliya rewşenbîr û civakê têkiliyeke beramberî hev e. Civak bi riya rewşenbîran problemên xwe didin der, rewşenbîr jî bi civakê nasname û hebûna xwe dibine. "Erê, bi tena serê xwe diaxive entelektuel, lêbele tenê wexta ku xwe bi rastiya tevgerekî, bi hêviyên civakekê, bi kesên ku li pey îdealeke hevpar dibezin girê bide, dengê wê/wî olan dide" (Said, 2013: 89).

Jean-Paul Sartre jî weke Said di wê baweriyê de ye ku mirov tenya bi perweredehiya akademîk an jî daneheva entelektuel nikare bibe xwediyê vê nasnameyê. Ya girîng sekna mirov ya li hember rûdanên civakî ye**.** Zanyarên ku li ser parçekirina atomê dixebitin, nikarin weke rewşenbîr bên pênasekirin, ew tenya zanyar in, pisporê karekî ne. Lêbelê kengê wan dît ku xebatên wan bo civak û mirovahiyê encamên neyînî derdixe holê û li hember van encamên neyînî ya van xebatan gihîştin hev û manîfestoyek îmze kirin wê hingê dibin rewşenbîr (Sartre, 2019: 18). Wekî Fransizekî helwesta wî ya li hember Şerê Cezayîrê nîşana vê seknê ye. Sartre, weke rewşenbîrekî, hem bi nasnameya xwe ya deshilatdar re rûbirû dibû hem jî li hember kolonyalîstan piştgirî dida gelê Cezayirê, heta şiddet a li hember kolonyalîstan diparast. Li gor wî, bandora şîddetê tenya bi şîddetê ji holê radibû (Sartre, 2014: 30). Sartre, neteweya xwe jî li derveyî rexneyên xwe nedigirt, weke Zola. Sartre, li pey îxtîrasên nijadî nediçû ku Julien Benda ev yek weke îxanetetê hember li rewşenbîriyê didît.

Sartre, di penasekirina rewşenbîran de, balê dikşîne ser têkiliya zanyar û zanînê. Li gor wî, her çend zanîn gerdûnî û xwedî hîmeke zexm û azad be jî zanistiya bi kontrola komekê vediguhêze îdeolojiyekê (Sartre, 2019: 32). Girêdayî vê tekiliyê du tîpên rewşenbîr derdikevin holê, tîpa yekem teknîsyenê zanînê ye. Ew, îdeolojiya desthillatdar dipejirîne an jî pê re li hev dike. Bi vî awayî bi niyeteke xerab, gerdûnîtî dixe xizmeta xûsusiyetê û apolîtîze dibe. Hin caran îqtîdar bi rêya zorê wan ji helwesta pirsyarker dûr dixe. Li vê derê em nikarin behsa sekna

rewşenbîr bikin, lêbelê kengê bi îdeolojiya xwe li hev nekir, û pirs kirin, kengê peywirdariya asta nizm a hegemonyayê red bike wê hingê dibe rewşenbîr (Sartre, 2019: 35-36). Bi gotineke din, rewşenbîr ew kes e ku dijberiya di hundirê xwe de û dijberiya di civakê de bi lêkolîna rastiya pratîk (bi hemû normên ku hewce dike) bi îdeolojiya desthilatdar (bi sîstema nirxên tradîsyonel) hisiya ye (Sartre, 2019: 37).

Li gor Sartre, rewşenbîr, hilberîneriya dîrokê ye, ji ber vê yekê civakek beyî ku xwe sûcdar bike nikare ji rewşenbîrên xwe gilî bike. Ji ber ku tu çi bi tûr bikî tû dê wê derînî.(Sartre, 2019: 37) Rewşenbîr weke neynika civakê ye, ji rabirdûya wê, ji strukturên çand û exlaqî yê civakê sûd werdigre. Ligel vê yekê, li gor wî, her çend hîlberîna civakê bi xwe be jî rêyek tenê li pêşberî wê/î ye bo famkirina civakê; ew jî nirxandina civakê ya ji bergeha bindestan e (Sartre, 2019: 53). Ev perspektif kurteyeke sekna rewşenbîrî ya Sartre e ku heta dawiya jiyana xwe domandiye.

Sartre, weke rewşenbîrek, li ser têgeha rewşenbîr gelek sekinî ye. Sekna wî ya rewşenbîrî dişibe Emile Zola ku ew di zayîna diyerdaya rewşenbîr de xwedî pozîsyoneke girîng e. Sartre li welatê xwe û li dinyayê, weke ramangerekî, xwedî cihekî bijarte be jî, li qada entelektueliyê, li hember desthilatdaran tim şerê rastiya xwe daye. Ew gelek caran li hember siyaseta Fransayê radibû. Sartre, balê dikşîne îdeolojiya ku em tê de dizên. Li gor wî rewşenbîr di nav îdelojiyekê de dizê û her tim divê şiyar be, bo xwe biparêze divê du tiştan pêk bîne a yekem divê tim xwerexneya xwe bike, a duyem divê bi awayekî şênber û beyî şert û merc beşdarî çalakiyên çînên bindest bibe (Sartre, 2019: 59-60). Sarte, mîsyoneke dîrokî jî dike ser milê rewşenbîr "Civakek piştî travmayeke mezin (têkçûna di şer de, dagirkirina dijminê serketî) wexta ku îdeolojî û sîstema xwe ya nirxan winda kir, gelek caran heta beyî lixwevarqile, karê tasfiye û ji nû ve sazkirinê hewaleyî rewşenbîr dike" (Sartre, 2019: 66).

Zimannas Noam Chomsky (2017: 8) ku di raya giştî ya Amerîkayê de bi ramanên xwe yên muxalif tê naskirin, entelektuel wiha terîf dike: "kesên ku hewl didin derbarê tiştan de bifikirin, tiştan fam bikin, tiştan analîz bikin û van tegihîştinên xwe bi awayekî eşkere ifade bikin û ji kesên din re rave bikin". Li gel vê yekê entelektuel xwediyê hin berpirsyariyên exlaqî ne jî, entelektuel divê hewl bide heqîqetê fam bike, derbarê dinyayê de bigihêje tegihîştinekê û van bi kesên din re parve bike û ji bo kesê din têbigihîjin zemînek biafîrîne. (Chomsky, 2017: 9) Berpirsyariyên exlaqî gelek caran derbaskirina sînorên entelektuel e û entelektuel dema van berpisyariyên xwe yên exlaqî bicîh tîne dibe ku pergî astengiyan were ku hin caran encamên vê gelek giran in.

Rewşenbîr weke kategoriyek bi fonksiyon û berpirisyariyên xwe yên civakî tên pênasekirin. Têkiliyên bi civakê re, rola civakî hêmana herî girîng ya nasnameya rewşenbîr e, lêbelê pozisyon û rola rewşenbîr li gor girêdayî pêvajoya dîrokî, civakî diguhere. Bauman, li ser veguherîna "rola entelektuel" radiweste û di pêvajoyên modernîte û post modernîteyê de du stratejiyên ji hev cûda terîf dike. Li gor wî, xebata entelektuel, di modernetîteyê de herî baş bi metafora "zagon daner"(legistator), di post-modernîteyê de bi metafora "şîroveger"(interpreter) dikare were îfadekirin. Li gor rola zagon daner entelektuel cûdahiyên ramanî lihev tîne, nêrîna rast dibijêre. Ev raye bi raya zanîna "objektîf" tê bidestxistin. Entelektuel di modernîteyê de xwediyê rola pesendkeriya nêrîna rastiyê bixwe ye. Li gor rola şîroveger, entelektuel, derbirîna îfade û nêrînên di nava tradîsyonekê de ne ku mexsûsê civakekê ye, ji bo were famkirin tercumeyî tradîsyoneke cûda dike. Bi vê yekê aramanc ew e ku hêsankirina ragihandinê ya di navbera endamên xweser de çêbe. Dixwaze rê li ber berevajîkirina wateyê bigre (Bauman, 2017: 11-12). Li gor Bauman, têgeha entelektuel weke bangekê bû bo ji nû ve vejandina angaştên bihûrî yên pêknehatî. Entelektuelên modern wexta ku xwe dihonandin ji *les philosophes* (felsefevan)ê fransayê sûd wergirtin. Ew rola pêşeng a sedsala 18an ya *les philosophes* di sedsala 19emîn de jî domandin. Li gor Bauman "bîranîna wan, mîtosa wan, hêmaya îdealîzekirî ya wan"- les philosophes- di xwe-honandina entelektuelên modern de faktoreke sereke ye. Entelektuelên modern rasterast têgeha les philosophes tercîh nekirin, ji ber ku wê serdemê felsefe êdî ne çalakiyek şamil, weke qadeke pisporî ya sînorkirî dihate îfadekirin (Bauman, 2017: 32-33).

Bi postmodernîteyê re dawiya lêgerîna rastiya tekane, ango heqîqeta nîhaî hat. Li gor Bauman, pêşî vê veguherînê bi hunerê destpê kiriye. Krîterên xwecih yê hunerî û sînorên objektîf yên hunerê ji holê rabûn. Êdî normên ku ji bo hunerê baş û nebaş ji hev veqetiyane, nikarîn meşrûiyeta xwe ava bikin. Ji ber ku êdî zemîneke estetîk ya ji xwe bawer tune bû. Şûnde vê yekê xwe di zanistiyên civakî de jî nîşan da. Bauman (2017: 143) angaşt dike ku erozyona zemîna objektîf a hunerê û piştî Wittgenstein û Gadamer populerbûna hermeneutik dişibin hev. Populerbûna hermeneutik ji aliyekî ve bilindbûna rola şîroveger bi xwe ye. Êdî zanîn, ne ew tişt bû ku bi tena serê xwe ji objeyeke serbixwe xwediyê hebûnekê be. yekser kiryar teşe dide zanînê. Li gel postmodernîteyê fîgûra entelektuelî ku heqîqet di destê xwe de digirt, xwediyê rastiya tekane bû, hilweşiya. Êdî ew derbarê dinyayê de tenê xwediyê yek şîroveyê bû.

Rewşenbîr bes ne li ser pêvajoyên siyasî û civakî li ser hilberîn û naveroka zanînê jî bandorê dike. Rewşa civakê di xebat û çalakiyên entelîjansiyayê de der dibe. Li gor Aslan

(2007: 1) hebûna bingehîn ya zaninê civak e. Ew, entelîjansiyayê weke cemaeta epîstemîk binav dike û angaşt dike ku bingeha hebûnî ya zanînê- zanîna zanistî jî tê de- ev cemaet e. Li gor wî, eger cemaeta epîstemîk tunebe zanîn jî dê tune be. Cemaet şerta zarûrî ya zanînê ye. Ji ber ku ew hem çavkanî û afirîner, hem jî avakar û veguhêzera bo nifşên din e (Arslan, 2007: 75). Li gor Arslan (2007: 72) cemaeta epîstemîk bi du awayan çêdibe. Bi avayekî sînordar weke pisporên ku zanînê înşa dikin, dişixulînin û vediguhêzin. Bi avayekî berfirehtir mirovên ku baweriya xwe bi fealiyetên pisporên cemaeta epîstemîk tînin û nirxeke mezin didin van xebatan û nûveyên van xebatan bikartînin. Zanîn û zanîna zanistî divê weke hilberînên pêkhênerên xwe were nirxandin. Tenê di yek civakekê de tekane cemaeta epîstemîk tune. Li gor şer û mercên civakî jimara cemaetên epîstemîk zêdetir dibin. Bo nimûne li Tirkiyê du cemaetên epîstemîk ên sereke tên xuyan. Arslan angaşt dike ku li Tirkiyeyê ji sedsala nozdemîn wir ve buhraneke epîstemîk heye. Sedema sereke ya vê buhranê hatina zanista modern e. Bi tevgerên modernîzasyona Osmanî û perwerdehiya zanista modern li Osmanî li gel Cemaeta epîstemîk a klasîk, cemaeteke din peyda bû.

Rewşa sinifî, di nîqaşên derbarê nasnameya rewşenbîr de xwedan ciheke girîng e. Rewşenbîr ji aliyê îktîsadî nêzî kîjan sinifê ye an jî divê pozîsyona wê çawa be. Alvin W. Gouldner (1993) rewşenbîran ji sinifên îktîsadî yên dîtir weke sinifeke nû binav dike. Di salên 60î de di tevgerên çepgir û rêxistina proleteryayê de, rola rewşenbîr mezin bû. Rewşenbîrê çepgir di şerê çînî ya di navbera proleterya û bûrjûwayê de pêşengiya proleteryayê dikir. Li gor teorîsyonên çepgir bîreweriya proleteryayê bi rêya îdeolojiya desthilatdaran dihat biyanîkirin û şewişandin, vê yekê rê nedida proleterya bigihêje heqîqetê (Keskin, 2016: 15). Di vê kêliyê de rewşenbîrê çepgir vê îdeolojiyê deşîfre dike û dibe astengê vê xelet-hişmediyê. Rewşenbîrê çepgir, ji aliyekî ve terîfa rewşenbîr a Sartre e, ku jiyanê ji bergeha bindestan dinirxîne. Sosyolog Karl Mannheim (2002: 178-179) ku di heman demê de pêşengê xebatên sosyolojiya zanînê ye, amaje dike entelîjansiya ne xwedî bingehek sinifî ye. Ev tebeqe di navbera sinifan de bi awayekî civakî bi serbestî tevdigere. Entelîjansiya bi sosyolojiyeke ku tenê sinifê ji xwe re dike bingeh nayê famkirin, ji ber ku ev perspektîf dê entelîjansiyayê weke sinifeke homojen bibîne an jî dê wê bi sinifekê angaje bike. Dîsa jî peywendiyek sosyolojîk di navbera vê koma heterejon de heye ew jî perwerdehî ye. Perwerdehî cûdahiyên zikmakî yên sinifî pêl bi pêl ji holê radike û girêdanek têkildarê vê perwerdehiyê çêdike. Ev bêsinifiya entelîjansiyayê teşe dide jiyana modern jî. Berê manewiyat ji aliyê tebeqeyekê ve ku helwestên wê girêdayî pozîsyona wê ya civakî bû, dihat temsîlkirin, lêbelê êdî ev temsîliyet ji aliyê entelîjansiyaya *bi serbestî tevdigere* ve pêk tê. Ev tebeqe her nû dibe, ji zemîneke civakî ku bi domdarî berfireh dibe. Ev yek taybetmendiya jiyana modern e (Mannheim: 2002: 179-180). Helbet endamên vê

tebeqeya ku bi serbestî di nava sinifên civakî de, dikare xwe nêzî sinifekê bike. Li gor Mannheim (2002: 181-182) pozîsyona entelektuelê/a ku bi serbestî tevdigere bi du awayî dikarê ji rê derkeve. Rêya yekem; angajeyêbûyîna sinifekê ye. Bi vî awayî rewşenbîr tevlî nav refê sinifekî dibe, ango dibe aliyekî pêvçûna navsinifî. Di rêya duyem de rewşenbîr; an di lêgerîna mîsyoneke takekesî de ye, an jî weke parêzerek bijartî parastina berjewendiyên hemû aliyan dike. Hem teorîsyenên mihafezekar û hem jî teorîsyenên proleteryayê endamên vê tebeqeyê ne.

Fonksiyona rewşenbîr li welatên der-Ewrûpî her tê nîqaşkirin, bi taybetî li welatên dereng modernbûyî. Bi îfadeya Kautsky, rewşenbîrên welatên pêşveneçûyî "beriya modernî bigihêje welatê wan afîrînerên modernbûnê" ne (Oran, 1995: 387). Ev rewş di rewşenbîriya pêşîn a Kurdî de jî derdikeve pêşberî me. Rewşenbîriya Kurdî beriya veguherînên civakî derketiye holê. Nifşê pêşîn ji makewelatê dûr li dîasporayê –Stenbol- zîl da. Tevgerên veguherînê ku dewleta Osmanî xistibû bin tesîra xwe, dorhêlek bo vê nifşa pêşîn jî avakiribû. Lêbelê Kurd di heman serdemê de di nav gelek problemên civakî de bûn.

Li gor Kautsky, li welatên pêşveneçûyî rewşenbîr dema perwerdehiya xwe kuta dike û tê welatê xwe sê vebijark li pêşberî wî/wê ne. A yekem, rewşenbîr adapteyî civaka tradiyonel dibe. A duyem, civaka xwe adapteyî xwe dike. A sêyem, ji kur hatibe vedigere wê derê. (Oran, 1995: 387). Puxteya balkêş ev e ku rewşenbîrên pêşîn ê Kurdî, bi giştî weke entelîjansiyekeke dîasporayê ma. Helbet ev yek sedî sed ne tercîha wan bû. Gelemperê wan di burokrasiya dewletê de cî digirtin û ji aliyê reveberiya dewletê ve ji Kurdistanê hatin dûrxistin. Bi rêya amûrên çapemeniyê – rojname, kovar- dixwestin welatên xwe ronî bikin. Rewşenbîrên Kurd ji ber vê yekê pir dereng rasterast tevlî civakê bûn. Lêbelê ji ber xebatên xwe yên nav civakê, gelemperî wan, ji welatên xwe dîsa veqetiyan û sirgûn bûn. Sirgun taybetmendiyeke qerekterîstîk a rewşenbîrên pêşîn e. Ji ber vê yekê vebijarkeke din divê li nêrînên Kautsky were lêzedekirin. Ji ber xebat û ramanên xwe yên polîtîk û pêşvebirina civakê ji makewelatê xwe dûr ketin. Û weke ku Saîd (2013: 65) jî destnîşan dike carek mirov sirgun bibe nikare jiyana xwe weke berê berdewam bike, nikare bibe hemwelatiyê/a wê derê. Ango sedemên sirgunê di jiyana mirovan de dê her mêjiyê wan mijûl bike. Ji ber vê yekê rewşembîrên Kurd ên nefîbûyî, dîaspora kiribûn qada berxwedanê ya nasnameya Kurdî.

Rewşenbîr weke hîlberîna dîrokê rasterast di bin tesîra civaka xwe de ye. Ol, çand û saziyên civakî hêmanên sereke ne ku teşe didin nasnameya rewşenbîr. Ji ber vê yekê fonksiyonên wan di her civakê de dibe ku cihê be. Daryush Shayegan (2002: 135) angaşt dike

rewşenbîrên cihana îslamî di nava çelexwarîtiyê de ne. Sînorên rewşenbîr, zanyar û rêveberan bi xetên teqez nehatine destnîşankirin. Entelektuel, ku statuya wan a epîstemolojîk rexne ye û komeke cûda diafîrînin di nav civakên îslamî de nayên xuyan, entelektuelên tên ecibandin jî muxalîfên îqtîdarê ne û çalakiyên wan siyasî ne. Lêbelê ji rewşenbîr wirdetir îdeolog in. Daryush Shayegan, rewşenbîrên Îranê di peywendiya nakokiya modern û tradîsyonê de dinirxîne. Shayegan (2002: 143) ji mînaka Îranê behsa entelektuelên vasat dike. Li gor wî sedema vasatbûna wan klostrofobiya çandî ye. Ligel daxwaziyên xwe yên civakî û çandî bi giştî ew sitewrin û nikarin tişteke resen biafirînin. Ji aliyekî ve asta xwe ji girseyên civakê bilindtir dibînin, paşdamayîna civakî û teessûbba wan rexne dikin û bi awayekî xinîz xeranebûna civakê meth dikin. Aliyê din xwe li hember Rojava di asteke jêr de kêm dibînin, heyranê hilberînên rojavayî ne. Avantajên ku li aliyekî qezenc dikin li aliyê din winda dikin. Bi destxistina gerdûnîbûnê û naskirina ji hêla dinyaya medenî ve, azweriya wan a veşartî ye. Rewşenbîr di navbera du aliyan de asê maye; çanda ku di pêşiya wî de ye û dinyaya ku nikarin bibin endamê wê. Ne aîdê her du aliyan e jî. Li gel vê klostrofobiya çandî di heman demê de di navbera du aliyên civakî de jî asê dibin: Teknokrat û ûlema. Her du alî jî entelektuelan ber xwe ve dikişkişînin, lêbelê ew weke teknokratekî ne xwediyê zanîneke teqez e ne jî weke ûlema xwediyê zanîna skolostîk e. Û entelektuel bi rêya rexneyê ji xwe re qadeke xweser jî neafirandiye (Shayegan, 2002: 143-144).

Di pênaseyên kurdan de rewşenbîr tim xwedan mîsyonên civakî ye, Kurd rewşenbîran weke rêberên pêşdebirina civakî, ronayîkerên civaka di tarîtiyê de mayî, dibînin. Pênaseyên rewşenbîrên kurd sekna civakparêz derdixîne pêş. Bo nimûne li gor Tarık Ziya Ekinci(2006: 93) bo rewşenbîriyê pêdivî bi perwerdehiyeke bilind an jî dîplomayê nîne, Lêbelê rewşenbîr teqez divê roşengerîxwaz be. Rewşenbîrî bo wî rewşeke zîhnî, sekneke ramanî îfade dike. Li gor Ekinci (2006: 93) ya girîng hewldana mirov e ango mirov çiqas ji bo pêşdeçûn û başiya civakê hewl bide bi raman, zihîn û zanînên xwe ji bo vê yekê bixebite, wê hingê dikare weke rewşenbîr were binavkirin. Bi heman awayî Remezan Alan (2019: 118) jî di pênaseya rewşenbîr de balê dikşîne ser çalakiyên rewşenbîr:

> "Lê nayê wê mehneyê her kesê ku perwerdeyek dîtiye an bîra wî bi me'rîfetekê ronî bûye, dibe ronakbîr! Di çalakiya ronakbîriyê de derdekî kolektîf heye û esas ev derd e ku berpirsyarî û girîngiyek bexşî vê peyvê dike. Çi ye ev derd? Ronakbîr bi 'bîra xwe ya ronîbûyî', dixwaze derdora xwe, civaka xwe jî ronî bike. Ev yek jî wesfeke 'hişyarker' bexşî wan dike. Eve di vê rêya 'hişyarker' de ronakbîr rastî hin zehmetî, cefa, tenêtî, astengî û cezayan tê. Tam di vê mehneyê de, di serê sedsala bîstan de, di serdema 'hişyariya miletan' de, li Stenbolê, birrek

kesên xwenda derketin û xwestin ku li ber ‘serdemeka pêşketî’ (asr-i muterakkî) kurdan hişyar bikin.”

Li ser pozîsyona wê/wî nîqaş herçend îro berdewam bin jî, tiştê zelal ew e ku, rewşenbîr aktorekî/e girîng yê/ya qada civakî ye. Şertên civakî helbet li ser rewşenbîran jî xwedî bandor e. Ji ber vê yekê dema behs kurd bin û rewşenbîrên kurd bin, divê şertên taybet ên Kurdan neyên jibîrkirin. Îro Kurd, weke neteweyeke li dewletên cûda, bi statukoyên cûda jiyana xwe birêve dibin. Ev rewşa belavbûyî, entelîjansiyayên cihêreng derxistine holê ku rojev, program û sekna wan ji hev cihê ye. Helbet li tu deverê bi raman û sekna xwe entelîjansiyayên homojên tunene. Lêbelê li gel rewşenbîrên Kurd ciyawazî ne tenê di qada ramanî de ye. Di dîskûrê de, bo hemû Kurdan, biaxive jî program, pêşniyar an jî nîqaşên rewşenbîrên Kurd gelemperî bo terîtoriyeke siyasî sînorkirî ye. Bo rewşenbîriya modern ev pêvajoya ciyewaziyê bi şerê dinyayê yê pêşîn dest pê kir. Bo rewşenbîrên serdema pêşîn em dikarin behsa hevpariyeke giştî bikin. Bi taybetî weşanên serdema Osmanî delîlê vê yekê ne.

Dema mesele bi perspektîfa civakî were nirxandin hin zehmetî hene li pêşberî me, ji hinga ku derketiye holê, nasnameya rewşenbîr her di nav veguherînê de ye. Îro li dinyaya nûjen rewşenbîr, bi gelemperî kirdeyekî/e bi zankoyan re têkildar e. Rewşenbîrên navneteweyî gelemperî di akademiyên bijartî yên dinyayê de wekî kadroyên akademîk dixebitin. Rewşenbîrên serbixwe qismeke biçûk ên vê kategoriyê ava dikin. Lêbelê ligel Kurdan gelek caran rewşenbîr û aktîvîstên siyasî tên têkilhevkirin. Civak tim ji rewşenbîr aktîvîzmeke civakî hêvî dike. Ji ber vê yekê çalakiyên entelektuel ên ku di bin banê saziyên fermî de tên kirin, weke rewşenbîriyê nayên dîtin. Di vê peywendiyê de ji aliyê civakî ve zelalkirina têgeha rewşenbîrî yek ji zehmetiyên girîng e.

Di analîza rewşenbîriya Kurdî de zehmetiyeke din jî di warê nasandinê de derdikeve holê. Kî weke rewşenbîrên Kurd dikarin werin nasandin? Di pergela modern a dinyayê de, di nîzama netewe-dewletê de, Kurd ne xwdiyê ciheke serbixwe ne. Ji ber vê yekê tenê kokên etnîk bo nasnameya rewşenbîriya Kurdî têr nake. Ew çax rewşenbîrên Kurd kî ne? Di vê lêkolînê de rewşenbîrên Kurd ew kes in ku nasnameya Kurdî di jiyana xwe ya entelektuel de weke meseleyek bicîh kirine. Ango nasnameya neteweyî ya Kurdî weke şexsî hatiye tesdîqkirin ji aliyê wan kesan ve. Ji ber vê yekê cihêwaziyek di navbera rewşenbîrên Kurdî û rewşenbîrên ku kurd in divê were danîn. Mijara vê xebatê rewşenbîrên Kurdî ye.

1.2. Nasname

Nasname weke têgeh cudahî û hevpariya di nava mirovan de îşaret dike. Ji aliyekî ve firq û cudahiya me ya ji mirovên dîtir derdixe holê ji aliyekî ve hevpariya me ya komatî destnîşan dike. Bi her du aliyê xwe jî ew di navbera me û yên din de sînoran tesbît dike û bi awayekî domdar sînorên nû diafirîne. Têgeha nasnameyê îngilîzî de ji "identity" ji peyva "idem" ya latînî tê ku wateya wê heman/wekhev e û di sedsala 16emîn de derkete holê (Gleason, 2014: 23). Nasname, di pênase û binavkirina mirovan de yek ji puxteyên sereke yên referansê ye. Mirov li dinyayek bi nasnameyan dorpêçkirî de jiyana xwe didomîne hin ji wan rasterast bi mirov re hin ji wan jî bi têkiliya hin mirovên din re – ku ev nasname weke nasnameyên kolektîf jî tê terîfkirin- peywendîdar e. Dîn, çand, zayend, sinif, erdnîgarî, nijad, malbat, kar ango şexsî û kolektîf hemû kategorîzasyonên li dinyayê ku hin mirovan dihundirîne û hin ji wan veder dike di çarçoveya nasname û xwe-nasandina mirovan de xwedan rol in.

Nasname jî weke gelek têgehên din ên civakî û siyasî weke hîlberîna veguherînên Ewrûpî derkete holê. Daxwaza xwe-naskirina mirov tim weke problematîkekê hêbû, feylesofên serdema antîk jî bi vê meseleyê eleqedar bûn, lê belê bi roşengeriyê re zayîna kiryar-mirov ev yek veguherî rojeveke entelektuel. Veguherînên civakî û siyasî yên Ewrûpa ku bi tevgera reformên dînî dest pê kiribû, di zayîna takekes-şexs de rolek mezin leyist û nîqaşên entelektuel yên derbarê takekesiyê rê li ber mefhûmên weke kiryar û nasnameyê vekir ku nîqaş û lekolînên zanistî hîn li ser berdewam in. Nemaze derbarê nasnameyên kolektîf eleqeyeke mezin heye ku girêdayî atmosfera polîtîk ê Ewrûpayê derketiye holê. Piştî şoreşa 1789an a Frensî, bi zayîna tevgerên neteweyî eleqeya mirovan a li hember nasnameyên neteweyî zêdetir bû. Ligel modernîteyê nîqaşên derbarê nasnameyê li zanistên civakî xurttir û geştir bûn.

Hewldanên xwe-naskirina mirovan û pênasekirina cîhana derve nikare bi dîrokê re bê sînordarkirin. Pênasekirin bi qasî ziman kirûyeke kevn e. Mirov dinyayê bi şemayên kognîgtîf[1] watedar dikin. Şema struktukreke kognîgtîf e ku zanîna derbarê têgeh an jî hişyarkerekê (stimulus) temsîl dike. Em bi van şemayan bi zanînên xwe yê sînordar kesek, bûyerek an jî cihek watedar dikin. Mirov ji bo zanîna şematîk bi kar bîne di destpêkê serî li kategoriyan didin. Ango em kesan, bûyeran an jî cihan watedar bikin kategorîze dikin (Hogg û Vaughan, 2011: 72-74). Kategorîzekirin, weke mekanîzmeyek kognîgtîf xezkirina sînoran e di navbera tiştan

[1] Derbarê cûre û wesfên şemayên kognîgtîf de bo agahiyên berfirehtir Bnr: Hogg, M. A. & Vaughan, G. M. (2011).
Sosyal Psikoloji (Çapa Duyem). (İbrahim Yıldız & Aydın Gelmez, Wer.) Ankara: Ütopya, 63-101.

de, cihêkirina ku bo pênasekirinê pêwîst e bi rêya kategorîzayonê mimkun dibe. Ango sinifandin, cihêkirin û çêkirina sînoran di naskirin û binavkirina tiştan de şerta bingehîn e.

Nasname, bi wateya xwe ya herî berfireh ew îfade an têgeh in ku tiştan terîf dikin. Bi gotineke din stîgmayên nasînê ne. Ligel modernîzm û bi hêzgirtina nasnameyên kolektîf nasname, veguherî yek ji çavkaniyên sereke yê qeyranên civakî û siyasî. Veguherînên civakî yên du sed salên dawî kir ku nasname di lîteratura zanistên civakî de bibe mijareke populer. Kesîtî, takekes, mirov piştî zayîna psîkolojiya modern[2] bûn mijarên girîng ên lêkolînên zanistî. Nemaze psîkanalîst Erîkson ramanên Freud ên derbarê ezahiya mirov de bi pêş xist û populerîteya xebatên nasnameyê leztir kir. Têgeha "qrîza nasnameyê" îcad kir û di berbelavbûna xebatên derbarê nasnameyê de bû fîgureke girîng (Mollaer, 2019: 25; Gleason, 2014: 27). Lêkolînên derbarê nasnameyê, îro li di qadên cuda yên zanistên civakî de xwedan lîteraturek mezin e ku roj bi roj berfirehtir dibe.

Nasnameya takekesî ango *ezahî* ramaneke nû ye. Mirov berê li gor malbat, pozîsyona civakî, cihê jidayikbûnê dihat nirxandin lê ev yek bi serdema 16emîn şûn ve hate guhertin. Ji bilî taybetmendiyên ku ji derveyî mirov tên dîtin, nasnameyek qomplekstir ê takekesî heta wê demê nedihat tesewwirkirin. Di bingeha vê pêvajoyê de çar faktorên sereke hene ku ezahiya modern derxist holê: *Sekulerîzasyon, Endustrîalîzasyon, Roşengerî* û *Psîkanalîz*. Bi sekulerîzasyonê mirov êdî bes bo dinyaya din-axîret- hewl nedidan, bo veguherîna rewşên xwe yên ku tê de dijîn jî hewl didan. Bo pêşderîna şert û mercên demê bêtir li ber xwe didan. Li aliyê din bi endustrîalîzasyonê êdî mirov veguherîn unîteyên hilberînê, ji bo xebatê bi her derê ve tevdigeriyan. Weke amrazeke hilberînê dikaribûn bi hêsanî cihên xwe biguherînîn weke berê mirov êdî tenya bi malbatê ve ne girêdayî bûn, bi tena sere xwe jî dikaribûn jiyanên xwe bidomînin. Bi roşengeriyê re êdî mirov wisa bawerkirin ku bo xwe dikarin jiyanek, nasnameyek baştir ava bikin, ji bo vê jî li hember strûktûrên zordest têkoşînên mezin dan. Têkoşîna otorîteya dêr û monarkên zordest di vê çarçoveyê de dikarin werin nirxandin. Di dawiyê de bi kifşa psîkanalîz, Freud destnîşan kir ku ezahî bi rastî û temamî nikare were famkirin, ji ber ku aliyekî wê yê derhişîn heye (Hogg û Vaughan, 2011: 138-139).

Psîkanalîz di fehmkirina mirovan de veguherîneke mezin pêk anî, serkeftina mezin a Freud bi rêya analîzê, kifşkirina der-hiş bû. Ravekirina mekanîzmaya xebitîna ruhî de kifşa der-

[2] Destpêka psîkolojiya modern dîroka 1875an tê qebûlkirin. Wilhem Wundt wê salê li bajarê Leipzig laboratuvara psîkolojiyê avakir û rê li ber serbixwebûn û sazîbûna zanista psîkolojî vekir. Bo agahiyên berfirehtir Bnr: Schultz
D.P. û Schultz S. E. (2007) *Modern Psikoloji Tarihi (*Çapa Yekem). (Yasemin Aslay, Wer.) İstanbul: Kaknüs

hiş şoreşek pêk anî û şêweya ravekirina xebitîna ruhî guherand. Kifşkirina der-hiş tenê ne di psîkolojiyê de bi giştî di fehma takekesî de bandoreke mezin pêk anî. Heta wê demê mirov, zindiyekî/e bi temamî hişmend dihate qebûlkirin. Li gor vê mirov biryarên xwe bi hişmendiya xwe digire, li gor vê tevdigere dihat qebûlkirin lê belê bi psîkanalîzê ev yek guherî ku di bingeha helwest û tevgerên me de bandora naveroka derhişîn hat îspatkirin. Mirov bi tenya qada hişî nikaribû were famkirin.

Nêrînên Freud ên derbarê mirov de gelekî hatiye rexnekirin, ji ber ku ew di pêvajoya geşedanê de balê dikişîne ser meqanîzmayên nevxweyî. Bandora faktorên civakî û çandî nayên dîtin. Nêrînên derbarê mirov dîsa ji aliyê psîkanalîsteke din, Erikson li peywendiyeke cuda rûnişt. Erikson teorîsyoneke psîkanalîtîk be jî berevajî Freud di geşedana mirov de bal kişandiye ser bandora dorhêla çandî û civakî. Li gor Erikson nasname eyniyeteke di hundirê mirov de ye ku tim berdewam e û dîsa berdewamî bi hin kesên din re parvekirina qerektereke bingehîn e. Ev nasname ji nasnameyên girêdayî statûyên civakî û pîşeyî cudatir e (Volkan, 2015: 92). Di teoriya kesayetî ya Erikson de jiyana mirovan ji zayîn heta mirinê qonaxên cuda hene û di her qonaxê de mijareke girîng heye. Eger mirov meseleya qonaxekê bi awayekî serkeftî çareser bike, bo meseleya qonaxa din amade dibe û bi tenduristtir dibe. Li gor wî "nasname" meseleya serdema adolesanî ye. Mirov bi pêvajoya lêkolîn û fikirînê bo xwe nasnameyek bijêre ku Erikson bo vê pêvajoyê dibêje *morotoryum* ew yek dibe *identity achievement* ango bidestxistina nasnameyê. Lê her kes nikare vê pêk bîne, hin mirov heta dawiya emre xwe jî nikarin qerara kîbûna xwe bidin dikevin qrîzê, bo vê rewşê Erikson dibêje *identity diffusion* ango belavbûna nasnameyê (Hortaçsu, 2007: 18-19). Li gor Erikson hemû mirov di jiyana xwe de dixwazin meseleya nasnameyê çareser bikin. Nasname weke meseleyek li ser seranserê jiyana mirovan bandorê dike. Li gor Volkan (2015: 92) dema nasnameya civakî an jî pîşeyî dikeve bin xetereyê mirov endîşe bike jî ev endîşe ne di asteke bilind de ye. Lê belê mirov ji windabûna nasnameya "binetar" gelek ditirse. Windabûna vê nasnameyê bo wê/wî weke mirina psîkolojîk e.

Nasname berî her tiştî meseleyeke hişmendiyê ye. Îdraqa mirov ya derbarê "xwe" de dema derdikeve qada hiş dibe nasname (Assman, 2015: 139). Di vê peywendiyê de nasname beriya her tiştî "hiş" refere dike. Ji ber vê yekê nasname di heman demê de tercîhên hişmendî ne. Ev yek bo nasnameyên ku em weke parçeyekî xwe yê jêneger dibînin jî wisa ye. Bijartin û honandina nasnameyê mudaxeleyek şexsî ye.

Nasname bo jiyana takekesî xwedan wateya jiyanî be jî, ne jêneger in. Geşedana takekesî wate û girîngiya nasnameya mirovan jî vediguherîne. Mirov bi demê re têdigihêje ku aîdiyet û

nasname ne qederên mirovan in. Heta dawiya jiyanê weke xwe namîne dikare bê guhertin dikare were terikîn (Bauman, 2019: 20). Û her çend hiş refere bike jî tercîhên me yên nasnameyê bi temamî ne encamên bijartinên me yên hişyar in. Li gor Bauman (2019: 22) nasname li hewayê digerin hin ji wan ji aliyê me ve tên bijartin hin ji wan ji derdorê dipengizin. Nemaze nasnameyên kolektîf tenya bi tercîhên me yên hişyar nikarin werin ravekirin. Dorhêla civakî û çandî xwedan tesîreke diyarker in.

Du sed salên dawî, dîrok şahidê berzbûna nasnameyên kolektîf bû. Di pêvajoya geşedana nasnameya kolektîf de rewşenbîran roleke diyarker leyst. Girêdayî veguherîna atmosfera siyasî li ser dîrok, folklor, ziman û çandên neteweyan baldariyek entelektuel peyda bû. Bi vî awayî xebatên antropolojîk, sosyolojîk û dîrokî nasnameyên kolektîf kir qada çalakiyên zanistî û akademîk. Nasname bû yek ji mijarên sereke yên zanistên civakî. Bi sedsala 19emîn û vir ve lêkolînên derbarê çand, ziman û dîroka neteweyan bi awayekî leztir dom kir. Ev yek li aliyekî hêz dida geşedana tevgerên neteweyî aliyekî jî lîteraturek berfireh derbarê neteweyan de diafirand. Pêvajoya netewebûna civakan di heman demê de pêvajoya veguherîneke siyasî û civakî îfade dikir. Li gor Bilgin (1995:4) meseleya nasnameyê bi aliyên xwe yên çandî û siyasî were nirxandin bi hin têgehên ku berî Şoreşa Frensî û piştî Şoreşa Frensî têkildar e, di nava van de têgehên endustrîalîzasyon, kolonîzayon, neteweperwerî û kozmopolîtîzm cihekî girîng digirin. Lewra ku Şoreşa Frensî li Ewrûpa kir ku netewe bibe tekane çavkaniya meşrûiyeta rêveberiyê. Ev yek rê li ber hilweşîna împaratoriyên pircivakî, berbelavbûna tevgerên neteweyî kir, li çar aliyên cîhanê tevgerên neteweyî derketin holê ku heta niha jî ev yek berdewam e. Tevgerên neteweyî-nasnameyî, hewldanên netewebûnê çar aliyên dinyayê dike ku meseleya nasnameyê bibe yek ji girîngtirîn rojeva siyaseta navneteweyî.

1.2.1. Cûreyên Nasnameyê

Di jiyana rojane de weke mirov em xwediyê gelek nasnameyan in; weke nasnameya zayendî, etnîk, neteweyî, îdeolojîk û hwd. Hemû nasnameyên me di bin banê du cûreyên nasnameyan de dikarin werin sinifandin: Nasnameya takekesî û nasnameya kolektîf. Nasnameya takekesî sekna mirovên wisa îfade dike ku li hember dinyayê, bawerî û girêdanên

mirovên ku cihê wan li vê dinyayê diyar dike. Nasnameya kolektîf ew têkilî ne ku mirov xwe pê dide nasandin û xwe parçeyekî wê ya jêneger dibîne (Parekh, 2014: 53).

Di navbera du aliyê nasnameyê de, yê takekesî û yê hevpar- an jî kolektîf- têkiliyek taybet heye. Assman (2015: 140) vê têkiliyê bi du tezên xwe rave dike. Li gor vê a-) "Ez" ji derveyî mirov ber bi hundirû ve çêdibe. Ango nasnameya-em'a komê di pêşiya nasnameya-ez'ê tê, nasname kirûyeke civakî ango sosyo-genetîk e. b-) Nasnameya hevpar-kolektîf- an jî "em" bêyî mirovên ku em'ê pêk tînin tune ye. Ew tenê hilberîn û bîreweriya takekesî ye. Bi gotineke din nasname şablonên wisa ne ku ji aliyê koman ve li serê îtifaq hatiye kirin.

Lê belê cihêkirina nasnameyên takekesî û kolektîf di navbera lêkolîneran de hîn tê nîqaşkirin, li gor hin lêkolîneran mirov bi têkiliyên mirovên din re dikare bibe "xwe" û ji ber vê yekê nasnameya kolektîf û takekesî nikare were jihevcihêkirin. Li aliyên din hin lêkolîner angaşt dikin ku eger ciyawaziyek teqez di navbera nasnameyên takekesî û kolektîf de nikare were danîn, li gor wan ev sekneke redûksiyonîst e û dê analîza nasnameyê zehmettir bike. (Varol, 2016: 149)

Cûreyên nasnameyê bi temamî ji hev nikarin bên cihêkirin ji ber ku di navbera nasnameyên mirovan têkiliyek hevbandor heye. Li gor Larrain (1997: 212) mirov dema nasnameyên xwe yê takekesî ava dikin ji nasnameyên kolektîf yên weke dîn, sinif, zayend, etnîsîte sûdê werdigirin, peywendî û taybetmendiyên komî bi kar tînin. Ev taybetmendî bo têgîna nasnameya mirov-kirdeyê dibe alîkar. Nasnameya takekesî bêyî nasnameyên kolektîf nikare were famkirin. Û bi temamî nasnameyên cihê yên mirov xwe pê pênase dikin bi sînorên tund werin cudakirin.

Li hember vê sînorkirina teqez, hin lêkolîneran îtîraz dikir û angaşt dikir ku cûreyên nasnameyê nikarin ji hev werin veqetîn. Cûreyên nasnameyê di peywendiyeke cuda de nirxandin. Vignoles û hevalên wî (veguhêzer Varol, 2016: 149-150) bo vê yekê cihê têgeha cûreyên nasnameyê têgeha teqalên nasnameyê pêşniyaz kirin. Li gor vê teoriyê nasname di sê teqalan de dikare were terîfkirin. a-) Nasnameya takekesî yan şexsî; mirov xwe çawa terîf bike, bi kîjan aliyên xwe xwe terîf bike wan aliyan îfade dike. Nasnameya şexsî balê dikêşe ser faîliya mirovan di kifşkirin û teşedana nasnameyê de. b-) Nasnameya girêdayî têkiliyan; rola kesan bi yên din re îfade dike. Bo nimûne kesên weke zarok, dê, pismam, bav, hevalê kar, mişterî, şef dihundirîne. c-) Nasnameya kolektîf; endamtiya etnîsîte, dîn û zayenda civakî an jî malbat, koma karê îfade dike.

Di encamê de derbarê teqezbûna sînorên wan de nîqaş berdewam bike jî dikare bê gotin, du cûre nasnameyên mirov hene ku ya yekem tenya bi şexsê wî/wê rê têkildar e. A duyem jî bi hin mirovên din re tên parvekirin ku weke nasnameyên kolektîf jî dikarin werin binavkirin, nasnameyên olî, etnîk, neteweyî, zayendî, nijadî û hwd. ew nasname ne ku mirov bi yên din re parve dikin.

1.2.2. Nasnameya Kolektîf

Nasnameyên kolektîf -yên dînî, etnîk, neteweyî, nijadî, zayendî û hwd.- ango nasnameyên ku mirov bi hin kesên din re parve dikin, ligel ku hevpariya me ya bi mirovên din re saz bike jî di heman demê de tesdîqa cudahiya me ya komek dîtir e jî ji ber wê yekê Bilgin (1995: 59) dema nasnameya kolektîf penase dike balê dikşine ser daxwaza cudabûnê. Li gor wî bi nasnameya kolektîf komek mirovê ku qadeke hevpar parve dikin, cudahiyên xwe ji komên din destnîşan dikin. Nasnameya kolektif ne rewşeke diyar, lê pêvajoyekê îfade dike. Nasnameyên kolektîf ne stîgmayên neguher in, nasnameya civateke bi têkilî û demê re diguhere, têkiliyên bi civatên din di vê veguherînê de rol dileyize. Çawa ku nasnameya takekesî di konteksta têkiliyên nav-mirovî de mimkun be peydabûna nasnameya kolektif jî di konteksta têkiliyên nav-civatî de mimkun e (Bilgin, 1995: 59).

Kom ango grûba ku nasnameya kolektîf werdigire, her tim hewce ye *yên din* biafirîne. Bo hebûna hesta koma navxweyî hewce ye koma derveyî hebe. Ev dijberiya têgehî û tevgerî dike ku he du kom hevdu temam dikin. Ew wateya xwe ji vê dijberiyê digirin (Bauman, 2015: 51). Nasnameyên kolektîf tim bi têkilî û dijberiyên komên din hatine avakirin (Bilgin, 2007: 35). Avakirina dijberan gava pêşîn a avakirina nasnameya kolektîf e. Li gor Eriksen (2004: 35) yekem çalakiya etnîsîteyê di navbera yên hundir û yên derve, em û ewê de cihêkarî ye. Hebûna komê bi endamên derveyî komê watedar dibe.

Taybetmendiyên nasnameya kolektîf ji aliyê Bilgin (1995: 61) ve wiha hatiye rêzkirin:

a) Nasnameya kolektîf ji aliyê endamên komên subjektîf tên îdraqkirin û jiyîn.
b) Nasnameya kolektîf weke bi yên din re dijberî, kontrast û cudahiyek ji yên din tê terîfkirin.
c) Ji hişmendiya aîdiyeta komê çêdibe.

d) Di pergala temsîlên cihêreng de tê tegihiştin. Di nava van temsîlan de hin wesfên pozîtîf hene hin wesfên negatîf hene. Wesfên pozîtîf gelek caran hîmek defansîf saz dike ku ew jî helwestên etnosantrîst hildiberîne.
e) Ev helwest û hêl di dîskûrsek û pergaleke ramanî ya hevgirtî yan jî îdeolojiyê de tên îfadekirin.

Motîvasyona ku nasnameyên kolektîf diafirîne bi taybetî di lêkolînên sosyal psîkolojiyê de gelekî hatiye nîqaşkirin. Teoriya nasnameya civakî (social identiy theory) teoriya navdartirîn ên derbarê nasnameya kolektîf e. Teoriya nasnameya civakî ji aliyê Henri Tajfel û John Turner di salên 70î de hatiye eşkerekirin. Teorî ji wê rojê ve bi gelek xebat û weşanên akademîk hatiye berfirehkirin. Li gor teoriyê mirov xwe li gor koma xwe ya civakî bi nav dike û disiniffîne. Komên din bo pozisyona koma civakî ya me dibe bingehek. Pozîsyona koma ku em endamê wî ne bi rêya berawirdkirina civakî diyar dibe. Meyla mirovan heye ku bo komên xwe îltimasê bikin, sedema vê yekê daxwaza bidestxistina nasnameyeke pozîtîf e. Mirov dema dibin endamê komekî, meyl dikin ku aliyên baş ên koma xwe û aliyên nebaş ê koma din bibinîn (veguhêzer Dirilen Gümüş, 2016: 90-91).

Psîkanalîst Vamık Volkan ku bi xebatên xwe yên derbarê pevçûnên navkomî tê nasîn, nasnameya kolektîf bi modeleke psîkanalîtîk rave dike. Ew bo têgihiştina komên mezin metafora kon bi kar tîne. Ev yek weke modela konê etnîk jî tê zanîn li, gor vê modelê, em ferz bikin ku hemû endamên komeke mezin di bin heman konî de dijîn. Qumaşê vî konî nasnameya komê destnîşan dike. Ligel vê ziman, ala, unsûrên folklorîk -cil û berg, xwarin - sê sembolên din jî hene. Sembola yekem ji aliyê koma mezin a "adin" hatiye çêkirin. Du heb konên ligel hev bifikirin kesên koma yekem herî, pîsî û çopê davêje. Bi gotineke din hêmayên "xerab" ên derbarê xwe de derdikin, fikr, hest, helwest û hêviyên xwe bi rêya konê duyem eşkere dikin. Ev tevger li hember nasnameya mezin a komî û li hember konî ye û ne mecbûr e bi kesên nava konî re têkildar be. Sembola duyem ji aliyên serokên "karîzmatik" weke Vlademir Lenin, Mahatma Gandhi û Mao Zedung tên çêkirin. Serokên bi vî rengî bi hezaran jî bi milyonan mirov ji vederkirinê xelas dike û beralî beşdariyeke siyasî ya nû dike. Bi gotineke din di bin îkonên wê komê. Cureya sêyem a sembolan hin bûyerên rastîn ên ji bûyerên mîtolojîk in û şehîd û lehengên ku parçeyên van bûyeran in. Buyerên dîrokî yên bi vî rengî, dibe ku bibe dilşadker an jî travmatîk, gelemperî her du ne jî. Bo nimûne Kawayê Hesinkar bo neteweya kurd semboleke bi vî rengî ye. "Serkeftinên bijartî" û "travmayên bijartî" sembolên sêyem yên konê civakî ne. Nasnameya komên mezin li derdora van ava dibe. Holokost bo cihûyan komkujiya Helebçe bo

kurdan travmayên bijartî ne. Serkeftinên bijartî bi awayekî tradîsyonel ji nû ve bîrbirina bûyerên kêfxweşî û şanaziyê dide komê. Serkeftinên şerekî mezin, serxwebûna neteweyî serkeftinên bi vî rengî ne (Volkan, 2015: 97-98).

Dawiya dawî nasnameyên kolektîf ji pêdiviyek civakî û takekesî dizên û bo hemû mirovan xwedan girîngiyek jiyanî ne. Helbet nasnameyên kolektîf ne hemanên jêneger in bi demê re û bi îradeya mirovan dikarin were guherîn weke Bauman (2019: 20) jî destnîşan dike mirov bi demê re têdigihêje ku aîdiyet û nasname ne qedera mirovan e. Heta dawiya jiyanê weke xwe namîne, dikare bê guhertîn, dikare were terikîn. Di jiyana rojane de em xwedan nasnameyên cihêreng ên kolektîf in lê belê dikare bê gotin di nava van de îro yê herî bandorê li jiyana me dike di warê siyasî û civakî de herî zêde derdikeve pêşberî me nasnameya neteweyî ye.

1.2.3. Nasnameya Neteweyî û Neteweperwerî

Nasnameya neteweyî her çend di dîskûra neteweperweran de xwedan kokên qedîm be jî di esasê xwe de fenomeneke serdema modern e. Beriya serdema modern netewe/millet ji bo wan kesên ku heman çandê parvedikirin an jî hembajariyên hev in dihat bikaranîn (Calhoun, 2012: 13). Lêbelê nemaze piştî şoreşa Fresî ku gel weke çavkaniya desthiladariyê derkete holê wateya netewe bi xwe jî guherî. Netewe weke têgehek bi dewleta modern re têklidar, huviyetek siyasî wergirt. Ji ber vê yekê dema mesele dibe têgeha netewe nîqaş derbasî qadeke polîtîk, îdeolojîk dibe.

Fîlozofê Frensî Ernst Renan (2019: 50) neteweyê wiha terîf dike: netewe hîssiyatek e, prensîbeke rûhanî ye û du tişt vê hîssiyatê ava dike; a yekem xwendabûna mîrata bîranînên hevpar e ya din jî biryargirtina hevpar, daxwaza jiyana bihevre, îradeya bihevrebûnê ye. Travma û serkeftinên neteweyê têkiliyên di navbera endamên komê xurttir dike. Bîranînên neteweyî, şîn (travmayên kolektîf) ji serkeftinan biqîmettir in, ji ber ku ew peywir didin mirovan şîn ji civakê hewldanên civakî hêvî dike (Renan, 2019: 50). Renan di bingeha neteweyê de balê dikşîne ser hafizaya kolektîf û îradeya ligelhevbûnê Bilgin (1995: 7) van her du hemanan çavkaniya –hafızaya kolektîf û îrade- bingeha cureya neteweya dibine. Ew neteweyan li gor teşeya avabûna wan dike du beş. Li gor wî du tîp netewe hene; a yekem neteweyên girêdayî kontratê ne û ya ya duyem neteweyên xwe spartî riha kolektîf. Tîpa yekem bi îradeya mirovan tê avakirin endamên neteweyê li derdora kontratek hatine gel hev – bo dewletan makezagona avaker vê fonksiyonê bicihtînin. Di tîpa duyem de hemanên çandî û dîrokî derdikevin pêş, ev netewe weke hilberîna dîrok, bîranîn û tradîsyonê dikare were terîfkirin.

Wate û terîfa mefhuma neteweyê bo sosyoloji, têkiliyên navneteweyî û zanista siyasetê cûdahiyan bihewîne jî ravekirina wê ancax bi têkiliya wê ya neteweperweriyê mimkun dibe (Gellner, 2018: 137). Têkiliya di navbera her du têgehan têkiliyek sîmbiyotîk e beyî hev nikarin werin nirxandin. Lêkolînerên ku çavkaniya netewe û neteweperwerî vedikolin, derbarê naveroka neteweyê de agahî didin me. Nîqaşên derbarê neteweyan di bingeha xwe de di derbarê ramanên kokên neteweyan teşe digre. Pirsa pêşîn ev e: Netewe strukturên qedîm in, xwezayî ne an strukturên honandî yên serdema modern in? Teoriyên cihêreng li derdora bersiva vê pirsê hatiye hatine eşkerekirin ku weke teoriyên neteweperweriyê tê zanîn.

Özkırımlı teoriyên derbarê neteweperweriyê li gor perspektîfa pirsa kokên neteweyê di sê kategoriyan de disinifîne: Teoriyên premordîalîst, teoriyên modernîst û teoriyên etnosembolîst. Neteweperwerên pêşîn- premordîalîst- neteweyê weke formeke xwezayî didîtin, îddîa dikirin ku netewe ji serdemên kevin ve hebûn, perspektîfa herî ekstrem ji aliyê naturalîstên wan ve dihat ziman ku ew netewe weke zayendî didîtin li gor wan ziman, netewe, ol ji berê ve hebûn û ew neguher in. Hemû netewe xwedî keseyatiyên cûda ne, ew nasname bi rêya xwîn vediguhêze nifşên din. Teoriyên modernîst berevajî vê netewe û neteweperwerî berhemên serdema modern dibînin, li gor wan teoriyan, netewperwerî netewe ava dike, ango netewe ne formeke amadeye li xwezayê. Teoriyên etnosembolîst weke rêya sêyem jî tê qebûlkirin, ew îddîayên premordîalîstan red dikirin û li gor wan teoriyên modernîst qels in ji bo ravekirina neteweyê, ew jî wek modernîstan neteweperwerî berhema serdema modern qebûl dikin lê neteweyê bi paşxaneya wan a etnîsîte ve girê didin, li gor wan çand, mît, edet û sembolên etnîsîteyê bandor li ser neteweperweriya îro jî dike û netewe di bin siya paşeroja etnîsîteyê de ye (Özkırımlı, 1999: 75-196). Lê teorîsyenîn modernîst etnosembolîstan weke premordîalîstan, essentialist dibînin û sûcdar dikin.

Teoriyên neteweperwerên premordîaslîst herçend li ser dîskûra neteweperweran bandorê kiribe îro li zanistiyên civakî fikrên wan ên derbarê xwezayîbûna neteweyê, balê nakşîne. Nemaze piştî şerê cîhanê ya duyemîn û têkçûna nijadperestiyê, bandora sekna ku neteweyan weke mirovan kategorîze dikir û disinifand têkçû. Di lîteratura zanistiyên civakî de lihevkirinek giştî heye ku neteweyê weke hilberîna serdema modern qebûl dike. Lêbelê nasnameya neteweyî çiqas honandî ye, çiqas xwe dispêre paşxaneyek qedîm pirsa nû ye ku li benda bersivê ye. Teorîsyenên modernîst ên weke Benedict Anderson, Ernest Gellner, Eric J. Hobsbawm netewe fenomenek bi temamî honandî qebûldikin lêbelê Anthony D. Smith di wê baweriyê de bo avakirina neteweyê bi hebûna kokên wan ên etnîk mimkun dibe.

Li gor dîroknûs Elie Kedourie (2017: 22) neteweperwerî doktrîneke ku di destpêka sedsala nozdemîn hatiye îcadkirin. Li gor vê doktrînê mirovahî di tebîetê de ji neteweyan pêk tê, her yekê van neteweyan jî bi taybetmendî û wesfên xwe tên zanîn tekane teşeya rêveberiya meşrû xwe-birêvebirina neteweyan e. Ew neteweperî weke îdeolojîk penase dike lê li gor Calhoun (2012: 16) neteweperwerî bes ne doktrîneke jê zêdetir awayeke fikirîn, axivîn û tevgerînek e. Netewe û netewepererî du sed salên dawî de di pergala civakî de veguherînên mayînde pêk anîn. Di serdema modern de bandora herî girîng ya ku li ser kirde/kiryar kiriye têgeha nasnameya neteweyî ye (Larrain, 1995: 197). Neteweperwerî herçend kirûyek hilberîna modernîteyê be jî di demek kurt de li seranserê dinyayê tesîreke mezin kir. Li gor Calhoun (2012: 17) di pêşketin û serkeftina neteweperweriyê yek ji hêmana herî girîng ew e ku nasnameya neteweyî û dîskûra neteweyî bo mirovan kirûyeke xwezayî hatiye dîtin weke ku netewe tim û tim hebin.

Teorîsyenên modernîst yên neteweperwerî yê neteweyê hilberîna neteweperweriyê bi xwe dibînin Li gor wan neteweperwerî şerta pêşîn a neteweyê (Gellner, 201: 138; Hobsbawm, 2017: 25; Eriksen, 2004: 160). Propaganda û ajîtasyonên neteweperwer dike ku civaka heman herêm û çandê parvedikin xwe weke neteweyek bibînin û penase bikin li vê dere du hemanên girîng hene: Bawerî û îrade. Weke ku Eriksen (2004: 160) jî destnîşan dike neteweyek, bi biryara komek mirov çêdibe û gelek caran weke fenomenek elît yê bajarî destpêdike û netewe di asta nasnameyê de meseleya baweriyê ye. Li gor Gellner(2018: 78) netewe bi du avayî dikare were pênasekirin. Du mirov tenê dema heman çandê parvebikin dibin endamê heman neteweyê, du mirov tene dema xwe endamê heman neteweyî qebûl bikin dibin endamê heman neteweyê. Netewe hilberîna bawerî sadakat û hevgirtina mirovan e. Dîsa li gor Gellner (2018: 71) neteweperwerî weke prensîbeke siyasî lihevkirina unîteya(yeke) siyasî û neteweyî diparêze. Ango neteweperwerên wê civakê dixwazin li erdnîgariya wan desthilatdarî di destê neteweyê wan de be.

Gelo mirov xwe çawa û çima endamê neteweyekê dibîne? Bersiva veê pirse Gellner wiha dide. Bo avabûna nasnameya neteweyî du amraz divê li aliyekî îrade, dilsoziya îradî û eynîbûn, sedaqet, piştevanî li aliyê din tirs, zorlêkirin û zext (Gellner, 2018: 135). Civaka ku di ber netewebûnê diçe tenya bi hêza amrazên propaganda û ajîstasyonê nayê îqnakirin di heman demê de hin caran zext û zordarî jî weke entrumaneke vê pêvajoyê tê bikaranîn. Ji ber vê yekê weke amrazek zexta bi kontrol dewlet zerûrî ye. Weke teşeya hişê ya neteweperwerî encamê netewe-dewletê ye. Beyî wê nikare xwe bidomîne (Billig, 2002: 29). Lêbelê bo Gellner, hêmanek ji zext û zordariyê girîngtir heye: perwerdehî. Ew angaşt dike ku di bingeha pergala

civakî ya modern de celat tune, profesor heye. Amraz û hêza dewletê a pêşîn ne giyotîn doktoraya dewletê ye. Ji ber vê yekê bidestxistina yekdestiya perwerdehiya meşrû êdî bidestxistina yekdestiya şîddeta meşrû girîngtir û diyarker e (Gellner, 2018: 112). Kontrola li ser saziyên perwerdehiyê bo berdewama nasnameya neteweyî xwedan roleke qrîtîk e. Saziyên perwerdehiyê tenê di avakirinê de, di heman demê di bibîrxistinê de bitesîr e. Bo nasnameya neteweyî neyê jibîrkirin gelek awayên cihêreng bi me tê bibîrxistin. Bi alên ber deriyên saziyên dewletê, bi fîgurên li ser pereyan, bi abîdeyên qada civakî (Billig, 2002: 111).

Miroslav Hiroch (2011) ku yek ji lêkolînerên girîng ên neteweperweriyê ye, ji mînaka civakê biçûk ên Ewrûpî- ango civakên ku di pêvajoya netewebûnê de dereng man- modelekbo pêvajoya peydabûna neteweyan tespît dike. Li gor vê di netewebûna civakên biçûk de sê qonax hene ku pêvajoya netewebûnê destnîşan dike. Qonaxa A (serdema alaqeya akademîk), Qonaxa B (serdema neteweyî) Qonaxa C (Girsegirtina tevgera neteweyî) (Hroch, 2011: 51).

Di bingeha vejîna civakekî de her tim komek biçûk yê entelektuel heye. Aleqeyek mezin bo dîrok, ziman û çanda wê civakê de ligel van rewşenbîran dibe, ev yek Qonaxa Ayê pêk tîne. Rewşenbîrên vê qonaxê ne xwedan tesîreke mezin ê civakî bûn, xwedan bîreweriyek welatparêz bûn lêbelê ji motîvasyonek millî bêtir bi meraqeke derbarê herêma jiyana xwe tevdigeriyan. Bi demê re koma biçûk berfirehtir û naveroka lêkolînan jî ji zanistiyê wirdetir, neteweyî bû. Di Qonaxa B yê de komek welatparêzê ku rewşa civakî nememnûn in, hewl didin ku di nava civakê de hişmendiya neteweyî şiyar bikin. Di vê qonaxê de lêkolînên zanistî xizmetî armancên neteweyî jî dike. Di qonaxa Cê de ajîtasyon û çalakiyên koma sînorkirî di nava girseyên gel de, berbelav dibe ûwan li derdora nasnameya neteweyî mobîlîze dike (Hroch, 2011: 50-51). Teoriya Hroch ya sê qonaxî di hemû civakan de bi heman awayî pêk nayê pêvajoya netewebûna civakekî dibe ku di qonaxekî de asê jî bimîne. Dibe ku civatek qonaxa A û B derbas be jî di nava girseyên civakê de berbelav nebe an jî ji aliyê hêzek hegemonîk were fetisandin.

Weke Hroch jî destnîşan dike di pêvajoya avakirina neteweyê de, komek biçûk yê rewşenbîr bala xwe dide xebatên akademîk ên weke ziman, dîrok û çand lê bes ne bi niyetek zanistî di heman demê datayên van xebatan di honandina neteweyê de tên bikaranîn. Ev weke hemanên çandî yên ku wê civakê temsil dikin – ango neteweperwer wisa angaşt dikin- di avakirina nasnameyê de tên bikaranîn. Lêbelê çendê van rasterast civakê temsil dikin gumanbar e. Li gor Gellner (2018: 138-139) parçe û pîneyên çandî yên ku neteweperwerî bikartîne îcadên dîrokî ne ku gelek caran bi awayekî serabera hatine afirandin. Çandên ku bi angaşta wan de

tên parastin û ji nû ve tên vejandin gelek caran dîsa îcada wan bi xwe ye an jî ew çend veguheriye ku nayê naskirin. Eric J Hobsbawm (2006: 1-18) jî li ser honandina tradisyona radiweste wan weke *îcadkirî* binav dike. Li gor wî kevneşopî -bi taybetî jî kevneşopiyên Ewrûpî- di esasê xwe de berhemên serdema modern in. Bi gelemperî di serdema dawiya sedsala nozdemîn û destpêka sedsala bîstemîn ji bo van kevneşopiyan serdema avabûnê ye. Kevneşopiyên ku weke kevn xuya dikin digihêje dîrokeke nêzîk û hin caran ev kevneşopî bi temamî di vê serdemê de hatine îcadkirin.

Hobsbawn (2006: 12) kevneşopiyên ku piştî şoreşa sanayiyê hatine îcadkirin dike sê beş a-) kevneşopiyên ku yekitiya û hevrebûna civakî an jî di cemaetên çêkirî an jî rast de aîdiyeta komî ava an jî sembolîze dikin, b-)kevneşopiyên ku sazî, statu an jî têkiliyên otorîteyê ava an jî meşrû dikin, c-)kevneşopiyên ku armanca wan ê sereke veguhestina bawerî, nirx û teamul in. Kevneşopiyên kategoriya (b) û (c) bi zanebûn hatine dizaynkirin. Kevneşopiyên kategoriya (a) yê bêtir derdikevin pêşberî me. Hobsbawm (2006: 17) tradîsyonên îcadkirî bi neteweyê eleqedar dibine. Li gor wî netewe û heta zimanên neteweyî jî honakên bi vî awayî ne, zimanên neteweyî yên standart honak in û di demeke kurt de hatine afirandin. Mînakek ji dîroknasekî ku li ser Flamanî dixebite dide ku ew dibêje zimanê li Belçîka tê hînkirin ne ew zimanê ku dê û bavên wan bi wan re pê diaxive, ango zimanê dayik tenê tişteke mecazî ye. Bo dîroknûs Elie Kedourie, (2017: 82) ziman krîtera herî girîng e bo neteweyek ku dixwaze dewletek ava bike û hebûna xwe nişan bike. Lêbelê Hobsbawm zimanê bi xwe jî parçeyeke îcadên neteweperweran dibîne.

Pêvajoya avabûna nasnameya Îskoçî de rola îcadkirina trasdîsyonan eşkere tê dîtin Dîroknas Hugh Trevor-Roper(2006) di gotara xwe ya li ser radîsyona Higlandê de balê dikşîne ser vê Li gor wî neteweperwerên Îskoç bo nasnameyeke serbixwe ava bikin gelek kevneşopiyan îcad û ava kirin. Weke parçeyeke avakirina nasnameyek orjînal herêma Highland hate bijartin ku ev herêm ji bo Îskoçan di demên berê nîşaneya barbariyê bû. Îro amrazên ku em weke parçeyeke nasnameya neteweyî ya Îskoçan dibînin, weke mînak cil û berg-kilt-, enstrumana gayda her çend li gor Îskoçan atfî serdema antîkîteyê jî bike, berhemên serdema modern in. Ev amraz berê jî hebûn –ne bi vî awayî be jî- lê ew li nîşaneya Highlandiyên şantajkar, sextekar û talankar bûn, bi temamê Îskoçan îfade nedikir in (Trevor-Roper, 2006: 19-20). Çanda Highlandê ku ji bo Îskoçan temsîla barbarî û paşdamayînê dikir çawa bû parçeya herî girîng a nasnameya Îskoçî?

Di dawiya sedsala hijdemîn û destpêka nozdemîn de di sê qonaxan de kevneşopiyeke xweser a Highland hate avakirin û ev kevneşopî li ser temamê neteweya Îskoçan hate

hilpesartin. Qonaxa yekem de li dijî Îrlanda serhildana çandî dest pê kir, dîrokek nû ji bo paşeroja neteweya Îskoçan hate avakirin ku ji rastiyê dûr bû, çanda Îrlandî hatibû dizîn û berevajî rastiyê weke ku Îrlandî mustemlekeya Îskoçyayê be, bi agahiyên bêbinî dîrok ji nû ve hate nivîsîn Qonaxa duyem de kevneşopiyên Highland ku weke xweser û pêşîn dihate pêşkêşkirin bi awayekî sûnî ji nû ve hate afirandin. Qonaxa sêyem de ev kevneşopî ji bo Îskoçyaya Lowland, Pîkt, Rojhilata Îskoçya ya Sakson û Norman hate pêşkêşkirin û li wan deran dan qebûlkirin. Çanda Highland li ser temamê Îskoçan hakim bû (Trevor-Roper, 2006: 19-20).

Neteweperwer di avakirina nasnameyê pêdivî bi îcadkirina çandê dîtin, ji ber ku civatek bi rêya dîtina cûdahiyên xwe dikaribû were îqnakirin. Bo fehma cûdahiya komekî komek din divê. Û têkiliyek. Li gor Eriksen (2004: 27) ji bo peydabûna etnîsîteyê temaseke asgarî di navbera koman de zarûrî ye. Ev kom divê ji aliye çandî xwe ji hev cihê bibînin, eger na em nikarin behsa etnîsîteyê bikin "Ji ber ku etnîsîte ne dîmena taybetmendiyên wê ye dîmena têkiliyên wê ne." Neteweperwer ji ber vê yekê ji hevparî navkomî bêtir bala xwe dide cûdahî ya bi komên din re. Eger ev kêm an jî tunebin bi alîkariya datayên çandî û dîrokî wan diafirîne an jî li gor şert û mercan divejîne.

Benedict Anderson (2015: 20) di berhema xwe ya kult di *Hayali Cemaatler* – Imagined Communities- de neteweyê wiha terîf dike "netewe civateke siyasî ye ku tê texeyyulkirin". Texeyyulkirî ye ji ber ku endamên neteweyê herî biçûk jî endamên din dê nas neke, derbarê endamên din dê tu tişt sehnake lêbelê dîsa jî di mêjiyê her endameke/î de dê yekûna wan bijî (Anderson, 2015: 20). Îro gelek neteweyên cîhanê bi milyonan kes dihundirîne li Çînê ev hejmar digihêje 1.4 mîlyar. Ne mimkun e ku evqas kes hev du nas bikin lêbelê her çend hemû endamên wê/wî nas nekin jî di hundirê xwe de girêdanek kûr hîs dikin. Li gor Anderson (2015: 21) ne tenê netewe hemû cemaet xeyalî ne ji bilî gundên biçuk ku her ke hev du dinase. Endamên neteweyê, neteweyê yekûnek homojen ê mirovan dibinin; netewe weke civatek, cemaetek tê texeyyulkirin, her çend di civakê de newekhevî; têkiliyên kedxwariyê hebin jî netewe tim rêhevaltiyeke kûr û berwarî tê tesewwirkirin (Anderson, 2015: 22).

Girseyeke mezin ê ji mirovan pêk tê çawa xwe bi nasnameyek hevpar dinasînin. Anderson di zayîna neteweyê de balê dikşîne ser îcada matbaa û berbelavbûna weşanên nivîskî. Beriya matbaaya modern berhemên nivîskî pir hindik û bo sinifên bijartî bûn. Lêbelê matbaa vê yekê guherand, xwendin ji îmtiyazbûnê xelas bû, buhayê pirtûkan erzantir û jimara berheman zêdetir bû. Bi Reformên Martin Luther rê li ber weşanên ji bilî zimanê latînî jî vebû.

Wergerên cûda yên bi zimanên zikmakî alaqeya bazara kapîtalîst bo weşanên nivîskî jî bilindtir kir û li Ewrûpa amrazên weşandî wexta ku veguherî metayê rê li ber hin ramanên hem-wextî re vebû (Anderson, 2015: 52-58) Weşanên zimanên zikmakî kirin ku hişmendiya neteweyî pêşkeve. Bi sê avayî weşangerî rê liber hişmendiya neteweyî li Ewrûpa vekir. Di serî de zimanê gelan zimanek hevpar ê ku ji hev fêmbikin derxist holê. Mirovên heman zimanê diaxivîn têgihiştin ku bi hezaran, milyonan kes bi wan re heman qadê parvedike. Ya din weşangeriya kapîtalîst bo zimanê zikmakî sabîtiyek derxist holê. Ev sabîtî di pêvajoya dirêj de di avakirina fikra qedîmbûnê bandor kir. Dawiyê de weşangeriya kapîtalîst zimaneke îqtîdarê afirand ku ev ji zimanê gelan cûda bû, hin zarava birêktir bûn bo weşanê û li ser halê dawî yê zimanê weşanê bandorê dikirin. Ev yek bo hin zaravayên din têkçûnê îfade dikir (Anderson, 2015: 59-60). Berhemên di zimanên zikmakî de –Frensî, Almanî, Îngîlîzî – heman wextî de digihişt girseyên mezin. Dikirin ku bi milyonan kes xwe parçeyeke wê qada zimanî bibîne û xwe weke endamê wê komê texeyyul bike. Ji ber vê yekê di bingeha xwe wekî endamê neteweyî dîtinê de berbelavbûna weşanên nivîskî rolek diyarker dileyze. Anderson neteweyê mefhûmeke hilberîna serdema modernîteyê dibîne, tenya bi texeyyula civatê derdikeve meydanê.

Anthony Smith ku di warê neteweperweriyê de bixebatên xwe zanîn, bereksê teorîsyênên modernîst angaşt dike ku netewe tenya hilberîna modernîteyê nikare were dîtin. Li gor wî di serdema antîk de jî tevgerên mîna neteweperweriyên modern hebûn, li sedsala 16emîn a beriya zayîna berxwedana Îaonîa li hember Persan, li hember Sezar berxwedana Galî mînakên bi vî rengî ne (Smith, 2002: 33). Ango hestên neteweyî an jî etnîk ne tenê bi sazgehbûna neteweperweriyê derketin holê. Kokên wê pir kûr in. Smith ramanên derbarê neteweyê teorîsyenên modernîst û premordîalîstan dide berhev û rêya sêyemîn avadike. Li gor wî etnîsîte ku weke hemana herî girîng ê nasnameya neteweyî xuya dike ne weke premordîalîstan xwezayî dibîne ne jî weke modernîstan angaşt dikin rewşî-înşaî ne. Li gor wî komên etnîk bi cûdahiyên xwe yên çandî yên weke dîn, tradisyon, ziman ango saziyên xwe yêk kolektîf tên cihêkirin ku ev cûdahiyên çandî rola mîtên kokî û bîranînên dîrokî dikirpînin. Li gor wî etnîsîte hilberîna hêzên dîrokî ne (Smith, 1994: 40- 41).

Smith (1994: 32) neteweyê wiha terîf dike. “ netewe navê wê civatê ye ku xak/warek dîrokî, mîtên hevpar û hafizaya dîrokî, çandek gel yê girseyî, maf û peywirên hevpar parvedikin.” peydabûna vê neteweyê bi hebûna etnîsîteyek mimkun e. Li gor wî netewe hertim pêdivî bi etnîsîteyan dibînin. Helbet hemanên etnîk tên guhertin ji nû ve tên avakirin lê dîsa jî beyî mît û bîranînên hevpar yên derbarê welateke terîtoryal tegihîna neteweyê ne mimkun e (Smith, 1994: 71). Ew nemaze li ser mîtên kokî yên neteweyan radiweste. Angaşt dike ku

hewldanên netewebûnê beyî makewelatek, an jî koka hevpar û mîtên kokî nikare li ser piyan bimîne (Smith, 2002: 194). Mîtên kokî li gor Smith (1994: 42) yek ji taybetmendiyên serek yê hebûna etnîsîteyê ye. Piştî Şoreşa 1789an gelek neteweperwerî kokên xwe yên qedîm bi mîtên kokî de peydakirin, bi van mîtên kokî dixwestin civakê yekpare bikin bo bidestxitina makewelat mobîlîzebikin. (2002: 193) Ev yek Di diskura neteweperweran bi awayekî zelal tê dîtin ku endamên her yek weke "xwişk-bira" tên pênasekirin endamên neteweyê her yek zarokê bav an jî dayikê hevpar ê mîtîk in.

Smith herçend di derbarê mefhuma neteweyê de ji modernîstan cûda bifikire jî neteweperwerî weke berhemeke modernîteyê dizane. Dawiyê de bo peydabûna neteweyekî mudaxeleyek sosyolojik û siyasî divê. Rewşenbîr tam di vê kêliyê de rolên girîng digrin. Ew aktorên sereke ên van mudaxaleyan in.

1.3. Nasname û Rewşenbîr

Hêmanên cihêreng hene ku komeke civakî vediguherîne neteweyê. Li gel şert û mercên siyasî, civakî û çandî hewceye cemaetek rewşenbîre ku vê pêvajoyê organîze bike. Di avabûna neteweyê rola rewşenbîrên wê civatê nikare were înkarkirin. Kêm zêde hemû teorîsyenên neteweperweriyê li ser vê rolê rawestiyane. Ji bo mirov xwe weke endamê neteweyê bibîne di tesewwirkirin û fikirînê de veguherîn divê. Yên ku vê yekê pêk tînin an jî amrazên ku vê pêvajoyê hildiberînin rewşenbîr bi xwe ne.

Li gor Smith(2015: 150) derbarê têgeha netewe û neteweperweriyê têgeh û ziman ji aliyê rewşenbîran tê sazkirin. Rewşenbîr bi raman û lêkolînên xwe, bi hêma, mît û sembolan dikin ku têgehên netewe û neteweperweriyê bigihêjin derdoreke mezin. Bi kurtasî "îdeolojiya neteweperwerî û doktrîna dendikê çandî" ji aliyê rewşenbîr tê avakirin. Li gor zayîna neteweperweriya çandî– bi taybetî yên Ewrûpî- bi wan pêk tê, û bo neteweperweriya siyasî di temîna îdeolojiyê de xwedan roleke eslî ne. "Di zayîn û analîza têgeh, mît, sembol û îdeolojiyên neteweperwer de" bandoreke bênîqaş ê rewşenbîran tê dîtin (Smith, 2015: 150-151). Hroch jî weke Smith di avabûna neteweyê de rolek mezin li rewşenbîr bar dike. Hemû qonaxên tevgera neteweperwer de tesîra rewşenbîr tê dîtin nemaze di qonaxên A û B yê de bi xebatên xwe yên akademîk û siyasî rewşenbîr dike ku tevgera civakî geş bibe. Di Qonaxa A yê debi xebatên akademîk a rewşenbîran hêmanên ku vê civakê ji yên cihê dike tên tespîtkirin. Qerektara nasnameya neteweyî bi van xebatên qonaxa yekem teşe digre. Di Qonaxa duyem a di ajîtasyona

millî de rewşenbîr hestên nasnameyî dilebitîne. (Hroch, 2011: 50-51) Parçeyên çandî yên ku nasnameya neteweyî pêktîne ji aliyê rewşenbîr ve tên berhevkirin.

Rewşenbîr tenê ne di zayînê de di heman demê de di berdewamiya nasnameya neteweyî de jî rol digrin. Nemaze îcada tradîsyonan xizmetî vê armancê dike. Hobsbawm(2006: 1-18) angaşt dike ku seremonî û çalakiyên ku em weke tradîsyonel binav dikin berhemên modernîteyê ne û mudaxeleyên modern in. Hevgirtina siyasî û civakî bi van tradîsyonan xurt dibe. Kifşkirin û îcada tradîsyonê gelek caran rasterast bi xebatên rewşenbîran pêk tên.

Di pêvajoya avabûna neteweyê de ji nû ve vejandina hêmanên çandî weke encameke zerûrî derkeve pêşberî rewşenbîran. Ew ji mît, dîrok û folklorê sûdê werdigrin. Avakirina nasnameya Îskoçî[3] di sedsala nozdemîn mînaka eşkere ya vê yekê ye. Bi heman awayî di sedsala nozdemîn rewşenbîrên Galî da ku asîmîlasyona Galiyan rawestînin tradîsyona Eisteddfod -çanda civînek Galî- ji nû ve vejandin, ev çand heta digihêje sala 1176an lê naverok û form cûda bû, ew kevneşopiya jibîrkirî derbasî qada civakê bû, weke parçeyeke çanda qedîm a Galiyan hate binavkirin. Heta gihişt asta saziya neteweyî. ji kevneşopiya Druîd a antîk, qûrbankirina însanan, hate afirandin. Ozan weke fîgur dîsa vegeriya rola xwe ku hatibû ji bîr kirin. Ew di dinyaya antîk de rola ku Druîd dileyîst rahiştibû li ser milê xwe. Ji nû ve afiradina diruidîzm bo Galiyan girîng bû ji ber ku ew mîtên derbarê kevnarebûna Galiyan nîşan dida. ku pê re ji hemû Ewrûpiyan paş de diçû dîroka Galî, ew mamoste û zanayan di navenda çandê de bi cih dikir in (Morgan, 2006: 67-73). Dîsa Newrozê ku niha ji aliyê Kurdan weke parçeyeke çandî ya nasnameya Kurdî tê dîtin bi heman awayî dîsa ji aliyê rewşenbîrekî Kurd hate îcadkirin – Pîremêrd-. Pîrozkirina newrozê herçend di nava Kurdan de hebe jî hatibû ji bîrkirin, Pîremêrd yekem car bi xwendekarên xwe re bi meşaleyan diçin Girdî Mame Yare, ku îro pîrozbahiyên ku em şahidiyê dikin vedigere salên 1930î. (Ergün, 2017: 122-123) Îro newroz di dîskûra neteweperwer a Kurdî de cihek mezin digre û her sal newroz di peywendiyek neteweperwer de tên pîrozkirin. Di vê mînakê de jî tê dîtin ku di avakirina sembolên neteweyî de ne tenê têkariyên entelektuel di heman demê de pratikên rewşenbîr jî tê dîtin.

Rewşenbîr bi berhemên nivîskî digihêjîn girseyên civakê, ramanên wan, hestên wan bi rêya amrazên weşandî berbelav dibin. Li gel naveroka wan zimanê berheman jî girîng e. Di eynî wextî de bi hezaran kes bi wê zimanê dixwîne û difikire, Anderson (2015) di çêbûna texeyyula neteweyî roleke bingehîn li ser amrazên nivîskî bar dike. Di esasê xwe de hemû

[3] Bnr: Trevor-Roper, H. (2006). Geleneğin İcadı: İskoçya'nın Highland Geleneği. Di nava E. Hobsbawm û T.
Ranger (Amd.) *Geleneğin İcadı.* (19-50). İstanbul: Agora

teorîsyenên neteweperweriyê yên modernîst kêm zede di avakirina nasnameya neteweyî de bandora rewşenbîr dipejrînin. Ji ber ku ew nasnameya neteweyî weke hilberîneke civakî û hetta entelektuel dibînin.

Eger li cihek nasnameya neteweyî an jî tevgereke hewldana nasnemaya neteweyî hebe li wê dere teqez cemaeta rewşenbîran jî heye. Parçeyên çandî yên bo nasnameya neteweyî tên bikaranîn ji aliyê rewşenbîr tê îcadkirin an jî ji nû ve tên vejandin. Xebat û çalakiyên bo nasnameyê ya rewşenbîran tenê ne berhevkirina hêmanên çandî ye. Rewşenbîr di heman demê de bi çalakiyên xwe yên pratik jî hêz didin tevgerên neteweyî. Nemaze di tevgerên dij-kolonyal de rolên aktîf ên rewşenbîr tê dîtin. Piştgiriya tevgerên neteweyî yên dij-kolonyal weke berpirsyariyeke dîrokî û civakî tê dîtin ji aliyê rewşenbîr ve. Heta rewşenbîr li hember nasnameya xwe ya neteweyî dikare vê dozê bimeşîne. Piştgiriya Sartre ya bo tevgera Cezayîrê piştgiriya Îsmaîl Beşîkçî ya bo tevgera Kurdî mînakên bi vî rengî ne.

BEŞA DUYEM: ZAYÎNA REWŞENBÎRIYA KURDÎ YA MODERN

2. 1. Bingehên Rewşebîriya Kurdî ya Modern

Bingeha rewşenbîriya (entelîjansiya) modern a Kurdî vedigere dawiyên sedsala nozdemîn. Destpêka sedsala nozdemîn saziyên rêveberiyên tradisyonel ên Kurdan pêl bi pêl hilweşiyan, civaka Kurd bi temamî ketin bin kontrola du împaratoriyên mezin ên rojhilatê: Osmanî û Îran. Arîstokratên ku bi sedan sale li Kurdistanê desthilatdariyê di destê xwe de digirtin an ji holê hatin rakirin an jî ji heremên xwe hatin dûrxistin. Konfederasyonên eşîretên mezin belav bûn û eşîretên biçûk derketin holê, belavbûna otorîteyê kir ku aktorên heremî çar aliyê Kurdistanê hêz bigrin. Ligel aktorên herêmî –axayên eşîretên biçûk-, terîqet û şêx jî ji vê valahiyê sûd wergirtin û hêzgirtin. Mudaxaleyên dewletên Osmanî û Îranê di struktura siyasî û civakî ya Kurdistanê de veguherînên mezin pêk anî. Rewşenbîrî û nasnameya Kurdî ya modern girêdayî van mudaxeleyan teşe girt.

2.1.1. Di Sedsala Nozdemîn de Tevgerên Kurdî

Struktura siyasî ya Kurdistanê di encama şêrên navbera Osmanî û Îranê -sedsala 15 û 16emîn- pêk hatibû, her çend hin guherîn hebîn jî heta sedsala nozdemîn berdewam kir. Erdên Kurdistanê di nava Osmanî Îranî bibûn du beş, her du dewletê jî qismen desthilatdariyên xwe bi mîrektiyên serdemê ên nîv-otonom parvedikir. Mîrektiyên weke Erdelan, Bedlîs, Botan, Baban, Behdînan, Hekarî di serdemên xwe hêzên polîtîk yên herêmên xwe bûn. Lêbelê bi bandora tevgerên nasyonal ên kemîneyên Balkanî kir ku dewleta Osmanî navendîbûna dewletê xurttir bike. Rêveberiyên nîv-otonom ê Kurdistanê di sedsala nozdemîn de piştî îlana fermana Tanzîmatê ya Mahmûdê 2em weke encameke polîtîkaya merkezîkirina Dewleta Osmanî pêl bi pêl hatin hilweşandin.

Di pêvajoya hilweşînên mîrektiyên Kurdistanê de tekoşînên mezin ên mîrên serdemê jî tê xuyan. Heta sala 1847 an hemû mîrektiyên Kurdistanê an hatibûn hilweşandin an jî bêhêz mabûn, tenê mîrektiya Botan li ser piyan mabû. Beriya wê Mir mihamedê Rewandizî-mîrektiya Soran-, mîrektiya Behdînan û mîrektiya Baban hatibûn hilweşandin[4]. Li hember Osmanî yekji

[4] Derbarê hilweşîna mîrektiyên serdemê ji bo agahiyên berfirehtir bnr: Jwadieh W. (2012). *Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi: Kökenleri ve Gelişimi* (Çapa 7em). (İsmail Çeken & Alper Duman, Wer.) İstanbul: İletişim (117-155).

berxwadanê herî navdar tekoşîna Mîr Bedirxan bû. Eslê malbata mîrên Botan li gor Şerefnameyê digihişt fermandarê navdar Xalid bin Welid, malbat- Ezîzan- sedsalane li Cizîrê hikm dikir in. Bedirxan 1821an de bû mîrê Botan, mîrektiya ku ber bi belavbûnê ve diçû bi polîtikayên wî di demek kurt de gihişt hêzeke mezin, Bedirxan piştî serhildana Parezgerê Misrê, Mihemed Elî Paşa, - bi taybetî piştî hezîmeta şerê Nîzîpê- valahiya otorîteya Osmanî firsend dît sînorên mîrektiya xwe fireh kir, bi mîrên Miks, Hekkarî û gelek axayan re tifaqan çêkir, 1845an de Mîr navbera Amed, Musil û sînora Îranê kontrol dikir(Jwaideh, 2012: 134-155; Bruinessen, 2015: 275-276). Pêvajoya hilweşîna mîrektiya bihêz piştî tevgeerên li hember Nestûriyan leztir bû. Nestûriyên Hekkariyê ku heta wê demê bacê didan mîrê Hekkariyê li hem desthilatdariya wî derketin û bacdayînê qebûl nekirin. Helwesta Nestûriyan bi çalakiyên mîsyoneran têkilhev bû. Mîrê Hekariyê bo tepisandina Nestûriyan alikarî ji Mîr Bedirxan xwest. Hêzên mîr li dijî Nestûriyan êrişek mezin pêk anîn û gelek Nestûrî di vê hareketê de ji aliyê hêzên Mîr hatin kuştin ev êrîş di rojnameyên Ewrûpî de cî girt. Ev bûyer şûnde jî li ser helwesta Ewrûpiyan a li hember Kurdan bandor kir. Dikare were gotin ku ev bûyer li Ewrûpa mesafeyek li hember tevgerên Kurdan derxist holê (Bruinessen, 2015: 277). Kotekên dewletên Ewrûpî firsenda hilweşandina Mîrektiyê da Dewleta Osmanî. Demek kurt de peytexta mîrektî kete bin qontrola dewleta Osmanî, Mîr û aligirên wî vekişiyan keleha Erwehê berxwedanê li vê derê piştî bazariyan bi dawî bû. Dewleta Osmanî bo vê serkeftinê madalyon da çêkirin ku li aliyekî wê de wenêyê Keleha Erweh hebû, ev yek girîngiya hilweşandina mîrektiya Botan bû. Mîr tevî bi malbata xwe mişextî girava Gîrîtê bûn(Lütfi,2007: 82-83). Piştî şikestina mîrektiya Botan, mîrên ku alîgiriya Botanê dikirin ji holê hatin rakirin. Hin ji wan mîran hatin kuştin hin ji wan jî ji welatên xwe hatin sirgunkirin. Rêvebiriya li Botanê ya ku piştî Bedirxan sazbibû, piştî serhildana Êzdînşêr jî hate teperserkirin (Jwaideh, 2012: 154-155). Li Îranê mîrektiya dawî Erdelan sala 1867an hate hilweşandin, bi vî awayî hemû hêzên hegemonîk ên Kurdan di nîveka sedsala nozdemîn de ji holê rabûn (Ardalan, 2011: 234). Erdnîgariya Kurdistanê saziyên rêvebiriyê yên tradiyonel bi temamî winda kir. Ev yek kir ku di valahiya otorîteyê de hêz û aktorên nû derkevin meydanê: Terîqet û Şêx.

Di destpêka sedsala nozdemîn li Kurdistanê du malbatên ji terîqeta Qadirî bibandorbûn Malbata Sadate Nehrî û Berzencî. Her du malbat jî di heman demê de weke seyyîd tên nasîn, her du malbat bo çend aliyên Kurdistanê aliman perwerde kiribûn. Terîqetên ku heta wê demê ber bi têkçûnê ve diçûn piştî hilweşandina mîrektiyan zehftir bihêz û bi qewetbûn, di nîveka duyemîn a sedsala nozdemîn terîqeta Neqşibendî bandora xwe zêdetir û firehtir kir, modela rêxistina wan mimkun kir ku Neqşibendîtî li hemû aliyên Kurdistanê belav bibe. Mevlana Xalid

bi stratejiya xwe ya rêxistinê hegemonyaya malbatên Şêxên kevn ê Qadiriyan şikand (Bruninessen, 2015: 335). Heta hin endamên terîqettên Qadirî derbasî Neqşibendîtiyê bû u yek ji wan jî malbata Nehrî bû. Tora terîqeta Neqşibendî i her derê Kurdistanê belav bû. Li gor Martin van Bruinessen yek ji sedemên qewîbûna hêza şêxan belavkirina tapûyên erdan a wê serdemê ye, di sedsala nozdemîn dewleta Osmanî bi reformek erdên împaratoriyê bi tapû kir, ev reform kêrî Şêx, axa û hin karmendên dewletê hat. Erdên ku mirîdan bo şêx bexşandibûn Şêxan dewlementtir û bi qewettir kir (Bruinessen,2015: 347). Tam di vê kêliyê de Şêx hem xwedî hêzeke polîtîk- pozîsyona wî ya dînî- hem jî xwedî hêzeke dinyayî bû. Civak di lêgerîna pêşengan de bûn û Şêx hem bi qarîzmaya xwe ya dînî û civakî hem jî hêza xwe ya maddî bersiva vê lêgerînê bûn.

Şêx Ûbeydûllah weke aktoreke polîtîk a Kurdan wisa derkete meydanê, şerê di navebera dewleta Osmanî û Ûrisan civak westandibû, li çar aliyê Kurdistan bêaram û bêasayîş bû. Di wê kêliyê de Şêx weke rizgarker hate dîtin ji aliyê civak. Li aliyê din ser hêzên eşîretan weke fermandar hatibû tayînkirin. Ev yek rola wî ya polîtîk zexmtir dikir (Jwaideh, 2012: 160). Weke pêşengê neteweperweriya Kurdî derket holê, li gor Dr. Corchran ku wî baş nas dikir û pê re samîmî bûn Şêx xwe weke Qralê Kurdan a sîvîl didît (veguhêzer Jwaideh, 2012: 161). Şêx Ûbeydûllah hem şêxê terîqetek hem serokê eşîretek bû ev ji bo Kurdan pêşengiyên tradîsyonel bûn bes Şêx Ûbeydûllah ji van dîtir xwe weke Qralê Kurdan didît ku em dikarin bêjin ev yek bo neteweperweriya Kurdî ya modern xaleke gelek girîng e. Şêx Ûbeydûllah bi endîşeyên neteweyî tevdigeriya. Armanca wî ya sereke yekitiya Kurdan avakirina dewlete serbixwe ya Kurdan bû, berevajî ji kesayetên din ew xwe bi armancên lokal sînordar nedikir (Jwadieh, 2012: 165). Bi armancên polîtîk – neteweyî- hem li hember dewleta Osmanî hem jî li hember dewleta Îranê serî hilda. Lêbelê serhildana Şêx Ûbeydûllah demeke kurt de têk çû, piştre kurê wî seyîd Ebdulqadir di tevgere neteweyî ya Kurdan de berpisyariyên girîng hildan milê xwe. Pêşî di İttihat ve Terakki şûnde Kürt Teali Cemiyeti de cî girt, Seyîd Ebdulqadir sala 1926 an de bi angaşta alîkarî û piştgiriya sehildana 1925an bi Şêx Seîd û hevalên wî hate bidarvekirin.

Serhildanên di vê sedsalê li ser peydabûna rewşenbîriya modern, ne rasterast be jî, tesîreke mezin kir. Piştî van serhildanan li Stenbolê jimareke hêja yê arîstokratên Kurd civiyabûn. Zarokên van arîstokratên Kurd, perwerdehiyek modern dîtibûn tevgerên siyasî yên serdemê re têkiliyên wan hebûn, ev girse şûnde bingehên entelîjansiyaya modern a Kurdî avakirin.

2.1.2. Modernbûna Kurdî

Moderbûn teşeya rêxistin û jiyana civakî îşaret dike ku Ewrûpa di sedsala 17emîn de destpê kiriye û pêl bi pêl li cihanê belav bûye (Giddens, 1994: 9). Li gor Toriene (2002: 23) bes ne zîncîreya bûyer û veguherînan e, ew di heman demê de berbelavkirina berhemên çalakiyên aqlî, zanistî, teknolojîk û îdarî ne. Ji ber vê yekê di qadên jiyana civakî de zêdebûna ciyawaziyê dihundirîne. Ev qadên jiyanê siyaset, ekonomî, jiyana malbatê, ol û nemaze jî huner e. Pêvajoya modernbûnê di çar veguherînên mezin ên şoreşî de tê nirxandin. Li gor vê nêrînê çar şoreşên mezin hene ku derbasbûna modernîteyê diyar dikin: Şoreşa zanistî, siyasî, çandî û endustriyel. Her şoreşek di nava xwe de qonaxan dihundirîne, û civakek dibe ku di her yekê de hindik an jî zehf modern bûbe. Şoreşa zanistî bi Newton destpê kir. Kişfa wî ya zagona rakêşê, nêrîna du dinyayî-dinyaya fîzîkî û axiret- ji holê rakir. Têgihîştina xwezayê guherî. Berê bawerî ew bû ku xweza ji aliyê Xweda û ferîşteyan ve dihat birêvebirin, lê êdî xweza xwe bi xwe saz dike. Şoreşa siyasî bi avabûna demokrasiya Îngîlîstan, Amerîka û Fransayê xwe dide der. Bi şoreşê re li gelemperê dinyayê demokrasî bû tekane teşeya rasyonel a dewletê. Şoreşa çandî di pêvajoyeke domdar de pêk hat. Ev şoreş bi Roşengerî qerekterîze dibe. Sekulerbûna ramanê di her qadî de rasyonelbûna pîveran derxist holê. Şoreşa endustriyel jî, ji amûran derbasîbûna makîneyan, qerekterîze dibe. Bi endustriyelîzasyonê pêvajoya kedê ne girêdayî mirovan girêdayî makîneyan bû. (Jeanniere, 1994: 16-21). Li gor vê kategorîzasyonê ne şert e ku civakek sedî sed ji van pêvajoyan derbas bibe, civakek dikare di qadekê de modern, di qadekê de tradîsyonel be. Ev yek di hewladanên modernbûnê ya dewletên der-rojavayî de bi awayekî zelal tê dîtin. Dewletên der-rojavayî bi modernbûnê dixwestin şoreşa endustriyel û teknîk pêk binîn lê, di qadên çandî, siyasî de struktûrên tradîsyonêl biparêzin. Bi kurtasî armanc beyî dejenarasyona "xwebûn"ê, di qada teknîk de, pêşveçûn û endustralîzasyon bû.

Avabûna cemaeta rewşenbîriya modern ya Kurdî û modernîzasyona gelê Kurd rasterast têkildarê hev in, bereksê Ewrûpayê, modernîzm weke gelek civakên der-ewrûpî bo kurdan jî pêvajoyeke domdirêj ya veguherînê îfade nake. Modernîzm ango rojavaperwerî bo kurdan reçeteya paşdemayîna civakê bi xwe bû. Çîna navîn a ku piştre veguherîbû nifşê pêşîn a rewşenbîriya modern ya kurdî, herçend encamên tevgera modernîzasyona Osmanî be jî, modernîzma kurdî bi raya rewşenbîrên pêşîn hate parastin û sepandin. Bi gotineke din rewşenbîrên kurd, ku di encama modernîzma Osmaniyan de derketibûn holê, bûn aktorên modernîzma Kurdî (Alan, 2016: 12). Ji ber vê yekê teşekkula rewşenbîriya Kurdî beyî vekolîna pêvajoya modernîzasyona kurdî nikare were nirxandin.

Modernbûn an jî tevgera rojavayîbûna Kurdan ji ber sedemên siyasî yên taybet yên kurdan bi awayekî serbixwe nikare were nîqaşkirin. Belam ne xwediyên hêzên siyasî yên serbixwe bûn. Pêvajoya moderbûna wan di bin bandora du dewletên mezin de ma, ku Kurd di bin desthilatdariya wan de bûn: Dewleta Osmanî û Îran. Ji destpêka sedsala nozdemîn heta nîvê sedsala nozdemîn hêzên hegemonîk ên Kurdan, ku dikaribûn vê pêvajoyê bimeşînin, ji aliyên van dewletan ve ji holê hatibû rakirin, an jî desthilata wan hatibû şikandin. Pêvajoya hewldanên modernbûna Kurdî bi du dewletên serdest re hemçax, di sedsala nozdemîn de destpê kir û girêdayî tevgerên li van her du dewletan teşe girt.

Modernbûna civakên der-rojavayî weke encama lêgerîna çareseriya civakên li hember bilindbûna serdestiya leşkerî, aborî û siyasî ya dewletên Ewrûpî derketin holê. Berevajî Ewrûpayê em dibînin ku dewlet rasterast aktorê vê pêvajoyê ne. Modernbûn ango rojavayîbûn di civakên der-rojavayî de bi rêya hêzên hegemonîk hat meşandin. Ango modernbûn bo pêşveçûna dewletan projeyên dewletê bi xwe bû. Di vê kêliyê de, hin lêkolîner modernbûn û modernîteyê ji hev cihê nîqaş dikin. Li gor Çiğdem (2007: 68) modernîte projeyekê îşaret dike û modernbûn tekamula sazûmanî-binyadî îşaret dike ku vê projeyê mimkun dike. Di vê çarçoveyê de civakên der-rojavayî "moderbûyî" dibin lê "modern" nabin. Ji xwe rojavayîbûn ango modernbûn weke amrezeke îdeolojîk derket holê ku ferqa di navbera civakên der-rojavayî û rojavayî de telafî bike û civakên "rojhilatî" ji hilweşînê û talûkeya mêtîngeriyê xelas bike.

Modernbûna Împaratoriya Osmanî, di sedsala nozdemîn de, ji ber çend sedemên sereke yên siyasî destpê kir. Di serî de tevgerên neteweyî yên bi tesîra Şoreşa Frensî ya 1789an de li Balkanan berbelav bûbû, bingeha împaratoriya pir-neteweyî dihejand û paşdemayîna dewletê, li hember Ewrûpa û Rûsyayê, êdî ne cihê nîqaşê bû. Têkçûnên leşkerî û paşdemayîna mezin a di qada teknîkê de eşkere dihat dîtin. Li gor Lewis (1993: 46-47) teşşebusa pêşîn a rojavayîbûn/moderbûnê di sedsala hijdemîn de hate avêtin. Peymanên, Pasarofça (1699) û Karlofçayê (1718) li hember Ewrûpayê têkçûna Osmaniyan tesdîq dikir. Osmanî ji bo ku geşedanên li Ewrûpayê bişopînin, cara ewil, balyoz şandin bajarên Viyana û Parîsê. Wekî din di qada keştîvaniyê de reform pêk hatin. Avakirina matbaaya tirkî a pêşîn jî tekabulî heman wextî dike.

Li gor Karpat (2019: 79-80) tevgera modernbûnê ya Dewleta Osmanî girêdayî sê şertên sereke derket holê. Şerta yekem, daxwaziya navendîbûnê ango serdestkirina otorîteya navendî bû. Şerta duyem, bandor û nifuza dewletên rojavayî bû ku ev yek dibû sedema Dewleta Osmanî veguherîna saziyan pêk bîne. Şerta sêyem, jî aliyê îdeolojîk a modernbûnê bû. Di salên dawî

yên dewleta Osmanî de rojavayîbûn, esrîbûn, bo elîtên rêveber, îdeolojî û çavkaniya tekane ya îqtîdarê bû. Modernbûn wê serdemê weke îdeolojiya dij-tradîsyoneliyê xuya dike.

Dikare were gotin, li Dewleta Osmanî, yekem gavê cîddî ku dikare weke hemleya modernbûnê bê terîfkirin, avakirina mattabayê ye. Matbaaya modern di sedsala 15emîn de ji aliyê Gutenberg ve hate îcadkirin û demek kurt de li her derê dinyayê belav bû, di berbelavbûna zanînê de roleke girîng leyst. Pirtûk erzantir û zêdetir bûn ku mirov dikarî bi hêsanî bigihîne wan. Aliyekî din, weke ku Anderson (2015) angaşt dike, roman û rojname amûrên teknîkî yên texeyyulkirina cemaetê ne û di berbelavbûna wan de bandora çapxane berbiçav e. Bi vê peywendiyê, dikare bête gotin yek ji hêmana serekê ya sazbûna nasnameya neteweyî ya modern li Ewrûpayê çapxane bû. Bi her aliyên xwe matbaaya modern veguherînên kokdar pêk anî di dîroka siyasî û çandî ya Ewrûpayê de.

Mattabaya tirkî ya pêşî ji aliyê Îbrahîm Muteferrika ve di sala 1726an de hat avakirin. Li dewleta Osmanî, helbet dîroka matbaayê kevintir e. Beriya wê, li Dewleta Osmanî, matbaa ji aliyê mînorîteyan ve dihat bikaranîn. Cara ewil matbaa bi riya cihûyên ku ji Îspanyayê reviyabûn û hatibûn Stenbolê, gihîşt Dewleta Osmanî. 1567an de Ermeniyan, 1627an de jî Rûman matbaayên xwe yên ewil li Stenbolê vekirin (veguhêzer Altuntek, 1993: 192). Li Osmanî, matbaa û weşangerî ji salên 1820an şûnde xurttir bû, nemaze piştî bi fermana Mehmûdê duyem, di 1831an de rojnameya fermî "Takvim-i Vakâyî" dest bi weşanê kir û pêl bi pêl weşangerî xurttir bû (Koloğlu, 1992: 13). Matbaaya modern a Îranê, weke Osmaniyan, ew jî dereng hate avakirin. Dîroka matbaayê li Îranê digihîje sedsala şazdemîn lê ev matbaa ji aliyê mîsyoneran ve bo wergerên încîlê dihatin bikarnîn. Cara ewil Mirza Salih 1819an de matbaaya modern bo xebatên entelektuel ava dike û rojnameya yekem a Farisî "Kaxiz-î Ahbar" diweşîne. Li gor Dabashî (2008: 59) weşandina vê rojnameyê xala werçerxê bû, bo avabûna qada civakî, ku tê de meseleyên civakî û siyasî dihat nîqaşkirin. Derenghatina çapxaneyê, di heman demê de li her du dewletan, bû sedema deregmayina pêkhatina raya gîştî û nasnameya neteweyî ya modern. Ligel vê, ey yek derengmayîna tebeqeyên rewşenbîrên modern jî rave dike.

Bereksê minêkên Îran û Osmaniyan, li ser yekem matbaaya Kurdî gelek nîqaş hene. Cara ewil li Kurdistanê matbaa ji aliyê Ermeniyan ve hatibû avakirin. 1858an de, li Wanê, di Manastira Warakê de matbaa hebû (veguhêzer Serfiraz, 2015: 18) Li bajarên Kurdan, hem matbaayên xrîstiyanan (Ermenî û Sûryanî) hem jî yên ku bi awayek fermî girêdayî dewletê ne, tên dîtin. Lêbelê, matbaayeke ku weke matbaaya Kurdî were dîtin nayê xuyan. Li gor Celîlê

Celîl (2013: 93) yekem çapxaneya Kurdî, di sala 1915an de, li Helebê ji aliyê Huznî Mukriyanî ve hatiye avakirin û yekem berhema vê çapxaneyê "Mem û Zîn"a Ehmedê Xanî bû. Li gor Amir Hassapour "Çapxaneya Dewletê" ku di 1920an de ji aliyê Îngîlîzan ve li Silêmaniyê hatibû damezrandin, yekem matbaaya Kurdî ye (veguhêzer Serfiraz, 2015: 23). Di navbera îcada matbaayê û hatina matbaayê ya ji bo dewletên rojhilat gelek sal hene, ku ev yek qismen derengmayîna modernbûnê ya civakên Osmanî, Îranî û Kurdan destnîşan dike. Bikaranîna matbaayê ligel Kurdan pir dereng dest pê kiribe jî dîsa bandoreke berbiçav li ser modernîzyon û avabûna nasnameya neteweyî ya Kurdî kir. "Di her hal û karî de çapxane, bû hêmayeke girîng a modernîzm û modernîzasyona kurdî: Bi hebûna çapxaneyê derfeta belavbûn û standartbûna zimanê kurdî zêde bû. Berhemên klasîk ên edebiyata kurdî ku heta niha, bi destxetan, di nav der û dora çîna rêvebir û mollayan de dihat zanîn, wekî kitêb çap bûn û gihîştine ber destê kîtleyên berfirehtir. Bi riya kovar û rojnameyan pexşana kurdî pêşket, cûreyên nû li edebiyata kurdî zêde bûn; edebiyata kurdî ya nûjen hem zîl da hem jî belav bû*."*(Serfiraz, 2015: 23).

Helbet matbaa tenê aliyêkî reformên Dewleta Osmanî bû. Di vê serdemê de gavên moderbûnê yên pêşîn ên dewletê di Serdema Selîmê 3yem de qewimîn. Lêbelê ev reform bi qada leşkerî sînorkirî bû. Tekçûnên leşkerî yên li hember artêşên Ewrûpî û Rûsî sedema bingehîn a reformên leşkerî bûn. Teşkîlata Yenîçeriyan êdî li hember artêşên modern ên Ewrûpî û Rûsî nikaribûn xwe bigirin. Armanca ewil avakirina arteşeke nû-Nîzam-i Cedît- bû. Di serî de ji bo perwerdehiyê ji Ewrûpayê efserên biyanî anîn, dibistanên nû yên leşkerî hatin avakirin, pirtûkên perwerdehiya leşkerî hatin wergerandin (Berkes, 2019: 91-96). Di warê teşkîlat û organîzayona artêşê de, ev gavên mezin ên pêşîn bûn. Dewleta Osmanî di qada leşkerî de hêza Ewrûpayê qebûl dikir, dejenerasyona saziya yenîçerî weke problema sereke hatibû teşhîskirin, ji ber vê yekê hewldan bi qada leşkerî sînorkirî ma. Lêbele qrîza rêveberiya Osmanî, ne mimkun bû, ku tenê bi reformên leşkerî were çareserkirin. Ji ber vê yekê reformên ku di qadên leşkerî de asê mabûn, pêl bi pêl derbasî hemû qadan bûn.

Bi Mahmûdê 2yem re, di qadên siyasî û aborî de, reformên kokdar destpê kirin. Hemleya modernîzasyona Osmaniyan, ji wî şûde, heta hilweşîna împaratoriyê berdewam kir. Mahmûdê 2yem, bi reformên xwe ve hin caran, li Çarê Rûsyayê, Petroyê mezin, tê şibandin (Lewis, 1993: 77). Herçend reformên wî bi qasî Petroyê Mezin encamên bitesîr dernexistebe holê jî bingehên modernbûna Osmaniyan zexm kir. Reforma wî ya sereke hilweşandina Teşkîlata Yenîçeriyan bû, ku ev teşkîlat, demeke direj e, berbendekî sereke yê veguherînên Dewleta Osmaniyan bû. Ligel vê, di rêveberiya îdarî de, guherîn pêk anîn û nazirtî saz kirin. Sîstema timarê, ku ew

demeke dirêj bû, li Osmanî, bingeha ekonomiyê pêk dianî, lê êdî ev demeke dirêj e, barek bû li ser ekonomiya Osmaniyan, rakir.

Reformên modernbûnê, yên siyasî, yên vê heyemê, rasterast li ser qedera kurdan bandor kir. Mîrektiyên nîv otonom ên Kurd ku piştî şerê Çaldiranê hatibûn avakirin, pêl bi pêl bi polîtikaya navendîkirinê re hatin hilweşandin. Şikestina hêzên hegemonîk ên kurdan, li dewleta Osmaniyan, heta mîrektiya dawî (Botan), 1847an, berdewam kir. Piştî wê tarîxê, hêzên hegemonîk, cihê xwe ji tevgerên civakî re hiştin. Li gor Karpat (2019: 78) tevgera modernîzma Osmaniyan, di esasê xwe de, navendîkirina dewletê bi xwe ye. Elîtên Osmanî, bi rêya hilweşandina rêveberiyên xweser û navenmdîkirinê, dixwestin nasnameya Osmanîtiyê weke nasmeyeke hevpar a hemû pêkhateyên împartoriyê.

Mahmûdê 2yem, bi xwendekarên ku şandibû Ewrûpayê, rê li ber cemaetekê rewşenbîrî vekir ku vê cemaetê pêşengiya veguherînên civakî dikir. Dibistanên navîn û Tibbiye û Harbiye ava kir, ji nav van dibistanan Tibbiye gelek girîng e. Tibbiye ji ber ku zexta ûlemaya neliser bû, bû wargeha ramanên azad, yekemîn şewqên ramanên roşengerî yên rojavayî xwe li vê derê nîşan dide (Berkes, 2019: 185). Piştî mirina Mahmûdê 2yem, refeorman berdewam kir û di 1839an de Fermana Tanzîmatê hat weşandin. Li gor vê fermanê, li pergî hiqûqê, êdî hemû civak, çi misilman çi xrîstiyan, xwedî heman mafan bûn. Reformîstên ku weke Tanzîmatperwer dihatin binavkirin, bingeha moderbûna kokdar ava kirin. Li gor Lewis(1993: 126) hemleya modernîzayona Osmaniyan, bo hebûna dewletê, heyatî bû. Dewleta Osmanî, di sedsala nozdemîn de "yan dê modern bibûna yan jî dê xerabûna".

Di duyemîn nîveka sedsala nozdemîn ligel berbelavbûna fikrên rojavayî li hember edebiyata klasîk tevgereke edebiyata modern a Tirkî zîl da. Îlhama vê tevgerê edebiyata modern a Frensî bû sê navan pêşengiya vê tevgerê dikir: Îbrahîm Şînasî, Ziya Paşa û Namik Kemal. Her sê nav, ji bilî wêjevaniya xwe, bi ramanên xwe yên polîtîk jî bandor li ser dorhêla entelektuel a Osmaniyan kirin, nemaze Namik Kemal. Namik Kemal weke dengê azadîxwazî û welatperweriyê derdikeve pêşberî me. Ew di bin bandora serkeftinên Ewrûpayê de mabû, lê texlîdkirina rojavayê nediparast. Li gor wî, divê dewlet modern bibûna, lê beyî dev ji zagon, bawerî û tradîsyonên xwe berde. Bo Namik Kemal û rewşenbîrên Osmanî yên pêşîn, rojnameyên serdemê, di belavbûna ramanên pêşîlênegir de, alavên sereke bûn. Kesên wekî Namik Kemal bo modernîzasyonê, avakirina raya gîştî, pêdiviyek zarûrî didîtin. Pêşveçûn bi saziyên azad mimkun bû, saziyên azad bi raya gîştî li ser piyan dima. (Lewis, 1993: 136-145) Tevgerên rewşenbîrî yên ku li derdora rojname û kovaran digihîştin cem hev, pîştre veguherîn

tevgerên muxalîf yên ramanî. Nêzî 1865an tevgera "Yeni Osmanlılar" derkete holê, bereksê rêveberên dewletê, ku tekane armanca wan xelaskirina dewletê bû, wan azadî dixwest û bo vê yekê parlementoyeke girêdayî makezagonê diparastin. Wan, Ewrûpa, bo civakê weke talûkeyek didît. Li gor wan li hember Ewrûpayê û polîtikayên wê divê hişyariya civakî bihata avakirin. Herçend heman dustûrê biparêzin jî em nikarin behsa homojeniyekê bikin. Sê mihwerên tevgerê xuya dikin. Rojavaperweriya bêkompleksa Îbrahîm Şînasî, kesên weke Namik Kemal parlemento diparastin û kesên weke Alî Sûavî jî demokrasî weke lîstikekê didîtin. Lêbelê her sê aliyan jî di warê "tereqqî"yê de li hev dikirin. Endustrîalîzasyon, bo pêşveçûna dewletê, zarûrî didîtin û wisa bawer dikirin ku ev yek di heman demê de weke qadake xweser rê li ber civaka sîvîl jî veke. (Mardin, 1991a: 87-91)

1876an de, piştî ku Evdilhemîdê 2em hat ser text, makezona ewil "Kanûnî Esasî" pejirand û meşrûtiyet qebûl kir, bi vî awayî yekem parlemonto hat avakirin û desthilatiya padîşah hate sînorkirin. Lêbele, Meşrûtiyeta yekem di demeke kurt de têk çû û parlemento hat girtin. Evdilhemîdê 2em, piştî girtina parlementoyê rejîmeke zordest avakir û desthilatriya dewletê bi temamî xiste bin kontrola xwe. Polîtikayên wî, yên ku mutlaqiyeta wî zexm dikir, bû sedema avabûna tevgerên muxalîf ên organîze û mezin. Muxalîfên ku weke Jontirk dihatin nasîn, her çiqas ne xwedî îdeolojiyeke hevpar bin jî, hemû jî li hember îstîbdata Evdilhemît bûn û rojavaperwer bûn. Em dikarin behsa du cereyanên sereke bikin. "İttihat ve Terakki Cemiyeti" meşrûtiyeteke navendî diparast, bereksê vê "Teşebbüsü Şahsi ve Ademi Merkeziyet Cemiyeti" jî ku rêveberiya wê Prens Sabahattin dikir, ademî merkeziyet diparastin(Tunaya, 1960: 43-70) "İttihat ve Terakki Cemiyeti" 1889an de hate avakirin ku vê cemiyetê wê demek şûnde rêveberî bixista bin kontrola xwe. Cemiyet ji aliyê xwendekarên Tibbiyeyê ve hat avakirin. Armanca wan, ronîkirina civakê û xilaskirina împaratoriyê ya ji parçebûnê bû (Mardin, 2008: 76-77).

Osmaniyan, bi reforman dixwestin pêşî rojavayê nas bikin û pişre jî wê têk bibin. Motîvasyona sereke, ji holê rakirina ferqa di navbera Dewleta Osmanî û Ewrûpayê de bû. Lêbelê, kesên ku ji bo perwerdehiyê çûbûn Ewrûpayê dîtîn ku ne tenê saziyên dewletê, sîstema ramanê jî, li hember Ewrûpayê bêhêz bû. Ramanên rewşenbîrên ku li Ewrûpayê gihiştibûn xwe dispart sê têgehan "ilm, fen û teraqqî" (Hanioğlu, 1985: 12-13). Ev yek bû sedema şikestinên ramanî jî. Osmaniyên ku dixwestin beyî veguherînek çandî û ramanî pêşkevin, dîtin ku ev yek ne mimkun e.

Mîna Osmaniyan, di sedsala nozdemîn de, li Îranê, di serdema Kaçariyan (1789-1926) de jî bo modernbûnê hewldanan destpê kiribûn. Piştî peymanên Gulistan (1813) û Turkmençay

(1818) Îranê derbeke giran xwaribû. Talûkeya Împaratoriya Rûsî bibû sedema nêzîkatiya di nevbera dewletên weke Îngilîz û Frensî. Di Serdema Feth Elî Şah de, peymanek bi îngilîzan re hat çêkirin ku yek ji maddeyên peymanê şandina xwendekaran a Ewrûpayê bû. Cara ewil di vê serdemê de komek xwendekar ku Mîrza Salih pêşengiya wan dikir, çûn Londrayê. Mîrza Salih piştî ku vegeriya Îranê bi xwe re çapxaneyek jî anîbû. Bi vê çapxaneyê yekem rojnameya farisî "Kaxiz-î Ahbar" derxist. Seyahatnameyek weşand, bi vê berhemê di sadebûna pexşana edebiyata Îranê de roleke girîng leyst. Mîrza Salih bi *Seyahatname*ya li ser reformîstên welatê xwe tesîreke xurt kir (Dabashi, 2008: 49-60) *Seyahatname*ya Mîrza Salih, berhemeke edebî û di heman demê de, weke berhemeke polîtîk û ramanî ye jî. Bi awayekî nixumandî di vê berhemê de Ewrûpaya modern û Îrana paşdemayî tê berawirdkirin Li gor Dabashi(2008: 61) di berhemê de, Mîrza Salih, di her firsendê de şîrove li ser raserbûna hiqûqê, demokrasiya parlementer, azadiya birêxistinbûnê, xweseriya civaka sîvîl û ewlehiya rêbejan dike. Îngîlîstan weke modela azadiyê û utopyaya mamul xuya dike.

Reformên herî serkeftî di serdema Nasreddîn Şah de ji aliyê serokwezîrê wî Mîrza Takî Han Kebîr ve hat kirin. Emîr Kebîr artêşa Îranê modernîze kir, di bajarbûniya Tehranê de gelek xebat kir û di 1851an de yekem dibistana teknîk "Darulfunun" hate avakirin. Di vê dibistanê de ligel mamosteyên Îranî mamosteyên biyanî jî ders didan. Lebelê Emîr Kebîr, di 1852an de hat îdamkirin (Dabashi, 2008: 66-67). Dîsa di serdema Nasreddîn Şah de statuya rêveberiyên xweser hate guhertin. Di 1867an de, piştî mirina mîrê dawî, Emanûllahê 2em, Nasreddîn Şah apê xwe weke Waliyê Erdelanê peywirdar kir û ku Erdelanê heta wê hingê, weke mîrektiyeke nîv-otonom, xweseriya xwe didomand, bû vîlayeteke rasterast girêdayî Îranê. (Ardalan, 2007: 234)

Weke Jontirkên ku xebatên xwe li derveyî welat dimeşandin, rewşenbîrên serdema pêşîn ên Îranî jî xebatên xwe li derveyî Îranê meşandin. Nemaze Stenbol bo pêşengên edebiyata modern a farsî yek ji girîngtirîn navendan bû. Kesên weke Mîrza Habîb, Mîrza Salih, Mîrza Axa Kirmanî xebatên xwe li Stenbolê dimeşandin. Li gel Stenbolê rewşenbîrên Îranê li Asyaya Navîn û Kafkasyayê xebatên xwe dimeşandin (Dabashi, 2008: 62-79). Ev yek astengiya herî mezin bû ku ramanên modern li welat tesîreke xurt çêke, xebatên rewşenbîran beriya civakê li ser elîteke biçûk bandor dikir.

Di sedsala nozdemîn de, bi giştî, dewletên der-Ewrupî weke Rûsya, Osmanî, Îran û Japonya, ketibûn hewldanên moderbûnê. Li hember hêza dewletên Ewrûpayê pêşî reformên di warê leşkerî û siyasî de dihatin kirin. Taymentmediya sereke, li her çar dewletan jî, ew bû ku

modernîzasyon weke programeke dewletê hate meşandin. Li gor Alan (2016: 17) hewldanên modernîzayonê yên civakên der-Ewrûpî hewldanên bînecîger in: "Yanî xaka ku muhtacî pêşketineke Ewrûpî ye, dê di warên aborî, siyasî û çandî de modernbûnê 'bi îmkanên dewlet'ê bi dest ve bîne. Ya rast, di nav dewletê de, ji burokrasiya sivîl û leşkerî elîtek kêmasiyekê dibîne û dikeve li pey çareseriyê. Lewma li wan xakan modernîzasyon dibe helwesteke îradî, ew di nav civatê de peyda nabe, tê bînecîkirin ango îqame kirin. Li ser rûyê vê hewildanê ji aliyê hîssî ve derengmayînek û teqlîdek heye, lê ji ber dudiliyên dezgeha berê û îmkanên li ber destan têr nakin ku modernîzasyon bêqusur bi rê ve biçe"

Bereksê Rûsya û Japonya, Îran û Osmanî di hewldanên xwe de serneketin. Karpat(2019: 83-84) angaşt dike ku modernbûn, li dewleta Osmanî, bû amrazeke destê burokrasiyê ku dixwestin serdestiyên xwe pê biparêzin. Lêbelê li Rûsya û Japonyayê modernbûn bes armancek bû bo bilindkirina dewletê. Dîsa, Rûsya û Japonyayê saziyên Ewrûpî adapteyî tradîsyonên dewletên xwe kirin, lê Osmanî bêyî ku li feydeya wan a pratîk bifikire ev sazî îxrac kirin, ku ev yek bû sedema tasfiyeya saziyên bikêrhatî yên dewletê. Di encamê de hem Osmanî hem jî Îran beriya ku modernîzayona dewletê temam bikin hilweşiyan. Ev mîsyon dewrî wan dewletan kirin ku wê werin şûna wan.

Tesîra rasterast a modernîzasyona Dewleta Osmanî û Îranî cara ewil di hemleyên navendîkirina rêveberiya dewletê de xwe nîşan da. Bi van polîtîkayên navendîkirinê, mîrektiyên nîv-otonom ên Kurdan pêl bi pêl hatin hilweşandin. Mîrektiyên Kurd ên li aliyê Osmanî di serdema Şerê Osmanî û Safeviyan de bi peymaneke di navbera mîrên Kurd û Yawiz Siltan Selîm de hatibûn avakirin. Di serdema Mahmûdê 2yem de hemû fîgurên ku desthilatdariya padîşah bisînor dikir, bi metodên siyasî û îdarî hin caran jî bi zora leşkerî hatin şikandin. Vê pêvajoyê heta 1847an, heta hilweşîna Mîrektiya Botan ajot. Piştî hilweşendina mîrektiyan malbata mîr ji erdên xwe hatin dûrxistin û li Stenbolê hatin bicihkirin.(Bruinessen, 2015) Dîsa di 1867an de li Îranê jî mîrektiya dawî, Erdelan, hate hilweşandin. Hemû hêzên hegemonîk ên Kurdan di nîveka sedsala nozdemîn de ji holê rabûn.

Li Kurdistanê hilweşandina mîrektiyan di heman demê de parçekirina desthilatdariyê bû, konfederasyonên mezin ên eşîran jî di nav xwe de parçe bûn, ji wan gelek eşîrên biçûk derketin holê, hêz û îqtîdara mîran derbasî serokên eşîrên biçûk bû, dîsa terîqetên dînî di vê serdemê de qada desthilatdariya xwe fireh kirin. Valahiya otorîteyê ku piştî hilweşandina mîrektiyan derketibû holê, ji aliyên şêxen terîqetan û axayên eşîretan ve hate dagirtin. Martin van Bruinessen (2015: 342) di pirtûka xwe ya bi navê "*Ağa, Şeyh, Devlet*" de destnîşan dike ku

waliyên ku piştî hilweşandina mîrektiyan hatibûn peywirdarkirin, civakê ew nas nedikirin û ji aliyê civakê ve meşrû nedihatin dîtin, ji ber vê nikaribûn problemên civakî çareser bikin. Pevçûn û problemên di navbera eşîrên Kurd de, berê bi rêya mîran, bi dawî dibûn lê êdî ev ne mimkun bû. Asayîşa serdema mîran xera bûbû, tam di wê gavê de, li gor Bruninessen; Şêx û terîqetên dînî bandora xwe zêde kirin, di nav civakê de rola serokatiya polîtîk bidest xistin.

Di nîviya sedsala nozdemîn de hêzeke hegemonîk a Kurdan tunebû ku pêvajoya modernbûnê bişopîne, di vê kêliyê de cemaeta rewşenbîriyê ku li Stenbolê peyda bûbû weke aktorê modernbûna Kurdî derketin holê (Alan, 2016: 12). Di dawiya sedsala nozdemîn de elîta ku li Stenbolê perwerdehî girtibû, ji aliyekî ve weke rewşenbîr; hem di avakirina nasnameya neteweyî hem jî di modernbûna civakê de cî digirt. Beyî xwedî hêzeke siyasî û programeke mezin serkeftina wan ne mimkun bû. Di heman heyemê de Ermenî li gelek bajaran xwedî dibistanan bûn. Li Stenbolê û li bajarên weke Meletî, Wan, Diyarbekir xebatên rewşenbîriyê dimeşandin û li bajar, li navçe û heta li gundên biçûk jî xwedî dibistanan bûn. Aktorên modernbûna Kurdî, li Stenbola peytext, ji civakê dûrketî bûn. Têkiliyek rasterast tune bû. Valahiya otorîteyê ya ku piştî hilweşandina Mîrektiyan derketibû holê ji aliyê terîqet û şêxan ve hatibû dagirtin. Navendên perwerdehiyê yên tradîsyonel, Medrese, bi rêya terîqetan hêza xwe xurttir kiribû. Mîsyonerên ku li Kurdistanê faaliyet dikirin di civakê de endîşeya avabûna Ermenîstanê belav dikirin ku vê yekê Kurd ji hêzên rojavayî bêtir dûr dixist. Ji aliyekî ve ev yek dûrketina ji modernbûnê û ji rojavayîbûnê jî îfade dikir.

Pêvajoya modernbûna Kurdî ango faaliyetên rewşenbîrên Kurdî bo modernbûnê di heman demê de pêvajoya sazkirina hişmendiya neteweyî ye jî. Weke Civakên din ên Osmanî şiyarbûna neteweyî li sedsala nozdemîn de destpê kir. Modernîzm weke îdeolojiya hevpar ya Rewşenbîrên Kurdêns serdemê xuya dike. Rojavayîbûn ango modernbûn di navenda dîskûra neteweperweriya Kurdî de weke amrezeke avakar xuya dike.

Di dawiya sedsala nozdemîn de, Stenbol, ne tenê bo rewşenbîrên Osmanî û Îranê, bo aktorên modernbûna civakên Osmanî – Kurd, Ermenî, Ereb, Ernawîd- jî weke wargeheke bû. Peytexta împaratoriyê, bi atmosfera xwe, bingehek bo rewşenbîriya modern a Kurdî çê dikir: Dibistanên modern, danûstandina rewşenbîrên ji neteweyên cihêwaz, weşangeriya zindî, struktura kozmopolît û her wekî din. Stonbola wê serdemê xwediyê hemû derfetên zayîna rewşenbiriya modern a Kurdî bû.

2.2. Elîtên Kurd, Rewşenbîrên Pêşîn

Rewşenbîriya –entelîjansiya- Kurdî ya modern û pêşîn li Stenbolê piştî peydabûna sinifeke perwerdebûyî û şareza derkete holê. Ev sinif, bi giştî, ji arîstokratan pêk dihat ku ev arîstokrat, piştî hilweşandina mîrektiyên nîv-otonom ên Kurd, mişextî Stenbolê bûbûn. Li gel zarokên mîran di nava vê civatê de zarokên karmend û eşrafên bajarên Kurdan jî hebûn. Perwerdehiyeke modern dîtibûn û bi gelemperî di burokrasiya Osmanî de cî digirtin.

Derfetên li Stenbolê ki ku perwerdehiyeke modern bigrin, bi rêya hînbûna zimanên biyanî Ewrûpa û ramanên modern ên weke neteweperwerî nas kirin. Ev cemaeta pêşîn ne xwedî organîzasyoneke serbixwe û neteweyî be jî ji siyasetê ne dûr bû. Gelekên wan ji parçeyekî muxalefeta dij-Evdilhemît bûn. Kurdayetiya modern dîsa bi xebatên vê sinifê peyda bû. Bajalan(2010: 88) vê sinifê weke *Jonkurd* bi nav dike û angaşt dike ku ew biyaniyê milletê xwe bûn, ji Kurdistanê dûr ketibûn û entegreyî dewleta Osmanî bûbûn, jiyana wan ji jiyana tradisyonel a Kurdan gelek cihê bû. Kurdayetiya vê sinifê ne separatîst(cûdahîxwazî) bû, daxwaza serxwebûnê nedikir. Vê sinifê rasterast maeşên xwe ji dewletê werdigirtin. Rojnameya *Kurdistan*ê, yekem hîlberîna modern a rewşenbîriya Kurdî ye. Weke amrazake modern rojnameyê, derfet da ku rewşenbîrên Kurd dengê xwe bigehînin civakê. Dikare were gotin, rewşenbîriya modern a Kurdî bi weşana Rojnameya *Kurdistan*ê destpê kir.

2.2.1. Rojnameya Kurdistan

Rojnameya Kurdistanê di sala 1898an de ji aliyê Mîqdat Mîthat Bedirxan ve li Misrê - Qahîre-dest bi weşanê kir. Zimanê rojnameya Mîqdat Mîthat Bedirxan, her çiqas di destpêkê de tenê bi Kurdî be jî piştî hejmara 4an zimanê rojnameyê dibe Kurdî-Tirkî. Ji ber zext û probleman cihê weşanên xwe gelek caran guherandiye. Rojname derbarê hizrên Kurdên wê serdemê de gelek agahiyan dide me. Di pêvajoya weşanê de veguherînên ramanî yên rojnameyê xwe bi awayekî zelal eşkere dikin. Li gor Issı (2013: 133-134) sê qonaxên rojnameyê hene. Di qonaxa yekem de, ku ji pênc hejmarên pêşîn pêk dihat, armanca rojanmeyê agahdarkirina Siltan ya di derbarê daxwaz û problemên Kurdan de bû. Dîskûrsa rojnameyê ne li dijî wî bû. Di qonaxa duyem de Ebdurehman Bedirxan dibe berpirsyarê rojnameyê, li hember polîtîkayên Stenbolê lidijderketinek tund tê xuyan, ev yek rojnameyê nêzî Jontirkan dike. Qonaxa sêyem, di 1900an de destpê dike, di vê qonaxê de polîtîkayên weşana rojnameyê bi armancên Jontirkan re wekhev e.

Rojname ji komekê, ji lijneyekê wirdetir hîlberîna hewldaneke şexsî ye. Di jimara yekem de armanca weşandina rojnameyê, ji aliyê Miqdat Bedirxan ve wiha tê destnîşankirin: "Dinyayê de çi qas Musulman hebin, di gund û bajêrên hemiya de mekteb û medrese û cerîde hene. Dinyayê de çi dibe çi nabe, cerîde dinivisin. Heyfa min têt ji Kurda re. Kurd ji gelek qewma zêdetir xweyhiş û zeka ne, camer in, dînên xwe de rast û qewî ne, xurt in; û dîsa weke qewmen dî ne xwenda ne, ne dewlemend in; dinyayê de çi dibe, cîrane wan Mosqof çawa ye, wê çi bike, nizanin. Lo ma, riya Xwedê de min ev cerîdeya ha nivîsî" (Bedirhan, 1991c: 111-112). Mîqdat Bedirxan, li rojnameyê mîsyoneke civakî bar dike û ronîkirina civakî motîvasyona sereke ya weşanê ye, ango motîvasyona sereke ronîkirina neteweya Kurd e. Mîqdat Bedirxan (1991c: 113) di berdewama nîvîsa xwe de bangî "mîr û axa"yan dike "li gundan medreseyan vekin an jî zarokên xwe bişînin dibistanan û bidin xwendin, perwerde bibin û rojnameyan bişopînin da ku ji rewşa dinyayê hayidar bin."

Misir di destpêka sedsala nozdemîn de bi Mehmed Alî Paşa re ketibû nav tevgera modernîzayoneke mezin. Hemleyên modernîzayonê, bereksê Osmaniyan, di demek kurt de encamên bibandor derxist holê. Mîqdat Bedirxan di bin tesîra atmosfera Misra serdemê de mabû:

> "Berî şeş heyva ez nesax bîm. Loma vê zivistanê ez hatim Misrê. Misir biye bajêrek hew qas mezin û xweş, heta mirov ne bîne mirov nikare bi wesfa we bizanibe. Ez hêdi hêdi ketim nêv Misriya de, elimîm hal û sin'etê wan, kesb û kara wan. Ev xelkên Misrê miroven bêzirrav in, ne camêr in, le gelek dişixulin, nawestin; li kuderê mekteb û medresek qenc hebit, nabejin dûr û nezik e, zarûyên xwe rêdikin, didin xwendin, dielimin sin'eta, dielimin hemî tişta. Nuho nêva Misre da ji xelkê Misre hew qas xwenda û alim hene, hew qas miroven xweysin'et û huner hene, gelek miûziye bajêr ew xwe çedikin. Nêv Misriya de mirov hene, top û tifinga çêdikin; mirov hene xaniyên pêncî mezel ava dikin; nêv wan xweysin'eta de mirov henin, rojê pêncî-şêst çerxiya distînin; mal û xêniyê hemiya xweş in, hemî xweyxadim û xulam in; û nêv wan de nexwendayê reben jî hene, lê hindik in." (Bedirhan, 1991c: 115-116).

Rojnameya Kurdistanê xwedî kurdayetiyeke çandî bû li gel vê kurdeyatiya xwe, tu problema nivîskarên rojnameyê bi nasnameya Osmanîtî tune bû. Ebdurehman Bedirxan ku xwedî pozîsyoneke muxalîf bû di hejmareke rojnameyê de wiha dinivîse: *"*Heçiyê Musulman e, divê ku Dewleta Osmaniyê baqî bimîne wekî me dît ku cîsmê dewletê ji sûê îdareyê merîz e, divê em wî cîsmî tedawî bikin, eshabê merezê îzale bikin. Saxiya dewletê saxiya me ye, mirina wê mirina me ye*"* (Bedirhan, 1991a: 310).

Dîsa di heman salê de di hejmareke din a rojnameyê de li ser îhtîmala dagirkirina Lîbyayê Ebdurehman Bedirxan li dij polîtîkayên Ebdulhemîd di nivîsekê de wiha dinivîse: "Çunkî âlem hemî zane ku Ebdulhemîd milet û wetenê miletî muhefeze nake. Tu mehabata hukumeta me li ser ecnebiya nemaye. Bînaen'eleyh, Musulmanên Trablusê hemî heçku bêkes û bêsahib in… Paş muddetekî Îtalya wê dere bide ber top û tifinga. Xunkarê me, ewê gelek xelkên cahil wî Xelîfe, Îmamê Muslîmîn, Zillullah fî'l-erd tesewwir dikin, wê wan rebenên Trablusê bine topên Îtalyayê bihêle"(Bedirhan, 1991b: 286). Ji ber ku gelê Trablûsê bêxwedî dihêle rexne li dijî Ebdulhemît tê kirin ku ev fehma Osmanîtî ya nivîskarê rojnameyê dide der.

Têkiliya Ebdulhemît û Kurdan têkiliyek kompleks e, Ebdulhemît di burokrasiya Osmaniyan de cî dabû gelek Kurdan, bandora wan a rêveberiyê zêde kiribû. Alayên leşkerî avakiribûn ku endamên wan eşîrên Kurd bûn. Dîsa bo zarokên axayên kurd dibistanên eşîretê vekiribû. Di serdema Ebdulhemît de serhildaneke mezin ya Kurdan dernekete holê lê Muxalefeteke Kurd ya li dij wî derketibû holê. Ebdulhemîd, ligel ku di burokrasiye de cî dida Kurdan jî, hêmana herî biçûk ku wê îqtîdara wî tehdît bike piştgo nedikir, delîla herî mezin nefikirina Bedirxaniyan e. Ebdulhemîd di sala 1906an de Malbata Bedirxaniyan bi angaşta kuştina Şehremîniyê Stenbolê-Ridvan Paşa- temamî ji stenbolê mişext kir. Ji Bedirxaniyan tevî zarokan ve 107 kes mişextî cihên cuda bûn (Lütfi, 2007, 105). Li gor Malmîsanij (2011: 39) ev hejmar zêdetir e, bes ne Bedirxanî hin kesên din jî, ku di navs wan de kesên ne kurd jî hebûn. Ev bûyer kompleksa têkiliya Kurd û Ebdulhemîdê 2em destnîşan dike, Bedirxaniyên ku heta wê demê di astên cûda yên burokrasiyê de cî digirtin ji ber bûyereke şêlû bi temamî ji burokrasiyê hatin dûrxistin û nefîkirin. Özoğlu (2012: 173-174) amaje dike ku Osmaniyan, gelek caran, civakên din bi rêya tevlîkirina burokrasiyê kontrol dikirin. Tê xuyan rewşenbîrên pêşîn bi gelemperî di burokrasiye de cî digirtin, bo nimûne Seyîd Ebdulqadir serokê Şûraya Dewletê bû. Gelek endamên malbata Bedirxaniyan xwedî nasnavê paşatiyê bû, yên din jî wek efser, dozger xizmeta Osmaniyan dikirin.

Îstîbdat û zextên Ebdulhemîdê 2em rewşenbîrên Kurd û Jontirk nêzî hev kir. Hin Kurdên weke Abdûllah Cevdet jî rasterast di mixalefeta Jonturkan de cî digirt. Ligel muxalifbûna xwe Jontirk li dijî tevgerên cudahîxwazên civakên din – bi taybetî Ermenî- derdiketin, heta weşanên muxalîf ên bi zimanên din jî di çarçoveya Osmanîtiyê de nedidîtin, ev nêrînên wan bi rêveberiya Ebdulhemîd wekîhev bû. Lê weşanên Kurdî îstîsnayên vê nêrînê bûn. Kurd ji aliyê Jontirkan ve, mîna Ebdulhemîdê 2em, li rojhilatê împaratoriyê, li hember Ermenan weke hêmana dengeyê dihatin dîtin (Hanioğlu, 1981: 209-211) Ligel muxalefeta wan endîşeya sereke ya Jontirkan

xelasî û silametiya împaratoriyê bû. Rojnameya Kurdistanê heta sala 1902yan weşana xwe domand, piştre sekînî, xebatên Kurdî piştî şoreşa meşrûtiyeta Osmaniyan, piştî 1908an rawestiya.

2.2.2. Pêşengê Neteweperweriya Modern: Hecî Qadîrê Koyî

Di serdema pêşîn a rewşenbîriya Kurdî de navê herî girîng Hecî Qadirê Koyî ye. Cara ewil, nasname weke meseleyekê bi riya Koyî derdikeve pêşberî me. Koyî bi helbestên xwe hem di edebiyat û hem jî di ramana neteweperweriya Kurdî de veguherînên mezin pêk anî. Bi awayekî modern, neteweperweriya Kurdî, yekem car di berhemên Hacî Qadirê Koyî de xuya dibe. Di helbestên wî de neteweperweriyek cûdahîxwaz tê dîtin. Dijberî ya wî ne tenê li hember Osmaniyan e, li hember Îranê ye jî (Hasanpour, 2005: 161; Ergün, 2017: 57). Koyî, ji aliyê teşeyê ve na, lê ji aliyê naverokê ve di edebiyata kurdî de guherînên mezin pêk anî, ji ber vê yekê pêşengê edebiyata modern a Kurdan tê dîtin (Çeçen, 2017: 46).

Neteweperweriya Koyî xwedî rengeke tradîsyonel e, mîrektiyên feodal modela wî ya rêveberiya serbixwe ye (Hasanpour, 2005: 164). Helbesta wî ya navdar 'Xakî Cizîr û Botan' bi awayekî eşkere vê destnîşan dike:

Kiwa waliyî Senenduc, begzadey Rewanduz

Kiwa hakimanî Baban, mîrî Cizîr û Botan

….

Kiwa ew demey ku Kurdan azad û serbexo bûn

Sulltanî mullk û millet, sahîbîceyş û 'îrfan (Koyî,2004: 84)

Dîsa di helbesta 'Hakim û Mîrekanî Kurdistan' de pesnê mîrên bere ên kurdan dide.

Hakim û mîrekanî Kurdistan

Her le Botanewe heta Baban

Yek be yek hafîzî şerî'et bûn

Seyyidî qewm û şêxî millet bûn (Koyî, 2004, r.124)

Koyî(2004) li gel kurdeyatiya xwe ya tradîsyonel xwedî bîreweriya ziman û perwerdehiyê ye. Helbesta ‘Eger Kurdek qisey babî nezanî’(2004: 60) diyar dike ku Koyî ziman parçeyekî girîng yê nasnameyê dibine, di helbesta ‘Selamu ilahî munnî kulle yewmîn’(2004: 135) de jî di çar milyon nifûsa Kurdistanê de kêmbûna nivîsandinê tê rexnekirin. Endîşeya avabûna Ermenîstanê weke gelek Kurdên wê serdemê li ser Koyî jî bandor kiriye û ew avabûna Ermenîstanê weke mirina kurdan dibîne.

Hîç xîretek nemawe sed car qesem be Qur’an

Peyda bê Ermenîstan namênê yek le Kurdan (Koyî, 2004: 83)

Îhtîmala avabûna Ermenîstanê endîşeyeke hevpar a Kurdên wê serdemê ye. Dikare bête gotin ku di bingeha hizrên Osmanîparêz ên wê serdemê de bandora vê yeke heye. Kurd avabûna Ermenîstanê, ku terîtoriya wê di heman demê Kurdistan bi xwe bû, weke talûkeyeke hebûnî didîtin. Dewletên Ewrûpî li gel Ermeniyan bûn û bi awayekî xwezayî Dewleta Osmanî dibû tekane hevalbendê Kurdan. Helbet bandora faktorên dînî jî li ser vê yekê hebû. Bo rewşenbîrên serdemê hebûna Kurdan bi hebûna Osmaniyan ve têkilhev bû. Helbet mînakên bereksê vê helwestê hebûn, Ebdurehman Bedirxan yek ji wan kesan bû ku çalakiyên Kurdan yên li hember Ermeniyan rexne dikir. “Şerê Ermeniya û Kurda de ez zanim Kurda gelek Ermeniyên bêguneh kuştin. Xwedê ji wî halî ne razî ye. Kurdan ew guneh ji cahîliya xwe kir. Ewan nedizanî kuştina Ermeniya wek kuştina Musulmana ye. Parek wî gunehî jî li ser alimên Kurda ye.” (Bedirhan, 1991c: 209). Dîsa Koyî her çend li dijî avabûna Ermenîstanê be jî li hember Dewleta Osmanî û Îranê bû jî. Helwesta Koyî ji rewşenbîrên ku piştî wî jiyane jî pêşdetir e. Wî, Osmanî weke tercîheke mecbûrî nedidît.

2.3. Meşrûtiyeta 2emîn a Osmanî û Xebatên Rewşenbîriyê li Stenbolê

Di sala 1908an de dema Jontirkan Ebdulhemîd têk birin û mecbûr hiştin meşrûtiyetê îlan bike, ligel hemû pekhateyên Osmanî, Kurd jî ji îlana meşrûtiyetê gelek memnûn bûn. Bo demek kurt, meşrûtiyetê qadeke azad avakir bo xebatên rewşenbîrî yên Kurdî. Piştî îlana Meşrûtiyetê, li Stenbolê, xebatên Tevgera Kurd geş bûn, di vê dorhêla azadiyê de Kurdan li Stenbolê gelek Cemiyet avakirin. Rewşenbîrên kurd cara ewil birêxistinî tevgeriyan û hatin gel hev. Nemaze ‘Kürt Teavun ve Terakki Cemiyetî’ û ‘Hêvî Kürt Talebe Cemiyetî’ du cemiyetên girîng ên vê serdemê ne. Her du cemiyetan jî li ser ramangeriya rewşenbirên Kurd tesîreke mezin kirin.

2.3.1. Kürt Teavun ve Terakki Cemiyetî (Komeleya Alîkarî û Pêşketina Kurdî)

Yekem cemiyeta kurdî ya legal bi navê Kürt Teavun ve Terakki Cemiyetî(Komeleya Alîkarî û Pêşketina Kurdî) li Stenbolê, di 1908an de vebû, serokatiya komeleyê Seyîd Ebdûlqadir dikir (Tunaya, 1988: 404). Di vê serdemê de hemû pekhateyên împaratorî, li Stenbola peytext, bi rêya komeleyên bi vî rengî xwe birêxistin kirin. Komele, di nîzamnameya xwe de destnîşan dike ku li bajarên Kurdan dê şaxên komeleyê vekin-madde 17- û weke sazî, di nav çarçavoyeva qanûnan de, dê ji bo çareseriya problemên civakî yên li Kurdistanê diqewimin, bixebitin-madde 24-. Li gor nîzamnameyê tenê kesên ku li Stenbolê dimînîn dikarin bibin endamê heyeta îdarî- madde 5- (Tunaya, 1988: 409-413).

Endamên cemiyetê bi heman navî rojnameyek derdixistin. Rojname bi zimanî Kurdî û Tirkî derdiket û xwediyê îmtiyaz û midurê rojnameyê Süleymaniyelî Tevfik-Pîremêrd- bû. Tevfik di hejmara yekem de destnîşan dike ku komele dê bo pêşxistin, geşedan, perwerde û çanda Kurdî bixebite. Di heman nivîsê de, Kurd weke endameke birûmet û yekem peymankerê şerefa Osmanîtî tê terif kirin. (Tevfik, 1985: 40) Komele, beyî xebatên polîtîk bo pêşxistin û geşedana civaka Kurd dixebitî. Yek ji endamên girîng ên komeleyê Dr. Şükrü Sekban (1998: 26) bû, ku piştî demekê ji tevgerên kurd veqetiyabû, derbasî aliyê Kemalîstan bûbû di pirtûka xwe ya bi navê *Kürt Sorunu* de niyetên endamên komeleyê wiha tîne ziman, “Ez beyan dikim ku, ji wan tu kesan îmtiyazek biçûk jî ji bo kurdan nedixwestin. Lê me hemûyan jî di şeş wîlayetên Rojhilat de reforman dixwestin. Diyar e, Osmanîtî, weke nasnameyeke hevpar tê dîtin ji aliyê endamên cemiyetê ve.

Di destpêka şoreşa meşrûtiyeta duyem de têkiliyên rasterast di navbera cemiyet û hikumetê de jî tên dîtin. Îsmaîl Hakki Baban, ku yek ji endamê Kürt Teavün ve Terakki Cemiyetî û nivîskarê rojnameya cemiyetê bû, di heman demê de karê wezareta perwerdehiyê dikir. Vê serdemê li Stenbolê bi navê Kürd Meşrûtiyet Mektebî dibistanek hatibû vekirin(Malmisanij, 2011: 77-78). Ev mekteb girêdayî Neşr-i Maarif Cemiyetî bû û midûriya vê dibistanê Ebdurehman Bedirxan dikir (Chirguh, 2009: 43). Mektebê ji Wezareta Perwerdehiyê alikariya ekonomîk digirt. Eşkere ye ku ev yek bi riya Îsmaîl Hakki Baban pêk dihat. (Malmisanîj, 2011: 78) Kürd Meşrûtiyet Mektebî, dikare bête gotin, yekem dibistana modern a Kurdan bû, helbet li bajarên Kurdan bi destê dewletê dibistan hatibûn avakirin, lêbelê cara pêşîn Kurd bi vê dibistanê bûn xwedî saziyeke modern a perwerdehiyê. Lêbelê ji ber ku

dibistan ne li bajarên Kurdan bû, xwedî bandoreke sînorkirî bû li ser civaka Kurd, weke hemû xebatên li dîasporayê.

Dorhêla Azadiyê ya, ku bi meşrûtiyetê pêk dihat, weşanên Kurdî û Kurdistanî berbelavtir kir. Ji bilî rojnameya Kürt Teavun ve Terakkiyê çend rojnameyên din jî derketin. Şark ve Kürdistan dîsa rojnameyê vê serdemê ye û di 1908an de dest bi weşanê kir. Avakarên rojnameyê Hersekli İsmail, Malatyalı Bedri û Hersekli Ehmed Şerif ne. Seîdê Nursî jî yek ji niviskarên vê rojnameyê bû. Rojnameya meşrûiyetparêz bi temamî Tirkî derdiket û li ser problemên Kurdistan û Balqanan radiwestiya (Serfiraz, 2015: 43). Rojname bi naveroka xwe hişmendiya Osmanîperwer a rewşenbîrên serdemê baş destnîşan dike. Herçend Balqan û Kurdistan weke cografya, îro bo me bi temamî ji hev cihê bûbe jî, wê serdemê, ji bo rewşenbîrên ku neteweyên wan ji hev cihê ne, welatê hevpar îfade dikir. Vê serdemê dîsa bi navê "Kurdistan"ê rojnameyek derdiket, dikare were gotin ku berdewama rojnameya yekemîn bû, nivîskarên rojnemayê bi giştî endamên malbata Bedirxaniyan bûn. Weşana rojnameyê bi Kurdî û Tirkî bû, ku demek kurt berdewam kir û piştî bûyera 31ê Adarê ji aliyê İTCyê ve hate girtin (Veroj, 2018: 33).

2.3.2. Hêvi Kürt Talebe Cemiyetî (Hêvî Komeleya Xwendekarên Kurd)

1912an de, dîsa li Stenbolê, Hêvi Kürt Talebe Cemiyetî hat avakirin, cemiyet ji aliyê xwendekarên ve ku li Stenbolê perwerdehî didîtin, hatiye avakirin. Bereksê Kürt Teavün ve Terakki Cemiyeti endamên wê ne tene arîstokrat in. Di navbera avakarê Cemiyetê de Ekrem, Emer û Kadrî Cemîlpaşazade, Memdûh Selîm, Hemzeyê Muksî û Ebdûrehîm Rehmî jî hene. Cemiyetê kovareke bi navê Rojî Kurd derdixist ku zimanê weşanê kurdî (kurmancî-soranî) û tirkî bû. Armanca kovarê pêşxistina civaka Kurd bû, di hejmara yekem a kovarê de di beşa "Gâye, Meslek"ê de tê destnîşankirin ku cehalet problema sereke ya civaka Kurd e, divê Kurd ji aliyê marîfet û medeniyetê ve bigihêje hemçaxê xwe (Rojî Kurd, 2013: 98-99). Di esasê xwe de ev nêrîn gelemperî bi mûnevverên Kurd re hebû, di berdewama nivîsê de tê destnîşankirin ku wan bo şiyarkirina civakê Hêvî û Rojî Kurd ava kirine (Rojî Kurd, 2013: 99). Sekban (1998: 27) wiha behsa komeleyê dike, "Komeleya xwendekara Hêvî ku beriya şerê Balkanan hatibû avakirin, bi rastî jî, li serxwebûna Kurdistanê nedifikirîn". Tenê 4 hejmarên Rojî Kurdê derketin. Cemiyetê, heta destpêka Şerê Cîhanê yê Yekem xebatên xwe meşandin, piştî ku şer derket komele belav bû. Piştî weşana Rojî Kurd bi dawî bû, Hetawî Kurd weke berdewama vê

kovarê derket, zimanê kovarê bi Kurdî û Tirkî bû. Gerînendeyê berpirsyar ê Hetawî Kurdê Baban Ebdulezîz bû. Hetawî Kurd kovareke edebî bû û heta îlana seferberiya şer weşana xwe domand. Piştre weşan rawestiya (Malmîsanij û Lewendî, 1989: 62-63).

Her çend xebatên rewşenbîriya Kurdan, piştî şoreşa 1908'an, geş bûbe jî piştî ku Îttîhat û Terakkî rêveberî bi temamî xiste bin qontrola xwe xebatên Kurdan pêl pêl sekinîn. Îttîhat û Terakkî Cemiyetî dema 1895'an de ava bû ji 4 avakarên wê 2 kes Kurd bûn: Îshak Sukutî û Abdûllah Cevdet. Bi taybetî Abdûllah Cevdet di nav Jontirkan de xwedî bandoreke mezin e. Jontirk, di bin bandora hizrên weke azadîxwaz, wekvehîparêz û pozîtîvîzmê de mabûn lê piştî talûkeya li dijî şoreşa 1909'an rêveberiya împaratoriyê kete destê Enver, Talat û Mehmed Cavîd ku di hikumetê de wezîr-Şer, Navxweyî û Maliye- bûn. Îttîhat ve Terakkî Cemiyetî ji hizrên destpêkê yê Jontirkan dûr ket (Jwaideh, 2012: 208-211). Li gor Taştan (2012: 66) piştî têkçûna Şerên Balkanan, ku erdên Balkanan bi giştî ji destê Osmaniyan derket, dîskûrsa Împaratoriyê xerabû. Vê xerabûnê bi xwe re veguherîneke epîstemolojik anî û neteweperweriya Tirkî di vê pêvajoyê de hê gir û xurt bû, welatê emperyal veguherî makewelêt. Dewleta Osmanî, êdî hemû pêkhate temsîl nedikirin. Di salên dawî yên Dewleta Osmanî de, ramanên panturkîstiyê bû siyaseta dewletê.

Di navbera cemaeta rewşebîrên Kurd ê wê serdemê û dewleta Osmanî de têkiliyek kompleks hebû. Özoğlu (2012: 173-174) amaje dike ku Osmanî gelek caran civakên din bi rêya tevlîkirina burokrasiyê kontrol dikir. Tê xuyan rewşenbîrên pêşîn gelemperî di burokrasiye de cî digirtin, bo nimûne Seyîd Ebdulqadir serokê Şûraya Dewletê bû, gelek endamên malbata Bedirxanî xwedî nasnavê paşatiyê bûn, yên din jî wek efser, dozger xizmetiya Osmaniyan dikirin. Vê sinifê rasterast maeşên xwe ji dewletê werdigirtin. Helbet xwedî bîreweriyeke Kurdewar bûn, lê di nav sînorên Dewleta Osmanî de li çareseriya problemên Kurdan difikirîn. Bajalan (2010: 44) amaje dike ku îdeolojiya vê sinifê dikare weke Osmanîperweriya Kurdî were terîfkirin. Hem Özoğlu (2012) hem jî Bajalan (2010) angaşt dikin ku Tevgera Kurd û cemaeta Rewşenbîrên pêşîn yên Kurdên Osmanî ne neteweperwer bû. Helbet Koyî û helwesta wî îstîsnayeke girîng e. Dikare were gotin sedema cudahiya hizr û sekna Koyî ji wir tê ku ew bi tu awayî ne girêdayî dewleta Osmanî bû. Nebûna peywireke resmî derfet dida wî ku bibe xwedî fikriyateke serbixwe jî. Di xebatên rewşenbîriya wê serdemê de neteweperweriyeke cudahîxwaz xuya nake. Mêyla giştî ya mûnevveran pêşxistina Kurdistanê û perwerdekirina civaka Kurd e. Rewşenbîran derbarê şerqê de reform dixwestin. Vê pozîsyonê ew ji zextên İttihat Terakki Cemiyetiyê bêpar nehiştiye.

Piştî têkçûna dewleta Osmanî û peymana agirbestê Mondrosê, pergala İttihat Terakki Cemiyeti şikest û qadroyên wê belavbûn, di wê pêvajoyê de Kurdan li Stenbolê ji nû ve dest bi xebatên xwe yên rewşenbîrî kirin. Şer, li ser fikriyata rewşenbîrên Kurdan, veguherînên berbiçav pêkanî û naveroka xebatên wan polîtîktir kir. Beriya şer rewşenbîrên Kurd li ser kemasiyên civakî radiwestiyan, perwerdehî wek kêşeya sereke ya Kurdan didîtin, xwedî sekneke Osmanîperwer bûn û berdewamiya statukoya li dewleta Osmanî bo berjewendiyên Kurdan kêrhatîtir didîtin. Lê piştî ku şer qediya û hilweşîna dewleta Osmanî misoger bû, rewşenbîrên Kurd li reyên alternatîf geriyan. Di vê pêvajoyê de Kurdperwerî bi lezginî bilind bû, eşkerekirina prensîbên Wilson bes ne ji bo Kurdan ji bo hemû civakên bindest nîşana hêviyê bû. Celîlê Celîl (2013: 86) sedema kêmasiyên xebatên vê serdemê wiha rave dike:

> "Li ser mîsyona ronîkirina civakê ya rewşenbîrên Kurd, dikarim bêjim, gelekê wan beyî ku li ser pirsgirêkên civakî biseknin û li dijî sîstem û rêveberiya mevcûd şer bikin, bala xwe dan problema perwerdehiyê. Rewşenbîrên ku dixwestin çanda Ewrûpî biniçilînin civaka Kurd, bi hêza xwe ya ku ji menşeyên wan ên civakî û sinifî dihat, nikaribûn li hember têkiliyên feodal û kevn şer bikin. Gelemperî di çalakiyên rewşenbîrên wê serdemê de planeke sosyo-ekonomîk û polîtîkayeke diyar û eşkere tune bû. Kelacanên wan ên derbarê perwerdehiyê de, gelek caran ji temenniyan wirdetir nediçû."

2.4. Kürt Tealî Cemiyetî (Komeleya Pêşketina Kurdistanê)

Şerê Cihanê yê Yekem di dîskûr û naveroka xebatên rewşenbîrî yên Kurda de veguherînên mezin pêk anî. Hat dîtin ku Împaratoriya ku di şer de têkçûyî, berev belavbûnê diçe. Serdema meşrûtiyetê de cemiyetan weke klûbên ramanî û çandî xebatên xwe didomandin, beyî plansaziyeke polîtîk bo geşedana Kurdan dixebitîn. Lêbelê sazî û teşkilatên ku di mutarekeyê de li Stenbolê hatibûn avakirin xwedî armancên polîtîk bûn, berî her tiştî li ser statuya Kurdan radiwestiyan. Bêstatubûn, bi awayekî modern, bi xebatên van saziyan weke problematîk derkete holê.

Di vê serdemê de, li Stenbolê xebatên kulturî yên beriya şer veguhestiye xebatên polîtîk, Di vê pêvajoyê de komeleya herî balê dikşîne Kürt Tealî Cemiyetî (Komeleya Pêşketina Kurdistanê) ye. Komele, 1918an de li Stenbolê ava bû. Li çend bajarên Kurdistanê şaxên Komeleyê hebû. Seroktiya Komeleyê Seyîd Ebdulqadir dikir(Tunaya,1988a: 186). Di nava avakarên Komeleyê de Emîn Elî Bedirxan, Mewlanzade Rifat, Şükrü Baban, Dr Şükrü Sekban jî hebûn. Komele, piştre ji ber cudahiyên fikrî bû du parçe. Kesên ku ji bo Kurdistanê serxwebûn

dixwestin Kürt Teşkilat-ı İçtimaiyye Cemiyeti (Komeleya Teşkîlatê Îçtîmaiyye ya Kurd) ava kirin. Emîn Elî Bedirxan, pêşengiya vê komeleyê dikir (Özoğlu, 2012: 124). Ji bilî wî Mewlanzade Rifat, Şukrî Baban, Dr. Şukrî Mehmed, Memdûh Selîm, Dr Ebdullah Cewdet jî hebûn. Jîn, weşana sereke ya vê serdemê ye. Kovar weke weşana ne-resmî ya Komeleya Pêşxistina Kurdistanê ye. Kovar di 1918an de dest bi weşana xwe dike û 25 hejmaran derdixe. Berpirsyarê kovarê Hemzeyê Muksî bû (Malmisanî û Lewendî, 1986: 65).

Armanca weşana kovarê di hejmara yekem de wiha tê îfadekirin: "Jîn, ne bi destxistina lişteka(menfeet) maddî derdikeve. Armanca wê belavkirina zanînê ye li ser jiyana Kurd a dîrokî ku heqên wî yên neteweyî bêjeya wî û rewşa wî ya civakî, ku ji sedsalan vir de hatine ihmalkirin" (Malmisanîj û Lewendî, 1986: 65). Di vê îqtîbasê de puxteya girîng ew e ku yekem car têgeha "heqên neteweyî" di weşaneke Kurdî de cî digre. Di kovarên bere yên Kurdî de jî qala perwerde û pêşxistina civaka Kurdî hatiye kirin, lê 'Jîn' van kovaran bi têgeha "heqên neteweyî" di zemîneke hiqukî de bicî dike. "Heqên neteweyî" weke têgehek, aîdî diskûrsa neteweperweriya modern e, veguherîna naveroka kurdewariya rewşenbîran destnîşan dike. Di vê serdemê de, dîsa bi navê Kurdistan kovarek derdikeve. Sernivîskarê wê, Arwasîzade Muhemmed Şefîq, xwediyê îmtiyaz û berpirsyarê wê Mehmed Mîhrî ye (Malmîsanij û Lewendî, 1989: 76). Dîsa di heman serdemê de rojnameya Serbestî ji aliyê Mewlanzade Rifat ve dihat derxistin, ku ew di heman demê de endamê Komeleya Pêşxistan a Kurdistanê bû. Rojnameya rojane, derbarê pirsgirêkên Kurdan û civînên Kürt Tealî Cemiyetî (Komeleya Pêşketina Kurdistanê) de agahiyan dide. Rojname, di heman demê de, li dijî zîhniyeta Îttihat û Terakkiyê muxalefet dikir. Ji ber polîtkaya xwe ya weşanê Mewlanzade Rifat gelek caran dihat tehdîtkirin. Heta, ji ber sekna wî, erîşî mala wî û çapxaneya rojnameyê jî kiribûn (Veroj, 2017: 50-51).

2.5. Rewşenbîriya Kurdên Sovyetê

Avabûna komara Tirkiyeyê çalaki û xebatên rewşenbîriya Kurdî bi tamamî da rawestandin. Qismek rewşenbîr berê xwe dan Bakûrê Sûriyeyê qismek jî Îraqê, di bin desthilatdariya dewletên Îngîlîz û Fransiz xebatên xwe berdewam kirin. Rewşenbîrên Kurd ên parçeyên cûda bi awayekî têkiliyên xwe berdewamkirin. Piştî şoreşa Cotmehê ya 1917an bi avabûna Sovyetê

di warê çanda Kurdî de bizavek nû peyda bû: Rewşenbîriya Kurdî a Sovyetê[5] . Bi taybetî Kurdên li Ermenîstanê bi xebat û çalakiyên xwe yên çandî li ser rewşenbîriya Kurdî tesîreke mezin kirin.

Xebatên çandî li Sovyetê 1921an destpêkirin "hukumeta komunist/bolşêvîk ya nû guhdariyeke pirr mezin datîne ser karê pêşvaxistina gelên kêmjimar û paşdamayi; perwer dekirin, xwendin, kultûr û çanda wan" (Boyîk, 2019: 16). Ji ber wê yekê di warê berhemdariyê de jî geşedaneke mezin tê dîtin. Ligel perwerdehiya Kurdî ya li dibistana, yekem alfabeya latînî 1929an de hate amadekirin. Sala 1930an tenê li derdora Elegezê 37 dibistanên Kurdî hebûn. Sala 1931an de li Erîvanê dibistana bilind a mamosteyan hate vekirin (Lazarev û Mıhoyan, 2013: 259-260).

Rewşenbîrên Kurd ên li Ermenîstanê- Sovyetê- di warê berhemdariyê de jî bal dikşandin, salên 20 û 30 li Ermenîstanê gelek nivîskar û helbestvanên Kurd derketibûn, 1922 an de di zimanê Kurdî de 32 heb pirtûk çap bibûn ev jimar sal bi sal zêdeti dibû ku 1937an de gihiştibû 70ê. (Lazarev û Mıhoyan, 2013: 260) Ev jimar ji bo komunîteyek biçûk hilberîneke mezin bû. Rojnameya herî kevn ku hîn diweşe Riya Teze liv ê dere sala 1930an de li Erîvanê dest bi weşanê kir. "Armanca rojnamê ya sereke ji bo çêkirina qeydê nû (sosyalizmê) organizekrina wê para xelkên Kurd bû û di nav Kurdan da propagandakirina siyasi ya wî welatî." (Boyîk, 2019: 54). Xwedan mebestek îdeolojîk be jî Riya Teze û weşanên din ên Kurdî ligel rewşenbîrên parçeyên din jî kelecanek mezin afirandibû, di hejmara 8an a Hawarê de derbarê riya tezê wiha tê nivîsîn.

> "Rujnameqe qurdmanci, bi herfên nû bi qurdmanciyeqe xwerû, li Rewanê, di siqleqî spehi û çeleng de derdiqeve. Vê paşiye çend hejmarên wê gehiştine destê me. Çavên me pê biruhn bûn, dile me şa o geş bû. Qurdmancên Rewanê ji rûjnamê pêve çend qitêb jî derêxistine. Me sê çar rûj mijûlahiya xwe bi wan qirin. Ji nav rupelên wan ên taze û ter bihna qulilqên çiyayê Elegozê, bayê zozanén Sermehan dihatin. Di nav resmên wan de şal û şapiqe qurdmancî, xencer û piştxencera qal û qaliqên me dihatin dîtin. « Rêya Teze » weq navê xwe taze ye nû ye, nûbar e. Lê ji Hawarê qevntir, bi emr jê mezinter e. Hejmara wê a paşin qo gehiştiye destê me a pencî û nehan e. Li gora go Rêya-Teze rûjnameqe dehrûjqî ye, beri salgê û hin dest bi derqetinê qiriye" (Hawar, 2012: 108)

Ji nivîsa li Hawarê jî tê famkirin ji bilî rojnameyê çend berhemên din jî gihiştiye ber destê rewşenbîrên binxetê ku li ser dixebitin. Herçend sînordar be jî di navbera entelîjansiyayên du

[5] Derheqê rewşenbîrên Sovyetê ji bo agahiyên berfirehtir bnr: Boyîk, E. (2019). *Çanda Kurdên Sovyetê* (Çapa
Yekem). Diyarbakır: Peywend

aliyan de – Binxet û Sovyet- danûstandinek entelektuel heye. Rewşenbîrên Kurdên Sovyetê xwedan derfetên mezin bûn bereksê nivîskarên li Binxetê. Wisa ku di sala 1932an de "li rex Yekîtiya Nivîskarên Ermenistanê beşa nivîskarên Kurd hate damezirandin" (Boyîk, 2019: 18). Sala 1935 an de yekem romana Kurdî "Şivanê Kurmanca" ya Ereb Şemo hate weşandin. Roman bandoreke mezin derxist di rewşenbîriya Kurdî de. Ji berhema Eskerê Boyîk (2019: 130) em fam dikin ku bi vê berhemê Ereb Şemo di nava rewşenbîrên Kurd bi nav û deng dibe. Rewşenbîriya Sovyetê tenê ne Ereb Şemo bi dehan nivîskar û helbestkarên navdar derxistin ji nav xwe ku di edebiyata modern de weke Ekola Sovyetê tên zanîn. Derbarê folklor û zimannasî de lêkolînên akademîk weşandin. Rewşenbîrên serdemê bi berhemên xwe yên serkeftî di lîteratura çanda Kurdî de danehevek mezin afirandin.

2.6. Ekola Binxetê

Piştî peymana Lozanê, parçebûna Kurdistanê teqez bû, cemaeta rewşenbîrî ya ku li Osmanî peyda bûbû, di nav sê dewletan de belav bû. Xebatên li Stenbolê û Tirkiyeyê bi temamî sekînî. Projeya rejîma Kemalîst, avakirina netewe-dewletek bû, li ser erdê ku ji dewleta Osmanî mayî. Hemû pêkhateyên Osmanî di bin nasnameya Tirkitiyê de hatin qebûlkirin û polîtîkayeke asîmîleker hate meşandin. Hemû dezgehên Kurdî hatin girtin û zimanê Kurdî hate qedexekirin. Mafên neteweyî û çandî yên Kurdan bi temamî ji destên wan hatin standin. Bi heman awayî li Îranê jî li dijî Kurdan polîtîkayên bi vî rengî hatin meşandin. Ev polîtîkayên ku hewl dida nasnameya Kurdî di nav nasnameya serdest de bihelîne, bû sedema geşedana neteweperweriya Kurdî, hem li Îran hem jî li Tirkiyeyê. Di heman demê de zextên van dewletan dibûn motîvasyona xebatên rewşenbîrî ya Kurdan. Dîroknûsê Kurd Mehmet Emîn Zekî Beg (2011: 23) sedema nivîsandina dîroka Kurdî, di destpêka pirtûka xwe de wiha îfade dike: "Ji dema ku li Tirkiyê têgeha 'Osmanî' bi temamî ji holê hat rakirin û di cihê wê de têgehên 'Tirk' û 'Tûran' hat anîn, bi awayekî xwezayî, ez jî weke hemwelatiyên Osmanî yên nekurd gihêştim bîreweriyeke neteweyî ku ji Tirkbûnê cuda bû. Ev bîrewerî ez araste kirim ku neteweperweriyeke hestyar û hîssî û wesfên neteweyî derxim pêş."

Geşedana neteweperweriya Kurdî ji dînamîkên navxweyî bêtir bi yên derveyî re têkilhev e. Li gor Vali (2013: 43) nasnameya neteweyî ya kurdan diyardeyeke modern e û ji têkiliyên bi nasnameyên Ereb, Tirk û Fars zaye. Nasnameyên neteweyî yên Tirk, Ereb û Farsan di pêvajoyeke dirêj de ava bûbûn. Vali, destpêka nasnameya neteweyî ya Kurdan di vê tekiliyê de dibîne. Vali, bi awayekî modernîst li ser netewe û neteweperweriyê radiweste. Li gor wî, netewe

weke têgehek û diyardeyeke modern; tê çêkirin û avakirin. Nasname li derve ne xwediyê hebûneke serbixwe ye. Bi vî awayî nasnameya neteweyî bi mudaxaleyên entelektuel tên avakirin. Di heman gotara xwe de Vali amaje dike ku têgehên neteweya Kurd û nasnameya neteweyî ya Kurd reaksiyonên li hember dîskûrsên neteweyî yên dewleta Tirkiyê, Îran û Iraqê ne (Vali, 2013: 44).

Kurdên Bakurê Kurdistanê li hember polîtîkayên Dewleta Tirkiyeyê, ji 1922an heta 1938an serhildanên neteweyî pêk anîn. Rewşenbîr bi gelemperî ji Tirkiyê derbasî dewletên din bûn. Ên ku li Stenbol an jî li Tirkiyeyê man ji xebatên kurdewarî vekişiyan, an jî deng ji wan biliya. Weke mînak Ebdurehman Bedirxan ku rojnameya Kurdistanê diweşand piştî avabûna komara Tirkiyeyê, heta mirina xwe li Stenbolê ma, di vê serdemê de bi temamî ji xebatên kurdewarî dûr ket. Şikrî Baban li Zankoya Stenbolê weke akademîsyen heta dawiya emre xwe li Stenbolê ma. Seîdê Nûrsî berê xwe da xebatên îslamî û tefsîra xwe ya bi navê Rîsaleî Nûr weşand, bi vê xebatê Seîdê Nûrsî bingeha Tevgera Nûrparêzan ava kir, vê tevgerê li ser fikriyata îslamparêzên Tirkiyeyê bandoreke mezin kir.

Rewşenbîrên ku ji Tirkiyeyê derketin li Sûriye û li Iraqê xebatên xwe domandin. Iraqa ku di bin kontrola Îngîlîzan debû, cihê herî azad bû bo rewşenbîrên Kurd. Rêveberiya Brîtanyayê li hember mafên çandî yên kurdan astengî dernexist, perwerdeya bi zimanê zikmakî li vê derê berdewam kir. Hem li bajarên Kurdan hem jî li Bexdayê xebatên Rewşenbîrî yên kurdan bê rawestan berdewam kir. Di heman demê de rewşenbîrên Kurd ên ku berê xwe dabûn Sûrî, li vê derê xebatên polîtîk û rewşenbîrî jî xurt kirin. Bi taybetî piştî Serhildana 1925an gelek rewşenbîr derbasî binxetê bûn. Rewşenbîrên Kurd ên ku berê xwe dabûn Rojavayê Kurdistanê di 1927an de Xoybûn avakirin, Celadet Elî Bedirxan serokatiya vê rêxistinê dikir (Jwadieh, 2012: 410). Rêveberên pêşeng ên rêxistinên ku li Stebolê hatibûn avakirin, rêxistinên xwe fesh kirin û tevlî Xoybûnê bûn. Bi vî avayî têkoşîna Kurd di bin banê tevegerekî de organîze bû (Chirguh, 2009: 44). Weke rexîstineke polîtîk bo serxwebûna Kurdistanê dixebitî, alîkarî dan serhildanên Kurdî, bi taybetî di serhildana Agirî de rêxistina Xoybûnê roleke girîng leyist.

Piştî ku Serhildana Agirî jî têk çû îcar Xoybûn pasîfîze bû, rewşenbîrên endamê vê rexistinê berê xwe dan xebatên rewşenbîrî. Xebatên ku li vê derê hatin meşandin, bo zaravayê Kurmancî, lîteratureke mezin ava kir ku îro weke ekola Hawarê jî tê zanîn. Kovarên ku li vê derê weşiyan bo gelek nivîskar û helbestvanên Kurd bû dibistanek.

Celadet Elî Bedirxan û birayê xwe Kamiran li Sûrî û Libnanê bi rêya weşandina kovar û pirtûkên Kurdî li ser geşedana rewşenbiriya Kurdî bandoreke mezin kirin. Bi taybetî xebatên Celadet ên di warê ziman de, di geşedana zimanê Kurdî-bi taybetî kurmancî- de xwedî roleke girîng e. Celadet alfabeya latînî, bo zimanê kurdî, saz kir û ev alfabe yekem car di kovara Hawarê de bikar anî. Hawar û Ronahî ne tenê kovarek bûn, di heman demê de bûn dibistanek bo rewşenbîriya Kurdî, gelek nivîskar û helbestvanan yekem berhemên xwe di van kovaran de weşandin.

Ji ber vê yeke kovara Hawarê ji kovareke edebî wêdetir, amraza parvekirina fîkriyata rewşenbîrên binxetê bû. Di hejmara pêşîn a Hawarê de armanca kovarê wiha tê îfade kirin: "Hawar dengê zanînê ye. Zanîn xwe nasîn e, xwe nasîn ji me re rêya felat û xweşiyê vedike. Her kesê ko xwe nas dike; dikare xwe bide naskirin. Hawara me berî her tiştî heyîna zmanê me dê bide nas kirin. Lewma ko zman şerta heyîna a pêşîn e."(Hawar, 2012: 10)

Di berdawama nivîsêde amaje pê dike ku Hawar ji siyasetê dûr e, ew tene di warê zanîn û hunerê de dixebite(Hawar, 2012: 10). Lê dikare bête gotin Hawar ji hejmara pêşîn wir de bûbû dengê Kurdeyatiyê û xwedî helwesteke polîtîk bû. Zimanê Kurdî piştî pratîkên asîmîlasyonê û qedexeyên Tirkiyeyê bûbû xwedî naverokeke polîtîk.

Nivîsên di Hawarê de dîskûra neteweperweriya Kurdî li ser dijberiya nasnameya Tirkî ava dike, beyî ku nasnameyên serdest ên din lê zêde bike, tenya nasnameya Tirkî, tê hedefgirtin. Li gor Ergün (2015: 408) Kurdan, sê dewletên din na, tenê Tirk weke kolonyalîstên welat bijartin, ev yek girêdayî du serhildanên mezin -1925,1930- ên Kurdan bû. Ji ber ku bi awayekî-rasterast, neraserat- nivîskar û helbastvanên kovarê bi van serhildanan re têkildar bûn. Di nivîsên Celadet Elî yên di Hawarê de jî Tirk xwediyê vê îmaja negatîf in.

Di pêvajoya piştî serhildanan de, endîşeya eslî ya Celadet Elî Bedirxan û rewşenbîrên din qanûna sirgûnê ya 1932an e. Celadet Elî Bedirxan hem di nameya xwe ya bo Mistefa Kemal de behsa vê yekê dike, hem jî taybetî li ser vê qanûnê nivîsarek Frensî dinivîse. Qanûn dixwaze Kurdan di nava Tirkan de bihelîne û Tirkên ji derve tên li Kurdistanê bicih bike. Ev hemle di esasê xwe de ne projeya tunekirina nasnameya Kurdî bû, her çend bi temamî pêk nehatibe jî di wê serdemê de, di nav rewşenbîrên Kurdan de endîşeyek mezin derxistibû holê. Celadet weke neteweperwerekî modern dizanibû ku neteweya Kurd terîtoriya xwe ya civakî winda bike ango hegemonyaya wê ya nifûsî li makewelat têk biçe, beyî desthilatdariyek siyasî nikare hebûna xwe bidomîne. Endîşeya Celadet endîşeyeke ontolojîk e. Di dawiya berhema "De La Question Kurde"(1997: 38) de daxwaza pêşengên Kurdan-rewşenbîr û siyasetmedar- wiha xulase dike:

“Eger em armanca pêşengên Kurdan bêjîn, ev armanc gelek asan û dilnizm e. Ji bo milletê xwe têmîna hebûneke neteweyî ye ku wan ji hemû êrîşan diparêze.

BEŞA SÊYEM: TEXEYYULA NASNAMEYA NETEWEYÎ DI OTOBIYOGRAFIYÊN REWŞENBÎRÊN KURD DE

3.1. Otobiyografî

Otobiyografî berhemên nivîskî ne ku mirov pê jiyana xwe qal dikin, nivîskarên otobiyografiyê aliyên jiyana xwe ya nayê zanîn pêşkeşî civatê dikin. Gelemperî ji aliyê kesên di civakê de naskirî ve tên nivîsandin. Bi van berheman otobiyagrafînûs jiyanên xwe, bîranînên xwe, vediguherînîn datayek entelektuel, ku ji aliyê lêkolîneran ve sûd jê tê wergirtin. Li gor Aksoy (2018: 13) kesê/a ku jiyana xwe dinivisîne jiyana xwe veguherandiye metnê û motîvasyonên cûda yên nivîsîna otobiyografiyê her çi be jî meseleya ezahiyê heye li meydanê. Mirov jiyana xwe hêjayî pêşkêşkirina civakê dibîne. Bo wî/wê tecrûbeyên wê/wî hêjayî xwendinê ne.

Geşedan û berbelavbûna berhemên otobiyografîk bi veguherînên ramanî yê li Ewrûpayê re aleqedar e. Li Rojavayê otobiyografî weke cûreyeke edebî bi zaytîna takekes re têkildar e (Aksoy, 2018: 16). Di edebiyata Kurdî de jî otobiyografî piştî zayîna edebiyata modern destpê kir. Nivîsîna otobiyografiyan gelemperî ji aliyê zilamên bibandor ve hatiye nivîsandin nivîskarên mêr ên ku otobiyografiyan dinivîsandin xwe weke nûnerê serdemê jî didîtin ji ber wê yekê nivîsîna otobiyografiyê weke wezîfeyeke civakî bû bo zilaman (Aksoy, 2018: 40). Ew xwe weke aktorên dîrokî dizanîn. Lêkolînên derbarê otobiyografiyan jî gelemperî li ser mirov girîng ên dîrokê bi taybetî leşker, siyasetmedar, nivîskar û hunermendên zilam radiweste. Heta xebatên wan weke belgeyên dîrokî tên dîtin. Otobiyografiyên nivîskarên Kurd jî di vê çarçoveyê de tê nirxandin û berhemên wan weke yek ji çavkaniyên dîroka nêzîk tên nirxandin. Otobiyografiyên nivîskarên Kurd gelek caran bi daxwaza kesên din hatine nivîsandin. Şahidiyên, bîranînên nivîskar weke wesîqeyên dîrokî û polîtîk hatine dîtin.

Otobiyografî bîranînên nîvîskar pêk tên ku hilberînên hafizayên wan e, çendî rast çendî xelet bi temamî nikare were zanîn. Belam bûyer ji aliyê nivîskar ve tên bijartin û bîranîn hilberînên hafızaya wan e ji mudaxaleya nivîskar re vekirî ne. Ev mudaxale hin rasterast hin caran jî bi awayekî derhişî pêk tê. Weke ku Sarlo (2012: 11) jî destnîşan dike “dîmenên raboriyê avakirî ne”. Bîranînên otobiyografîk ne bûyerên eynelêgirtî ne, ji îdeolojî, zayend, erdnîgarî û pozisyona sinifî û civakî nikare were cihêkirin. Nivîskarên otobiyografiyan di berhemên xwe de, takekesek jî ava dikin bîranîn û bûyerên bijartî parçeyên wê avakirina nasnameyî ne. Îmajek

ji aliyê nivîskar tê xêzkirin, kesê di otobiyografiyê de tesewwira nîvîskar ya di derbarê xwe de ye.

Bîranînên nivîskarê otobiyografiyê tenya bi wê/wî re ne têkildar e. Li gor Halbwachs (2016: 16-17; 2017: 46) mirov di nav civakê de digihêje bîranînên xwe, em bîranînên xwe di nav civakê de bibîrtînin û di nav civakê de bi cih dikin. Teza sereke Halbwachs ew e ku hafiza ne diyardeyeke takekesî ye ew civakî ye û hewceyê hafizayên din e. Eger ez tiştekî bibîr bînim sedema vê yekê geleke caran ev in; kesên din teşvik dikin ku wê tiştê bibîrbînim, hafizayên wan tên alikariya min û hafizaya min xwe bi hafizaya wan radigre. Ji ber vê yekê bûyer û bîranînên ku nivîskar bibîrtîne û dinivîsîne hafızaya kolektîf a civakê re têkildar e. Bi gotineke din li ser otobiyografiyan bandoreke eşkere ya rewşên civakî hene.

3.1.1. Otobiyografiyên Rewşenbîrên Kurd

Nivîsîna otobiyografiyan an jî bîranînan di wêjeya modern a Kurdî de, demek dereng di destpêkên sedsala 20emîn de destpê kirin. Otobiyografî û bîranînên hatine nivîsandin gelemperî xwedan qerekterekî civakî û dîrokî ne û ji aliyê dorhêleke sînorkirî, gelemperî jî ji aliyê rewşenbîran ve hatine nivîsandin. Ji nifşa pêşîn rewşenbîriya modern a Kurdî ku bi weşana rojnameya Kurdistan derketin qada civakî kêm kes hene ku bîranînên xwe nivîsînî ne, yên ku nivîsîne jî piştî demek dirêj van berheman çapkirin. Hin ji wan ji aliyê bûyer û heyemê demeke kurt dihundirînin, hin ji wan ne bi armanca çapkirinê hatine nivîsandin.

Nivîsîna otobiyografî û bîranînan li sedsala 20emîn destpêkir. Gelekê wan bi ne bi zimanê Kurdî hatine nivîsandin. Em dikarin bêjin *Otobiyografiya Ebdurezaq Bedirxan*weke yekem otobiyografiya modern a rewşenbîrekî Kurd e. Lê balkêş e ev berhem ne ji bo weşandinê, ji bo civakê bi armancekî polîtîk ji bo balyozxaneya Rûsî hatiye nivîsandin. Otobiyografî ji dokumentan pêk tê di arşîva Rûsî de ji aliyê Celîlê Celîl hatiye peydakirin. Her du dokument di salên navbera 1910-1916an hatine nivîsandin. Dokumenta yekem "Ji bona ku destûra dewleta Rûsan bistîne, ewî kurteçîroka jiyana xwe nivîsî û da destê balyozê Rûsyayê li Stenbolê. Eslê vê nivîsarê, wekî ji rûyê dokumentê yê pêşin tê agahdarkirin, bi zimanê tirkî bû." (Celil, 2019: 11). Dokumenta duyem li ser kurtejiyana Ebdurezaq Bedirxan e li gor Celil (2019: 12) zimanê wê jî Frensî ye. Metnê ku ji aliyê Ebdurezaq Bedirxan raporên polîtîk, diplomatik in û ji nivîsîna jiyanê wirdetir, belgeyên xwe û civakê nasandin e. Motîvasyona nivîsîna dokumentan tenya berjewendiyên civakî ne.

Rojnivîskên Celadet Elî Bedirxan dîsa berhemeke serdema pêşîn metnên derbarê jiyana nivîskar de ye. Herçend rojnivîsk ne parçeyeke bîranînan be jî xwedan wesfên otobiyografîk in. Rojnivîska rojên li yên li Elmanya ya Celadet Alî Bedirxan ne ji aliyê wî piştî mirina wî gelek şûnde ji aliyê Malmisanij (1997) ve hate amadekirin û bi navê *Günlük Notlar (1922-1925)* 1995an hat çapkirin berhem notên di navbera salên di navbera 1922-1925an dihundirîne. Di her du mînakan de jî tê dîtin ku otobiyografî an jî rojnivîskên hatine nivîsandin ne bi armanca çapkirin an jî weşanê hatine nivîsandin.

Yekem mînakên serkeftî yên otobiyografî bîranînan ji aliyê ekola rewşenbîrên Binxetê hat dayîn *Muhtasar Hayatım* ya Ekrem Cemilpaşa, *Doza Kurdistan* a Kadri Cemilpaşa *Hatıratım* ya Nûrî Dersîmî, *Ma vie de Kurde*[6] ya Nureddin Zaza, *Jînenîgeriya Min*[7] ya Cegerxwîn û *Bîranînên Min*[8] yê Osman Sebrî weke mînakên serkeftî yê berhemên otobiyografiyek dikarin werin nirxandin. Rewşenbîrên Binxetê ji ber çalakî û xebatên xwe yên li Bakur û ji ber şert û mercên siyasî berê xwe da bûn Sûriyeya ku koloniya Fransizan bû.

3.1.2. Otobiyografiyên Xebatê: Muhtasar Hayatım (Ekrem Cemîlpaşa), Doza Kurdistan (Kadrî Cemîlpaşa), Hatıratım (Nûrî Dersîmî)

Di vê lêkolînê de otobiyografiyên sê rewşenbîran hat analîzkirin: Ekrem Cemîlpaşa, Kadrî Cemîlpaşa û Nûrî Dersîmî. Her sê rewşenbîr hem ji aliyê heyem hem jî ji aliyê xebatên entelektuel xwedan gelek taybetmendiyên hevpar in. Her sê entelektuel jî di nifşa pêşîn a Rewşenbîrên modern de cî digrin. Di komeleyên ku piştî şoreşa 1908an li Stenbolê ava bibûn cî girtin û çalakiyên van komeleyan weke aktîvîst xebitîn. Ew hem şahidiya dawiyên dewleta Osmanî hem jî veguherînên siyasî yên li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê kirin. Di nêzî heman deman de ji welatên xwe dûr ketin û xebatên xwe li sirgunê berdewamkirin. Di avabûna tevgera modern a kurdî de rola her sê rewşenbîran, sedema sereke yê bijartina wan e.

Her sê rewşenbîr jî otobiyografiyên xwe bi zimanê Tirkî nivîsandin, di wê serdemê xebatên polîtîk ên ku mafê Kurdan diparêzin an jî bîranînên bi vî rengî ku balê dixwaze ser tekoşîna Kurdî bikşîne bi zimanên der-Kurdî hatine nivîsandin. Bo nimûne du berhemên Celadet Alî Bedirxan ên vê serdemê *De La Question Kurde*[9] bi Fransî û Bi *Kürt Aydınından Mustafa*

[6] Bnr: Zaza, N (2017). *Wekî Kurdekî Jiyana Min. (*Çapa Yekem) (Adil Qazî, Wer.) Diyarbakır: J&J
[7] Bnr: Cegerxwîn (2003). *Hayat Hikâyem*. (Çapa Yekem) (Gazi Fincan Wer.) İstanbul: Evrensel
[8] Bnr: Sebrî, O. (2016). *Bîranînên Min.* (Çapa Yekem) Diyarbakır: Lîs
[9] Bnr: Bedirxan, C. A. (1997a). *Kürt Sorunu Üzerine*. (Çapa Yekem)(Taylan Doğan Wer.) İstanbul: Avesta

Kemal'e Mektûb[10] bi Tirkî, berhema derbarê pirsgirêka Kurd ya ji aliyê Xoybûnê hatiye çapkirin *La Question KurdeSes Origines Ses Causes*[11] ya Dr Bletch Chirguh bi zimanê Fransî hatiye çapkirin. Berhemên siyasî û propagandîf ên bi vî rengî bi armanca avakirina rayek giştî li Ewrûpa an jî li Tirkiyeyî, bi zimanên wan dihatin nivîsandin. Kurdî xwedan qadeke teng bû nivîskarên weke Celadet Alî Bedirxan jî ku xizmetên xwe yên Kurdiya modern tê zanîn, ji ber vê yekê zimanên din bikaranîn. Her sê rewşenbîr jî dikare were gotin bi heman endîşeyê bîranînên xwe bi zimanê tirkî nivîsandin, nivîsîna otobiyografî bo wan bes ne îtîraf an jî afîşekirina bûyeran bû di heman demê de bîranînên xwe weke parçeyeke veguhestina rastiyên dîrokî didîtin.

Ekrem Cemîlpaşa otobiyografiya xwe bêtir li derdora çalaki û xebatên xwe bisînor kiriye lêbelê Kadrî Cemîlpaşa û Nûrî Dersîmî muhtevayek îdeolojîk û civakî ku li otobiyografiyan barkirine ku ev di serenavên berheman de jî xwe destnîşan dike. Serenavê berhema Ekrem Cemîlpaşa *Muhtasar Hayatım* ango *"*Bikurtasî Jiyana min" e lêbelê serenavê Kadrî Cemîlpaşa *Doza Kurdistan- Kurdistan Davası Kürt Milletinin 60 Seneden Beri Kurtuluş Savaşının Hatıratı* ango "Bîranîna Şerê Rizgarî ya Milletî Kurd yê 60 Salê Berdewame" ku nivîskar otobiyografiya xwe parçeyeke tekoşîn û berxwedana neteweyî dibîne. Berhema Kadrî Cemîlpaşa di heman demê berhemek sosyolojik û dîrokî ye bes ne şahidiyên xwe yên rasterast bûyerên din ên serdema xwe jî nirxandiye. Dîsa Berhema Nûrî Dersimî a *Dersim ve Kürt Mücadelesine Dair Hatıratım* ango "Bîranînên min ên derbarê Tekoşîna Dersîm û Kurdan" bi heman awayî tenê behsa jiyana xwe nake. Di heman demê de têkiliyên Ermenî û Kurdan, strûktura sosyolojik ya Dêrsim, mijarên otobiyografiyê ne.

3.2. Geşedana Nasnameyî ya Rewşenbîran di Otobiyografiyan de

Cûreya otobiyografiyê ji ber taybetmendiyên xwe îmkana analîzê ya geşedana nasnameyî dike. Di berhemên otobiyografîk de pêvajoya geşedanê ji aliyê nivîskar bi bîranînên bijartî tên pêşkêşkirin. Otobiyografî bersiva pirsa ez kî me? dide xwînerên xwe. Nivîskar xwe dide nasandin, rûdanên girîng ên di jiyana xwe de tesîr lê çêkiriye peşkeş dike. Ji aliyekî din nasnameya xwe dihonîne nivîskar. Geşedana nasnameyê bi awayekî lîneer pêk nayê, bi mudaxaleyên mirovên din, têkiliyên însanî teşe didin vê pêvajoyê.

[10] Bnr: Bedirxan, E.C. A. (2010). *Bir Kürt Aydınından Mustafa Kemal'e Mektûb*. (Çapa Yekem) İstanbul: Doz

[11] Bnr: Chirguh, B. (2009). *Kürt Sorunu Kökeni ve Nedenleri* (Çapa Yekem) (Nihat Nuyan, Wer.)

İstanbul: Avesta

Otobiyografiyen sê rewşenbîrên Kurd dikare were gotin pêşkêşiya – Ekrem Cemîlpaşa, Kadrî Cemîlpaşa, Nûrî Dersîmî- pêvajoya pêkhatina û geşedana nasnameya neteweyî. Di navenda otobiyografiyan de Kurdbûn û doza Kurdayetiyê heye. Jiyana takekesî dîsa girêdayî her du mefhûman cî digre otobiyografiyan de. Nivîskar dema xwe di serî de didin nasandin, behsa malbata xwe dikin lê li wê derê jî Kurdayetiyê îşaret dikin. Her sê rewşenbîr jî ji malbatên mezin û bitesîr tên. Kadrî û Ekrem Cemîlpaşa neviyên Cemîl Paşa ne ku ew yek ji eşrafê Diyarbekir yê girîng e. Nûrî Dersîmî jî kurê Mele Îbrahîm ê Milanî ye ku ev eşîret li herêma Dêrsimê tê zanîn. Ekrem Cemîlpaşa û Kadrî Cemîlpaşa di malbatê de qet behsa kurdbûnê neyêkirin jî didin zanîn ku malbat tu car nasnameya xwe înkar nekiriye, li bajarê - Amed- zimanê qesrê Tirkî be jî, li gund bi rêya stran û govendên kurdî hay ji nasnameya xwe hebûne. (Cemilpaşa: 2016: 25). Nûrî Dersîmî (1992: 19) bavê rasterast bi wesfên wî yên kurdewar teswîr dike di otobiyografî de serenavê beşa ku qala bavê xwe wiha ye: Bavê Min: Helbestvanê Gelê Kurd Mele Îbrahîm.

Jiyana takekesî ya nivîskaran di otobiyografiyan de di peywendiya Kurdeyatiyê de tê pêşkêşkirin. Ji ber vê yekê derbarê malbata xwe de – jin û zarok- agahiyek hêja nayê dîtin, her sê rewşenbîr jî qet behs jin û zarokên xwe nakin. Kadrî Cemîlpaşa her çend otobiyografî îthafî jina xwe kiribe jî di naverokê pêvajoya zewicînê qet nayê qalkirin, Nûrî Dersîmî û Ekrem Cemîlpaşa zêde behsa jiyana malbata xwe nekin jî, bi kurtasî qala zarokên xwe dikin. Nûrî Dersîmî di otobiyografiyê de bi çend hevokan tenê behsa mirina zarokên xwe dike, Ekrem Cemîlpaşa xemginiya xwe ya piştî mirina keça xwe ya mezin bi kurtasî qal dike. Malbat û zarok li ber bûyerên din weke tekoşîna nasnameyî û Kurdeyatiyê hûrgiliyên biçûk tên dîtin. Ji ber vê yêkê di otobiyografiyên rewşenbîrên Kurd de em têkîliyên malbatî, jiyana taybet nabînin. Bûyerek an jî kesek girêdayî Kurdewariyê be hêjayî nivîsîne hatine dîtin, ev yek bo malbatê jî wisa yê.

Di otobiyografiyên rewşenbîran de, çîroka tevgara Kurdî tê ravekirin. Jiyana wan ji ber ku parçeyeke vê tevgerê ye, tê pêşkêşkirin. Di esasê xwe berhemên wan ji otobiyografî bêtir bîranînên derbarê tevgera Kurdî ye. Otobiyografiyan de jiyanên bi temamî ji bo Kurdewariyê hatine wekfkirin tê dîtin. Di otobiyogarfiyên her sê rewşenbîrên Kurd de geşedana nasnameyê bi rêya avabûna hişmendiya polîtîk derketiye holê, di destpêkê de nasnameya neteweyî, tenê weke amrazek hevgirtina civakî di navbera kesan de tê xuyan lêbelê bi tesîra perwerdehiya modern ev hevgirtin huviyetek siyasî wergirtiye. Otobiyografî pêvajoya veguherîna wesfa nasnameyê der dike.

3.3. Kifşa Nasnamaye Neteweyî

Stenbol di destpêka sedsala bîstemîn, hem ji bo munevverên Osmanî hem jî bo tevgerên polîtîk yên civakî navend bû. Neteweperweriya modern a Kurdî li vê peytexta Osmanî birêxistin bû. Ji bajarên cûda yên Kurdistanê gelek rewşenbîr û xwendekar di komele û çalakiyan de digihiştin hev dû. Têkiliyên di navbera vê cemaetê, texeyyula Kurdbûnê ya ku bi herêman sînorkirî maye vediguherand. Li vê derê zimanê sereke yê parvekirinên entelektuel Osmanî be jî hişmendiya Kurdbûnê li gor kesên li gundên Kurdistanê dijîn zêdetir bû. Sînorên çandî ne sînorên teqez in û hin caran bi sînorên etnîk lihev nake. Eriksen ji Roosensê mînaka civaka Flaman dide, li gor Roosens Flamanên ku li Brukselê mecbûrî bi fransizî diaxivin muhtemel e li gor Flamanên li Rojavayê Flanrayê îzole dijîn bêhtir xwedan hişmendiya neteweyî- flamanî bin (veguhêzer Eriksen, 2004: 58). Sedema vê yekê bes bi perwerdehî û bi karên geş ên entelektuelî nikare were ravekirin. Hêmanê herî bitesîr ew e ku bo neteweperweriya Kurdî Stenbol qada rasthatînê bû, *yên din* weke dijber li vê derê hat dîtin . Li Kurdistanê Kurdbûn fenomeneke ji rêzê û sirûştî bû ango ne meseleyek bû, cihêbûn ji ber nebûna komek yên din ên girseyî nedihat hîskirin.

Li Kurdistanê ango li makewelatê bo Kurdbûnê tehdît ji sedsala 19emîn wir ve Ermenî bûn, heta piştî şerê cîhana yekem jî ev tehdît berdewam bû, Kurd Ermeniyan bo hebûna xwe tehdîdek ontolojîk didîtin ji ber ku heman qada terîtoryal parvedikirin, Kurd Ermeniyan weke dijber û "yên din" ê nasnameya xwe dihonandin. Endîşeya mezin ew bû ku Kurdistan dê bibe Ermenîstan. Dewleta Osmanî ji ber baweriya hevpar bi awayekî xwezayî hevkarê Kurdan dihat dîtin, bo Kurdan nemaze bo yên li Bakûrê Kurdistanê Ermenî dij-kom bûn. Lêbelê tecrubeyên li Stenbolê bo rewşenbîr û xwendekarên Kurd ramanên nû derbarê nasnameya Osmanî avakir. Kurdbûnek ji Osmanîbûnê û Misilmanbûnê cihê li Stenbolê peyda bû. Sedema vê yekê di serî de bilindbûna tevgerên neteweyî yên civakên din bû. Ji tevgerên civakê ne misilman bêtir jî tevgerên neteweyî yên Ereb, Ernawîd û Tirkan kir ku hestên neteweyî li gel Kurdan peyda bibe. Neteweperweriya Tirkî li gel munevverên Tirkî roj bi roj hêz digirt, reformxwaz ên neteweperwer vediguherîn hêzeke şoreşger.

Şoreşa 1908an di veguherîna ramanî ya Rewşenbîrên Kurd xwedan tesîreke mezin e. Di wê serdemê de her sê rewşenbîr jî li Stenbolê dixwendin. Ekrem Cemîlpaşa bandora Şoreşa 1908an wiha rave dike.

> "Di destpêka xwendinê ya sala 1908an de, hemû dibistanên Stenbolê, helbet Numune-i Terakki jî di nav de, di nava tevlîheviyekî de bûn. Ji dersan zêdetir refrên "Bijî azadî, edalet, wekhevî!"

dihatin bihistîn. Li hin dibistanan jî polîsan mudaxele kir. Çend meh şûn de ev rewş sekan bû. Lê hîşê me, hişê zarokên Kurdan aram nebûbû. Ev refrentên "Bijî azadî, edalet, wekhevî!" em şiyar kirin, lê em têr nekirin." (Cemilpaşa, 2016: 27)

Di berdewamê de reaksiyona xwendekarên Kurd li hember atmosfera polîtîk û encamên wê yên ramanî wiha tê îfadekirin:

"Ji xwendekarên dibistanê ji heştsedî zêdetirê wan tirk bûn. Ji bilî van; xwendekarên Kurd, Çerkez, Arnawut, Laz, Boşnak, Yewnanî, Ermenî û hwd. hebûn. Xwendekarên tirk serdestiyê li wana dikir an jî dixwestin bikin. Hejmara xwendekarên kurd yên dibistanê gihîştibû panzdeh kesan. Roj bi roj dilsarî û nexweşiya di navbera kurd-tirkan de zêdetir dibû. Şevekî di navbera van her du komên dijber de şerekî dijwar derket. Bi mudaxeleya komîteya rêveberiyê dawî li şer anîn. Xwendekarên kurd birîndar nebûbûn lê serê 5 xwendekarên tirk şikestibû, ji ber vê yekê xeber çû guhê rêveberiyê. Kurdbûna min û apê min ku çar sal ji min mezintir e û Kadîr Begê ku heşt meh ji min mezintir e, di sala 1908an de destpêkir, berî 65 sala ku min bîranîna xwe nivîsandibû" (Cemilpaşa, 2016: 27-28).

Kadrî Cemîlpaşa bi heman awayî bandora bûyerên girseyî yên bi Şoreşa 1908an destpêkirî di otobiyorafiya xwe de wiha tîne ziman.

"Ji ber ku ev anarşî bandora xwe li dibistanan nîşan da, di nav xwendekaran de jî bû sedema gendelî û civatan, bi taybetî hevgirtinên herêmî. Wek mînak, zarokên Rûmeliyan, xwendekarên wîlayetê Îşkodra, Yanya, Manastir yên ku wê demê ji welatên Osmanî bûn, bi albaniyên xwe re; xwendekarên Heleb, Bexda û Şamê bi Erebbûna xwe serbilind bûn û dixwestin xwe di rewşeke îmtiyaz de nîşan bidin. Li hemberî vê rewşê me girseya xwe bi hişmendiya kurdayetiyê zêdetir xurt dikir. Îcar heger bi qestî tiştek bihata xwestin k udi mektebê de ji me re bê gotin, wê bihatana gotin "Kurdan ev û ew kirin" û em ê bi kurdbûna xwe serbilind bibûna" (Cemilpaşa, 2014: 36).

Di destpêka sedsala bîstemîn Neteweperweriya Kurdî ya ku li xwendekarên Kurd peyda bibû, di esasê de pêdiviyên sosyo-psîkolojîk ê nasnameyî ya dibersivand. Tehdît ji aliyê koma mezin tê avakirin. Birêxistinbûn û hevgirtin a koma biçûk weke refleksa xwe-parastinê derdikeve holê. Wê çaxê saziyên weke Kürt Terakkî ve Teavun Cemiyeti û rojnameyên Kurdî yên weke Kurdistan û Kürt Teraakki Teavun Gazetesi hebûn lêbelê yê ku xwendekarên Kurd bi van saziyan beralî dikir bertekên li hember nasnameya serdest bû. Zayîna hestên neteweyî yên xwendekarên Kurd di serdema Osmanî de ji aliyê Nûrî Dersîmî wiha tê îfadekirin.

"… Atmosfera kîn û bêbaweriya li hemberî dewleta Tirk di nava ciwanên netewatên ne Tirk de dest pê kir. Heman siyaset di nava me ciwanên Kurd de bû sedema bertekên mezin. Xortên kurd jî ku heta wê demê ne xwediyê zihniyeta kurdewarî bûn, pirr bi heyecan bûn û tirkan weke dijmin dîtin. Êdî li Stenbolê di nav xwendekarên zanîngehê de têkoşîn û têkoşîneke netewî hebû. Dema em ji dibistanê ketin hundirê sinifê, me dît ku li ser tabela reş a mezin a dersê "Çi bextewar e yê ku dibêje ez tirk im" û "Bijî tirk" nivîsandibûn. Li hemberî vê rewşê em neçar bûn ku di navbera bêhnvedan de bikevin dersê û li ser heman tabloyê peyva "Bijî Kurd û Kurdistan" û "Xwezî li yê ku dibêje ez Kurd im" binivîsin. Bi heman awayî di navbera ciwanên Ereb, Çerkez, Arnawut, Ermenî û ne Tirk de bi hemû tundiya xwe nakokiya neteweyî dest pê kir." (Dersimi, 1992: 37-38)

Her sê rewşenbîrên Kurd jî di otobiyografiyên xwe de cî didin geşedana nasnameya neteweyî ya civakên cûda û hemû jî vê yekê bi atmosfera polîtîk yê serdemê re têkildar dike. Hevgirtin û xûrtbûna nasnameyên civakî weke bertekên li hember nasyonalîzma Tirkî tên nirxandin.

3.3.1. Qehwexaneyên Kurdî yên Stenbolê

Stenbol ne tenê qada nasîna komên cûda ye bo Kurdan di heman demê de nasîna kurdbûnên cûda ye jî. Kurdên ji heremên cûda bi nasnameya hevpar a Kurdbûnê li Stenbolê gihiştin hev. Stenbol ji hemû bajarên din ên zêdetir populasyonek bijartî [12] hebû. Herçend em behsa bandora komele an jî weşanên Kurdî bikin jî vegurînên ramanî yên xwendekarên Kurd Qehwexaneyên Kurdan yên li Stenbolê pêk dihat.

Komeleyên ku piştî şoreşa 1908an hatibûn avakirin, bandorek li ser civîna rewşenbîran kirin weke sazî di demek kurt de belavbûn. Saziyên Kurdî di belavkirina hişmendiya neteweyî de rolek aktîf hilnedan li gor bîranînên rewşenbîrên serdemê ku wê demê li Stenbolê xwendekar bûn, mekanên ku li ser hişmendiya wan tesîr kirine danûstandinên ramanî yên li qehwexaneya ne. Ekrem Cemîlpaşa, nivîskar û ramangerên pêşîn Xelîl Xeyalî di bîranînên suhbetên Xelîl Xeyalî û bandora wan a li ser xwendekaran wiha tîne ziman:

[12] Malbatên arîstokrat ên li Stenbolê sirgun qismeke girîngê vê girseya bijartî pêktînin. Malbatên mezin ên Bedirxanî û Baban, ku bere di rêvebirina herêmên Kurdistanê de cî digirtin hem bi xebatên polîtîk-avakirina komele û saziyên Kurd- hem jî bi xebatên rewşenbîrî –weşangerî- di mobîlîzekirina Kurdên Stenbolê roleke girîng leystin.

> “Ez ê çend gotinan li ser kurdekî xwedî rih û bi qeys û qerar bibêjim, ku li Stenbolê bi ciddî û bi hêz ders da xwendekarên kurd. Ev kesê ku ez ê qala wî bikim ev e, ev e ku kurdê Motkiliyê mezin Xelîl Xeyalî Beg e. Vî kesî di ciwaniya xwe de xwendina xwe li Amedê qedandibû. Rewşenbîr û kurdperwerekî dilsoz bû. Kurmancî, zazakî, tirkî, farisî û erebî baş dizanibû. Dikaribû bi fransî bixwîne û binivîse. Em xortên kurd di sala 1909an de li Stenbolê, me vî kesê birûmet nas kir. Wê demê temenê wî ji pêncî zêdetir bû. Xezîneyê Dibistana Ziraetê ya Halkaliyê ya Stenbolê bû. Rojên înê dihat qehwehaneya Dîvanyoluyê ya Diyarbekirê û me li dora xwe kom dikir. Ew ê gelek tişt li ser kurdayetiyê, dîroka kurdan, mêranî û rûmeta kurdan bigota. Axaftina wî ya dîrokî, netewî û edebî bêdawî bû. Me ciwanan bi eleqe, kêf û heyecaneke mezin li van axaftinan guhdarî kir û hînî gelek tiştan bû. Vî kesî bîst salan li Stenbolê ders da ciwanên kurd” (Cemilpaşa, 2016: 28-29).

Di heman serdemê Xelîl Xeyalî di weşanên kurdî de nivîskarî jî dikir û di saziyên Kurdî de jî cî digirt lêbelê îstasyona millî ango propagandayên nasnameyî li qehwexaneyan rûbirû ligel xwendekaran dikir. Bi angaşta Ekrem Cemîlpaşa 20 sal bo xwendekarên Kurd dersên Kurdeyatiyê daye. Wê demê zanko an jî dibistanên Kurdî tunebûn û jimara materyalên kurdî kêm bûn, rewşenbîrên kurd qehwexaneyên kurdî belavkirina hişmendiya neteweyî de weke amrazek bikaranîne.

Kadrî Cemîlpaşa ligel aliyên wê yên siyasî li ser rihê civakî ya qehwexaneyan radiweste. Qehwexaneyên ku Kurd lê dicivin jê re germiya hevgirtina Kurdbûnê dide. Kadrî Cemîlpaşa Seîd Nûrsiyê ku şal û şapikê Kurdî lê ye wiha tîne ziman.

> “Di demekê ku hestên me yên kurdewariyê dest pê kiribûn, me li qehwexaneya Abdullah Çawişê Erganiyê ku hemwelatiyên Diyarbekirê piştî derketina ji dibistanê di betlaneyê de dihatin cem hev, di nav hemwelatiyên xwe de wextê xwe derbas dikirin. Di vê navberê de dema em dibînin kurd bi cil û bergên kurdî tên qehweyê, ez bi kêfeke mezin heyrana wan dibim bi coşeke jidil. Gelek kes temaşe dikin ku çawa bi taybetî mamosteyê navdar ê Xwendekarên Nur, Molla Seîd (Bedîuzzeman Seîd-î Nursî), bi helwesta xwe ya spehî û mêrxas, şal û şepik li xwe kirine, bi desmala xwe” (Cemilpaşa, 2014: 36).

Qehwexaneyên Kurdî yên serdemê tenê cihê sohbetên kurdewar, û hevdîtinê bû di heman demê bo xwendekarên serdemê qada birêxistinbûniyê ye jî. Xwendekarên ku li van qehwexaneyan nîqaşên siyasî dikirin şûnde bûn pêşengên Tevgera Kurdî Nûrî Dersîmî (1992: 38). Tevgera xwendekaran ya li qehweyan wiha tîne ziman: “Em ciwanên kurd li Stenbolê, Çemberlitaşê, Divanyoluyê, li Qehwehaneya Diyarbekirê kom dibûn û li ser vê mijarê

muzakere dikirin. Bêguman armanca kurdîtî û kurdayetiyê bi hemû wateya xwe bi şev û roj li ser me hemûyan bandor kir".

Danûstandinên li Qehwexaneyên kurdî ji aliyekî texuyyula Kurdbûnê di bîra rewşenbîran zêdetir dikir li aliyê din dibû qadên rêxistinkirina neteweperwerên Kurd. Wisa ku Ekrem, Kadrî Cemîlpaşa di qehweyan de ji tedrisata kesên mîna Xelîl Xeyalî û Seîd Kurdî derbas bibûn şûn de 1912an de yekem komeleya xwendekarên Kurd avakirin.

3.3.2. Çalakî û Xebatên Çandî

Miroslav Hroch di pêvajoya netewebûna civakan de Qonaxa B yê de bale dikşîne ser ajitasyona millî ya koma welatparêzan. Ev koma welatparêz gelemperî ji rewşenbîr û xwendekarên pêk tê, qisma perwerdebûyî ya civakê ye. Fealiyêtên propaganda û ajîtasyona millî ya neteweperweriya Kurdî ji aliyê rewşenbîrên Kurd hatine kirin ku gelemperê wan li Stenbolê perwerde bibûn. Otobiyografiyên rewşenbîrên Kurd de, nivîskar herî zêde li, ser van çalakiyên xwe radiwestin. Rol û tekoşîna wan a di nava Tevgera Kurdî parçeyeke vegotina dîroka tevgera neteweyî ye.

Bi bandora polîtîkayên tûranîst û zordest yên Îttîhat û Tereqqiyê hestên neteweyî yên xwendekarên Kurd xurttir dikirin. Ev yek bes ne bo Kurdan bo kemîneyên din ên Osmanî jî wisa bû. Piştî Şoreşa 1908an li Stenbolê gelek komeleyên neteweyî û weşanên bi zimanên der-Osmanî derdiket. Atmosfera azadiyê her çend demek kurt berdewam kiribe jî, piştî îstîbdata ev azadiya demkurt di dîroka civakan de veguherînên mayinde pêk anî. Kadrî Cemîlpaşa zayîna hestên neteweyî yê Kurd û civakên din wiha tîne ziman:

> "Ji ber bandora vê siyaseta tirkperestiyê pêkhateyên Osmanî-Îslamî yên ku xwe bindest dibînin; Ereb, Arnawut û Kurdan jî rêxistinên netewî ava kirin ku pêwist e neteweya xwe eşkere bikin. Komeleyên Ereb Müntediü'l Edebî, Arnawut Başkim, Kurd Hêvî, ev rêxistinên ku komeleyên xwendekar bûn, di rastiyê de pêşî li derketina hestên netewî bûn. " (Cemilpaşa, 2014: 41).

Xwendekar di tevgerên nasyonal de dînamîkên mezin in, ajitasyon û propagandayên millî yên rewşenbîrên di serî de di nava xwendekaran alîgiran derdixe. Hewldanên nifşa yekem a rewşenbîriya Kurdî, ya bo neteweyê bi xwendakarên Kurd geştir bû. Li Stenbolê nemaze di dawiyên sedsala nozdemîn de nifûsek hêja peyda bibû, ji bilî malbatên arîstokrat ên sirgun gelek

ciwanên Kurd bo xwendina bilind dihatin Stenbolê û jimarek mezin ên Kurdan jî ji bo derfetên ekonomîk berê xwe dabûn peytexta Osmanî. Lêbelê çalakiyên rewşenbîrên Kurdên serdemê tesîra xwe ya mezin di nava xwendekaran peyda kir.

Bi Şoreşa 1908an wir ve li gel Kurdên xwendekar, aleqeyeke mezin bo nasnameya neteweyî bilind dibû. Komele û qehwexaneyên Kurdî navendên bangawaziyên nasnameyî bûn. Veguherîna polîtîk ji derve jî dihat tehlîlkirin. Cemîlpaşazade vê yekê di otobiyografiyên xwe de îfade dikin, di heman demê aleqeya wan a li hember nasnameya neteweyî ji aliyê Nûrî Dersîmî jî hatiye çavdêrkirin. Geşedana hestên neteweyî ya ciwanên Diyarbekirî- Cemîlpaşazadeyên Amedî- di otobiyografiya wî de wiha tê îfadekirin: "Îdeal û armanca neteweyî ya kurdayetiyê di nav ciwanên Diyarbekirê de berbelav bû." (Dersîmî, 1992: 42).

Danûstandinên rewşenbîr û xwendekarên bi damezrandina yekem komeleya xwendekaran bi encam bû. Xebatên çandî yên bo nasnameya Kurdî yên xwendekaran bi vî awayî destpêkir. Xwendakarên Kurd sala 1912an de li Stenbolê yekemîn komeleya xwedekarên Kurd avakirin – Hêvî Kürt Talebe Cemiyetî-. Cemiyeta pêşîn legal Kurd Tereqqî Teavûn ji aliyê hikumetê hatibû girtin û belavkirin, li gor Kadrî Cemîlpaşa sedema belavbûna komeleyê problemên di navbera Seyîd Ebdulqadir û Bedirxaniyan bû, ji ber problemên di navbera wan hikumet bi hesanî komele belav kiribû (2014: 37) Kadrî Cemîlpaşa Cemiyeta Hêviyê di belavkirina hestên neteweyî de yek ji gavên destpêkê dibîne, gîrîngiya ku li hember Hêvî destnîşan dike di otobiyorafiyê de jî xwe der dike. Ekrem Cemîlpaşa û Nûrî Dersimî her çend di nava çalakiyên li Stenbolê qala Hêviyê bikin jî di otobiyografiyên wan de zede cî nagre berkesê wan Kadrî Cemîlpaşa pêvajoya avabûna komeleyê endamên wî, çalakiyên wî bi hûrgilî destnîşan dike. Kadrî Cemîlpaşa pêvajoya avakirina hêviyê wiha tîne ziman:

> "Di sala 1911an de ez ketim Dibistana Ziraetê ya Halkaliyê ya Alisi. Me li dibistanê bi hevalên kurd ên xwendekar re sohbet dikir û me eleqeyekî kûr nîşanî karûbarên neteweyî dida. Di vê navberê de rêberî û teşwîqkirina Xelîl Xeyalî Beg ku midûrê mektebê ye, hestên me yên neteweyî xurtir kir. Bi hevalbendiya hevalan re me biryar da ku civakeke xwendekar a Kurd ava bikin. Min Omer Cemîlpaşa kurê wekîlê Wanê Tevfîk Beg Fuat Temo bi Cerrahzade Zekî yê Diyarbekirê re bi rojan li mizgefta dibistanê rêziknameya komeleya xwendekaran a bi navê Hêvî saz kir û di sala 1912an de piştî ku destûrnameya pêwist girt û damezrîna me spasiya Hêvî ragihand." (Cemilpaşa, 2014: 42).

Hêvî di heman demê de kovarek bi navê Rojî Kurd jî derdixit ku tê de rewşenbîrên weke Abdûllah Cevdet û Babanzade İsmaîl Hakki nivîskarî dikir. Bi van çalakiyan di serî xwendekar

dixwestin xizmetî Kurdbûnê bikin elam ji ber wê yekê Kadrî Cemîlpaşa armanca komeleyê wiha tîne ziman: "Armanca Hêviyê li cem kurdan şiyarkirina hestên neteweyî û doza Kurdî bû û xebata li ser çanda kurdî bû (2014: 49). Armanca kovarê jî bi heman awayî bû. "Armanca Rojî Kurd bilindkirina çanda kurdî û xwendina zimanê kurdî di nava kurdan de bû (2014: 49).

Kadrî Cemîlpaşa armanca sereke ya komeleyê weke "şiyarkirina doza Kurdî" terîf dike. Ji aliyê rewşenbîrên serdemê jî tê qebûlkirin ku, Kurdayetî an jî Doza Kurdî di wê serdemê yekûna ramanên dorhêleke biçûk ê Stenbolê bû. Armanca girseyîbûne di ajandayên komeleyan de hebe jî tevgera nasyonal ji makewelatê gelek dûr bû. Nifûseke biçûk ên xwende hebû û ji aliyê rewşenbîran problema bigehîn jî ev bû. Abdûllah Cevdet di nîvîseke Hetawî Kurd de vê yekê wiha tîne ziman, bi nêrînek rexneyî rewşa Kurdan dinirxîne: "Bêguman hûn ji bo xizmeta Kurd û Kurdayetiyê kedeke mezin didin. Lê ji bo miletên xwenda rojnameyê derdixin. Di nava kurdan de mirovên xwendekar –mixabin ez bawer im- bi tiliyan têne nîşan kirin." (2019: 52-54). Di berdewama nivîsê de destnîşan dike ku divê armanca xwendeyan ew be ku zanînê, ilmê bigihînin welatê xwe.

Rewşenbîrên serdemê dizanibûn problema mezin a Kurdan perwerdehî ye. Nifûsa biperwerde kemîneyek biçûk bû di nava girseyên gel de ew jî ji welatê dûr ketibûn, di nava xwendekarên Stenbolê de yên Kurd qismek pir biçûk pêk dianî. Otobiyografiya Nûrî Dersîmî de rewşe xerab bi bîranînek wiha tê îfadekirin:

> "Di heman serdemê de hejmara xwendekarên ji Kurdistanê li lîseyên Stenbolê gelek kêm bû. Rojekê dema ku bi 8-10 hevalan re li pey hev li dibistanê dimeşiyan, hevalekî me yê mamoste Arnawut Muhtar dest bi axaftinê kir û jê pirsî: "Ez meraq dikim çend xwendekarên tirk li zaningehên Stenbolê hene?" Hevalê me yê ji Edîrneyê bi navê "mamê" bersiv da: "Nûrî, ji Dêrsîm û Kurdistanê, piştî zêdetirî 20 hezar xwendekarên tirk û hevalê me yê Albanî, du-sê hezar xwendekarên Alban û hevalekî me yê din jî got ku çend hezar ermenî. Ciwan di xwendina bilind de ne." Ji min re got. Li Stenbolê çend hezar xwendekar ji gelek deverên Tirkiyeyê xwedî xwendina bilind in? Zabîtek hebû, bêyî ku hewce bike tiştekî nerast bêje: Min daxuyand ku tenê ez ji Dêrsimê me û mixabin tenê 150 xwendekar ji beşê din ê Kurdistanê hene. Di heman kêliyê de hemû heval matmayî man." (Dersimi 1992: 40).

Ne tenê li Stenbolê gelemperê Kurdistanê jî saziyên perwerdehiya modern kêm bûn, li gor nifûsa xwe di nava kemîneyên Osmanî de jimara xwendekarên Kurd yê herî kêm bû. Dikare were gotin çalakiyên serdemê di destpêkê de ji gel bêtir bo nifûsa biperwerde ya li Stenbolê bû. Ji ber vê yekê weşanên Kurdî an jî Tirkî di destpêkê de bo mobîlîzekirina Kurdên bi perwerde ji xwe re kirin armanc. Di hejmara ewil a Roji Kurd de nivîsa pêşîn bi van hevokan dest pê

dike. “Di bin rûyê Rojhilatê ku rawestiyaye û razayî ye, hêmaneke jibîrkirî ya bi sedsalan jiyaye, navê wê Kurd e.”

Paşdemayîna Kurdan tespîteke hevpar yê rewşenbîrên serdemê ye. Rewşenbîr bi çalakiyên xwe dixwazin hestên nasnameya neteweyî derbikin. Li Şükrü Mehmet Sekban[13] ku di Cemiyeta Hêviyê de cî jî girtiya angaşt dike ku endamên komeleyê dewletek serbixwe nediwestin pêşdebirina civakê armanca komeleyê bû. Kadrî Cemîlpaşa li dijî van îddîayan derdikeve li gor wî Şükrü Sekban ji bo were efûkirin rastiyan înkar dike. Lêbelê Kadrî Cemîlpaşa dîsa jî bandor û rola wî ya di nava Tevgera Kurdî înkar nake:

> “Şikrî Mehmet Beg, her çiqas alîkarî û hewldanên wî yên ji bo belavkirina fikrên neteweyî di nav ciwanên de nayê înkarkirin jî, lê di broşûrê de ji bo dilşadiya tirkan, ji bo ku piştî efûya Bexdayê dîsa vegerin Stenbolê, di broşûrê de ji kurdan xwestiye ku ji hev belav bibin. Li cihê ku lê pena bûye, îftira Hêvî wek bûhtan(îftira) Dibêje ji ramanên (herêmî) pêk tê û tu eleqeya xwe bi hestên neteweyî yên kurd re nîne, ev jî îftira li hember heqîqetêye” (Cemilpaşa, 2014: 42 - 43).

Rewşenbîr di otobiyorafiyên xwe de dema qala hestên xwe yên neteweyî dikin weke ku, ev hest tim di heman astê de be qal dikin. Piştî peydabûna hestên neteweyî weke ku ramanên wan ên polîtîk ne guherîbin. Lêbelê wexta diskûra xebat û nivîsên wan tê analîzkirin, veguherîn baş tê dîtin. Cemîlpaşazade û Nûrî Dersîmî dema behsa Hevî yê dikin, komeleyê di pozîsyoneke neteweperwer de bi cî dikin. Lê di Rojî Kurdê de diskura gelemperê nivîsan de seknek çandparêz xuya dike. Behsa seperatîzmeke tund ne di nivîsan de ne jî di bîranînên serdemê de nayê qalkirin. Tevgerên wan ên di şerê cîhanê jî vê yekê piştrast dike. Dema şer dest pê dike û rewşenbîr ji aliyê rêveberiyê ve tên gazîkirin, hemû vê qebûl dikin û eniyên cûda de din ava Artêşa Osmanî de cî digrin. Kadrî Cemîlpaşa ku di destpêka şer li Ewrûpayê ye sedema tevlîbûna xwe ya artêşê wiha tîne ziman.

> “Hevalê me yê hostayê Monsieur Büroda digot, “Madem hûn ji tirkan ne razî ne, çima hûn diçin leşkeriya tirkan, neçin.” Ew jî xêrxwaz bû û got, “Eger hûn ji meaşê xwe ditirsin, li rojnameya min bixebitin û ez ê rêveberiya we misoger bikim.” Min got ku di dawiya vî şerî de dê guherînên

[13] Şükrü Mehmet Sekban yek ji girîngtirîng rewşenbîrên serdemê ye. Di avakirina Hêviyê de cî digre di Komeleya Kurdistan Tealî Cemiyetî û Xoybûnê de weke endamekî aktif dixebite. Sala 1933an de bi broşura Frensî a bi navê “La Question Kurde” de bereksê fikren xwe yên bere en Kurdperwer, angaşt dike ku Kurd û Tirk du milletên bira ne her du jî Tûranîne ne. Asîmîlasyona Kurdan yekbûna du qevmên ku nijadê wan yek e. Veguherîna ramanî Sekban ji aliyê rewşenbîrên serdemê bi tundî hatiye rexnekirin. Ji bo agahiyên berfirehtir bnr: Sekban, M. Ş. (1998). *Kürt Sorunu* (Çapa Yekem) İstanbul: Kamer

siyasî (guherînên) girîng çêbibin û min xwest di vê demê de di nav miletê xwe de bim." (Cemilpaşa, 2014: 46).

Hemû xwendekarên zankoyan wê demê bo şer hatibûn gazîkirin. Kadrî Cemîlpaşa amaje dike ku ji ber tesîrên polîtîk û civakî yên encamê şer dixwaze tevlî şer bibe lê bes ne ew hemû xwendekarên Cemîlpaşa wê demê tevlî şer dibin Ekrem Cemîlpaşa bi xwe re çar endamên din yên malbatê jî dibijêre. "Şerê Cîhanê yê 1914an dest pê kir. Ji zanîngehên Ewrûpayê xwendekarên Osmanî bo Stenbolê hatin vexwendin. Em jî di nav wan de bûn. Ez, Îbrahîm, mamê min Cevdet, mamê min Kadrî, birayê min ê biçûk Şemseddîn jî di nav kesên ku vegeriyan de bûn" (2016: 31). Bi gotina Ekrem Cemîlpaşa bi hezaran xwendekar bo şer li Stenbolê dicivin. Şemseddîn û Îbrahim Cemîlpaşazade di şerî de ji jiyana xwe dest didin. Di nava rewşenbîran de Nûrî Dersîmî di otobiyografiya xwe de çavderiyên xwe yên li leşkeriyê bi hurgilî vedibêje. Dersîmî bes behsa tecrubeyên xwe yên şexsî nake bûyerên serdemê yên ku şahidiya wan nekiriye jî bi hûrgilî dinirxîne.

3.4. Texeyyula Nasnameya Neteweyî di Otobiyografiyan de

Pêvajoya teşegirtina nasnameya neteweyî ya rewşenbîrên Kurd bi du serdeman dikare were dabeşkirin. Serdema ewil salên 1908 heya 1914an dihûndirîne kû vê serdemê her sê rewşenbîr weke xwendekarê dibistanên bilind nasnameyên xwe yên neteweyî kifşkirin. Di avakirina komelaya Hêvî de cî girtin û weke endamên aktif xebitîn. Bîreweriya rewşenbîran ji reaksiyoneke sosyo-psîkolojîk derkete holê ku ev hişmendî ne hilberîna îdeolojiyek xurt bû. Şerê cîhanê ya yekem di fikriyata rewşenbîrên Kurd de encamên bitesîr afirand. Tecrubeyên di nava şer, tevgerên polîtîk ên serdemê, hilweşîna û dagirkirina Osmanî sedemên bingehîn ên vê yekê ne.

Beşên heta şerê cîhana yekem ya di otobiyografiyan de nasnameya Tirkî her çend nasnameya dijber be jî rexneyên serdemê zêdetir li ser înkarkirina nasnameya Kurdî ye. Rewşenbîrên Kurd, Dewleta Osmanî weke dagirker an jî dijmin kod nakin heta wê demê. Dîskûrsek seperatîst jî xuya nake. Helbet bi piştgiriya hikûmetê dîskurek neteweperwer yê Tirkî li saziyên dewletê û dorhêla entelektuel heye lêbelê ev weke problemek strukturel nayên dîtin. Ji ber vê yekê jî rewşenbîr rexneyên xwe li hember dewleta Osmanî nakin, li hember aktorên serdemê dikin. Kadrî Cemîlpaşa (2014:48) amaje dike li Ewrûpa-Lozan- wexta xwendekarên kurd xwe ji xwendekarên tirk cihê dikirin, ev ji aliyê xwendekarên tirk xweş nedihat dîtin, ew

hebûneke xweser yên Kurdan qebûl nedikirin. Dîskûra wê demê li ser doza hebûneke xweser hatibû avakirin, Kurd jî weke civakên din xwedan nasnameyek xweser bûn, rewşenbîr jî bo îspata vê dixebitîn. Nayê wê wateyê ku ew daxwaza statuyek polîtîk dikirin. Îmaja Osmanî û nasnameya Tirkî piştî şerê cîhana yekem guherî. Hilweşîna Osmanî û di berdewama wê de avabûna Komara Tirkiyeyê, polîtîkayên tundrew li hember kemîneyan derxist holê. Ev yek îmaja tirkî ya di hişên rewşenbîrên Kurd de serobin kir. Bi heman awayî îdraqa nasnameya Kurdî jî veguherî. Têkiliyên Kurd û Tirkan di çarçoveya bindest-serdest de hate bicîhkirin.

Beriya Şerê Cîhanê ya yekem di honandina nasnameya Kurdî de bo neteweperwerên Kurd îmaja dijber Ermenî bûn. Ermenî û Kurd bi sedan salan heman terîtorya parvedikirin û Kurdistana Bakur ji bo yên din Ermenîstana Rojava bû. Şerên di navbera Rûsya û Osmanî, piştgiriyên dewletên Ewrûpî û Rûsya ya bo neteweya Ermenî dikir ku Kurdan xwe zêdetir nêzî Osmanî bikin. Tansiyona di navbera Kurd û Ermeniyan di otobiyografiyan de jî xwe dide der. Rewşenbîrên Kurd di wê baweriyê de ne ku Ermenî li hember Kurdan propagandayên qirêj dimeşandin. Ev rewş dikir ku Kurd xwedan îmajek negatif bin li Ewrûpayê. Kadrî Cemîlpaşa di bîranîneke xwe yê li Ewrûpa de vê yekê wiha tîne ziman:

> “Hevala xanimê, xwediyê Gazat de Lozanê, ji Monsieur Cak re gotiye ku mêvanekî wî yê kurd heye. Birêz Cak got, "Ez bawer nakim ku tu carî kurdek li salonên Ewrûpayê be": Dibe ku birêz Cak ji ber propagandayên nerast yên ku hin ermenî li dijî kurdan dikin, kurdan wek mêrên çiyayî yên hov bihîstiye û ji ber meraqa xwe xwestiye were hafa min. Gava ku min weke camêrekî pak -weke xwe- dît, wî qebûl kir ku ew bi ramanek xelet hatiye xapandin, wî lêborîna xwe xwest.” (Cemilpaşa, 2014: 44).

Di berdewamê de behsa bîranîneke xwe yê din dike, dema Ew û Ekrem Cemîlpaşa li Lozanê ne diçin konferansekî derbarê Kurdan de. Li konferansê mîsyonerek bi şal û şapika kurmancî behsa tecrubeyên xwe yên di nava Kurdan dike. Angaş dike ku Kurd civakek wehşî û paşdemayîne, baweriya wan bi tu olê nîne. Li dijî vê her du piştî konferansê derdikevin pêşiya mîsyonerê.

> “..Me jê re got ku ew ji vê îftiraya ku li ser kurdan kiriye şerm nakî, gelek zarokên kurdan ên wek me li Ewrûpayê, li Stenbolê dixwînin. Ekrem çend gotinên ku ew tehdît kirine got. Mêrik bi kurdî got ku ermenî ye û got: “Bav û kalikê te bi tivingê li min xist, ez birîndar kirim, tu jî li vir xencera xwe derxe û lêxe.” Me got: “Em ê te li çiyayên Kurdistanê bibînin, ne li vir. "û em ji hev qetiyan.” (Cemilpaşa, 2014: 45).

Ermenî weke civakek reqîb hatine nirxandin di otobiyografiyan de, piştî şerê cihanê jî ramanên rewşenbîran de guherînek mezin nayê dîtin. Nûrî Dersîmî di otobiyografiya xwe de cihek mezin bo têkiliyên Kurd û Ermeniyan veqetandiye. Dersîmî di otobiyografî de gelek caran helwestên dijminane ya Ermeniya rexne dike. Ligel vê di wê baweriyê de ye ku sucên li dijî kurdan yê Ermeniyan pir hindik dikeve rojevê.

> "Ez nizanim çima heta niha tu alim û bîrmendekî kurd li ser xiyanet, çewsandin û qetlîamên ku ermeniyan li kurdan kirine nenivîsiye. Ma ev ne nîşana xêrxwaziya li hember Ermeniyan e? Heger tenê yek bîrmendê ermenî hebe ku wisa difikire ku ji ber ku nizane binivîsîne, ev ji bo ermeniyan ramanek pir xemgîne. Heger li cem ermeniyan xêrxwaziyeke jidil li hember kurdan hebe, ew ê hemû pirtûkên ku li dijî kurdan nivîsandine tune bikin, li ser serxwebûn û biratiya dîrokî ya her du miletan pirtûkên nû yên bibandor û resen binivîsînin û bi weşandina wan dê ji nifşê nû re mîrateyek bihêlin da ku xizmeta girêdanên biratî û dilsoziya her du hêmanan ji hev re bikin." (Dersimi, 1992: 48-49)

Her sê otobiyografî jî piştî demek dirêj hatine nivîsîn lêbelê îmaja dijber a Ermeniyan hîn jî di bîranînan de cihê xwe diparêze. Nûrî Dersîmî, bereksê Kadrî û Cemîl Cemîlpaşa di otobiyografiya xwe de ciheke mezin bo angaştên Ermeniyan veqetandiye. Bi hûrgilî û di dema fermanê de herêm bi herêm alîkariyên Kurdan bo Ermeniyan tê qalkirin û dîsa zilm û kûştinên wan, êrîşên Ermeniyan li dijî Kurdên sîvîl tên ravekirin. Di her sê otobiyografiyên rewşenbîran de jî derbarê Jenosîda-tehcîr- Ermeniyan bertekek mezin nayê dîtin. Nûrî Dersîmî di wê baweriyê de ye ku Kurd jî bi qasî Ermeniyan ziyan dîtine. Nûrî Dersîmî di derbarê komkûjiyên Ermeniyan de sûcdarkirina Kurdan de Ewrûpayê bi dirûtiyê sûcdar dike. Li gor wî Kurd pevçûnên di navbera Kurd û Ermeniyan de bêtir zirar dîtibe jî, Kurd weke berpirsyariyên komkûjiyên li dijî Ermeniyan tên dîtin.

> "Barbarên Ewrûpî yên ku nivîsîbûn ku 1,5 milyon Ermenî ji parêzgehên Şerqa Anatolyayê hatin sirgûnkirin (derxistin) û 600.000 ji wan li ser rêyan hatin qetilkirin; wek ku li jor bi berfirehî hat gotin, Erzirom, Wan, Bedlîs û parêzgehên din ên rojhilatê behsa wê parzemînê nekirin, Kurdên ku li wir rûniştibûn ku 1,5 mîlyon ji aliyê Ermeniyan ve di dema êrîşa Rûsyayê de hatin kuştin. Berpirsiyarê qetlîama ermeniyan kurd bûn, lêbelê ermenî qet berpirsiyarê qetlîama kurdan nehat dîtin." (Dersimi, 1992: 74)

Dawiya şerê cîhanê ya yekem de derbarê Tirkan û Dewleta Osmanî de veguherînek dîskûrsîf eşkere tê dîtin. Dewleta Osmanî heta wê demê nasnameya hevpar yê Kurd, Ereb, Tirk û kemîneyên din dihat dîtin êdî bo rewşenbîrên Kurd astengê herî mezin ê li pêşiya azadiya Kurdan hatiye dîtin. Têkiliyên Tirk û Kurdan di çarçoveya serdestî-bindestî yê de dihat

xwendin. Kovar û rojnameyên serdemê ên weke di *Jîn, Serbestî* de bi awayekî eşkere derbarê statûya Kurdan daxwaz û pêşniyar dihatin kirin. Doza nasnameya Kurdî bilez vediguherî meseleya Kurdî. Ev yek tesîra xwe li ser temamê rêwşenbîrên Kurdî jî destnîşan dike.

Li Stenbolê di nava girseyên Kurdî yên di esasê xwe de ne nişstecihên wê dere bûn, çalakiyên Kurdî ne vediguherî tevgereke girseyî, Kurdên Stenbolê li derdora fikren neteweperwer mobîlîze nedibûn. Rewşenbîrên Kurd her çend di nîzamnameyên komeleyan de behsa pêşdebirina Kurdistanê, li Kurdistanê birêxistinbûnê bikin jî, vegereke bi tesîr tu car pêk nehat. Cemîlpaşazade û Nûrî Dersîmî ji çend mînak in ku vegeriyan li welatên xwe xebatên xwe domandin.

Piştî şerê cîhanê Ekrem û Kadrî Cemîlpaşa li Diyarbekir bi navê Kürdistan Cemiyeti cemiyetek avakirin. Her du rewşenbîr jî di otobiyografiyên xwe de bîreweriya civakê de veguherînê teyît dikin. Dewleta Osmanî êdî hilweşiyabû û divê Kurd jî li gor vê rastiyê tevbigeriyan. Ekrem Cemîlpaşa di otobiyografiya xwe de behsa kelecana civakî dike. Propagandayên civakî û ajitasyona millî di salên 1918-1919an li Amedê girseyek li derdora nasnameya Kurdî gihandibû hevdû. Di propagandayên azadiya Kurd û Kurdistan de tirsa hebûnî ya Kurdan dihatin hişyarkirin, jenosîda Ermeniyan hatibû tecrubekirin, heman risk bo Kurdan jî pêkan bû. Ligel vê Ekrem Cemîlpaşa di civîneke civakê ya Amediyan dê rewş wiha tîne zîman:

> "Di civînê de serkeftinên mezin hatin bidestxistin. Gelek xeberbêj derketin ser minbera tekkeyê û axaftinên welatparêzî kirin. Gelek xeberbêjan diqîriyan û digotin Stenbol ji aliyê dewletên biyanî ve hatiye dagirkirin û Împeratoriya Osmanî ji hev belav bûye. Hemû kurdan vedixwînin yekîtiyê. Nexwe wê Kurdistan jî bibûya wek Ermenîstanê." (Cemilpaşa, 2016: 38).

Di dîskura neteweperwerên Kurdan de wê demê rizgariya ji dewleta Osmanî bo berdewama civakê û hebûna Kurdan weke hewcehiyek zerûrî dihat pênasekirin. Ji bo ku Kurdistan nebe Ermenîstan hewce bû êdî Kurd mafên xwe yên neteweyî biparêzin. Ji ber tu hêzek ku Kurdan biparêze nemabû.

> "Di nav axaftvanan de, Hemdî Efendî yê herî wêrek bû. Ev kesê ku ji 50 salî zêdetir bû, êrîşkar bû û serokê ulema ya bajêr bû. Îlm-î fiqta di edebiyata erebî û tirkî de navdar bû. Kurdî jî baş dizanibû. Ev kes piştî ku rewşê bi hûrgilî tehlîl kir, gotina xwe wiha bi dawî kir: "Cism-i Devlet-i Aliyya-i Osmaniye bûye kangren û ev nexweşiya xedar li ber e ku tevahiya welatê Osmaniyan dorpêç bike. Tenê çareseriya rizgariya ji linge kangrenbûyî jêkirina wê ye, kêr e. Pêwist e ku ezaya kangrenbûyî, ji kangrenê were xilas kirin." (Cemilpaşa, 2016: 39)

Veguherîna dîskûrsîf ya rewşenbîrên Kurd de helbet pêvajoya Şerê cîhanêya yekem bandoreke mezin kiribû. Li aliyekî jenosîda Ermeniyan hatibû dîtin, aliyê din encamên polîtîkayên Turanîstên maceraperest hatibûn tecrûbekirin. Ekrem Cemîlpaşa polîtîkayên rêveberiya serdemê bi nijadperestiyê sûcdar dike. Dîskûra li hember Îttîhatiyan ku di otobiyografiyê de tê dîtin di kovar û rojnameyên wê serdemê de jî tê dîtin.

> "Îttîhatyên Tirkperest, zalim û mutaasıb, di nav aloziya şer de, bi sûdwergirtina ji rastiya ku rêveberiya wan a leşkeri li her tiştî û li her derê serdest bû, wêranî û hovîtiyên curbecur li hemû Kurdistanê dikirin. Bi taybetî di dawiya şer de, bi zagona nîştecihbûnê ya koçberan, ku ew weşandin û pêk anîn, li Kurdistanê ji Ermeniyan zêdetir qetlîam li kurdan dikirin. Çawa bi çekan kurd kuştin, bi serma, birçîbûn û nexweşiyê jî qir kirin." (Cemilpaşa, 2016: 42).

Lêbelê bêhêvîbûna gel ya serdemê cihê xwe di otobiyografiyan de jî destnîşan dike. Her çend şikestî be jî civak ji hêza dewletê ditirse ji ber vê yekê propagandayên neteweperweran encamên erênî dernaxe holê.

> "Tevî hilweşîna Stenbolê û perçebûna Împaratoriya Osmanî jî, ji sedî nodê kurdan dîsa jî ji vê yekê bawer nedikir. Hin jî ji dewleta tirk ditirsiyan. Ji bo vê jî komeleya me keda xwe ya herî mezin daye vê xalê. Ew bû ku bi her awayî rewşa kurda ya rastî îzah bike û îzah bike ku firsenda xelasiyê (azadkirinê) ketiye deste kurdên ku ev çarsed sal e di bin nîrê tirkan de nalîn, belengazî û heta hilweşîna dewleta Osmanî ango tirkan di mejiyê kurdan de bi cih bikin.
>
> Pêkanîna vî karî pir zehmet bû. Kurd cahil bûn, ji sedî nod nexwenda bûn." (Cemilpaşa, 2016: 42-43).

Ekrem Cemîlpaşa behsa bindestiya 400 salî dike ku ev yek nîşaneya peydabûna diskûra neteweperwer e. Ji ber ku rewşenbîrên Kurd ên serdema her çend hin rêveber an jî padîşahan rexne bikin jî Dewleta Osmanî hêzeke serdest ya li ser Kurdan kod nekiriye. Dewleta Osmanî weke sîwanek hatiye fikirîn ku di bin de Tirk, Ereb, Kurd û neteweyên din hene. Lêbelê piştî avabûna Komara Tirkiyeyê û serhildanên neteweyî yên salên di navbera 1925-1938an tegihîna Osmanî jî ji nû ve hatiye avakirin. Êdî Osmanî weke nasnameyek hevpar na yek ji serdest û dijminên mezin ên Kurdan hatiye tesewwirkirin.

> "Me çareyek pratikî dît ji bo şiyarkirin û bilindkirina ruhiyeta hinek bajarvanên xwe yên dudil û tirsonek: Ez û çend hevalê xwe zêdetirî salekê bi şal û şapikan li sûka bazara bajêr geriyan. Carinan em wek siwarî cil û bergên xwe yên neteweyî yên pir xemilandî li cihên seyrangehê li xwe dikirin. Di nava vê sal û nîvê de min ji xeynî şal û şapikan qet cil û berg li xwe nekir. Heger ez ji erke xwe biçûma ber walî û fermandaran, ez bi vê cil û neteweyî û bi çeka ku kembera xwe

xemilandiye diçûm. Helbet lixwekirina vê cilê ji bo min hem kêfeke mezin û hem jî rûmeteke mezin bû. Lê armanca min a sereke şiyarkirina mirovên tirsonek û dudil bû." (Cemilpaşa, 2016: 43).

Di vegotinên rewşenbîrên Kurd de şal û şapik yek ji girîngtirîn parçeya nasnameya Kurdî û cilên neteweyî tê pêşkêşkirin. Ji bo propaganda û ajitasyona millî weke amrazek tê şixûlandin ji aliyê rewşenbîran ve. Kadrî Cemîlpaşa dema behsa tesîra Seîd Nûrsî ya li ser wî dike behsa cilên wî yên Kurdî jî dike. Hişmendiya neteweyî di serî de hewceyê cûdahiyan e. Rewşenbîrên Kurd taybetmendiyên etnografîk yên civakî di belavkirina hestên neteweyî bikartînin.

Pengava dawî yê diskura neteweyî ya Kurdî Tirkan weke dijmin pênasekirin e. Otobiyografî her çend ji bîranînan dizê jî, di dema niha tên nivîsandin. Nêrînên polîtîk yên serdemê naveroka bîranînê neguherîne jî îdraqa wê diguherîne. Di otobiyografiyên rewşenbîran de dîskûrek dij-kolonyal tê xuyan. Tirk û Dewleta Tirk serdestên Kurdan tê qebûlkirin diyar e neteweperweriya Kurdî di fikriyata rewşenbîran xwedan cihek xurt e. Ev yek di pêşkêşkirina bîranînan de bivê nevê tesîrek çêdike.

"…Min bi dil û can şerê rûsan û îngilîzan nekir; lê ji bo rûmeta xwe ya şexsî bi dijmin re, ger di şerê rûmetê de ez li pêşberî hevalan nebûma jî, bêguman ne li pişt wan bûm jî. Min nexwest xwîna xwe li ser navê dewleta tirk (kûjerê miletê xwe) birijînim." (Cemilpaşa, 2014: 58).

"Tê dîtin ku hem yên şoven û hem jî yên nerm ên hikûmeta tirk, dijminê kurdan in û li ser nexwestina xêra kurdan li hev kirine." (Cemilpaşa, 2014: 61).

"Kurd ne xwediyê welatê xwe ye, kurd nikare bi zimanê xwe biaxive, nikare ola xwe bijî, nikare pirtûkek binivîse, nikare rojnameyek derxe, nikare dibistanekê veke, nikare ji azadiyên siyasî sûd werbigire. Kurdê ku ji maf û îmkanên herî xwezayî yên mirovahiyê bêpar e, ji her cure zêdegaviyan dûr e; li ser maf û baweriya xwe, xwe dispêre serketina heq û îmanê, ber bi vê armancê ve diçe, ber bi armanca ku her mirovekî bi rûmet dixwaze û tedikoşe. Ji bo xatirê vê armancê ye ku xwe di şexsên abîdeyên zindî yên wek Îhsan Nûrî û Ferzende li Araratê nişan dide." (Cemilpaşa, 2014: 162).

Bêşik Serhildana Agirî di avabûna vê dîskûrê de xwedan ciheke girîng e. Xoybûn di serhildana Agirî de rolek aktîf dileyst bi rêya broşurên zimanên biyanî propagandayên serhildanê dihat kirin ji aliyê din belavok dihatin belavkirin bi mebesta şiyarkirina civakê. Wekî din jî bo piştgiriya Agirî hewldidan serhildanên hem-wext organize bikin. Xoybûn ne tenê

cemiyetek rewşenbîrî bû di heman demê de rêxistinek biçûk bû jî, şîdetê li hember serdestan meşrû didît. Ev sekna rexistinî li ser dîskûra rewşenbîr jî tesîr kiriye.

Rewşenbîrên serdema pêşîn bi seknên xwe yên polîtîk û bi dîskûrên xwe yê neteweyî bandoreke mezin li ser neteweperweriya Kurdî kirine. Weke neteweperwerên civakên din rewşenbîrên Kurd jî li milet ango neteweyê formek qedîm dibînin. Di otobgiyografiya Kadrî Cemîlpaşa de ku berhema wî dikare weke hewldaneke lêkolîneke dîrokî jî were terîfkirin, di destpêkê de bi kurtasî derbarê dîroka kevn ya Kurdan agahî tê dayîn. Di berhemê de dîroka Kurdan ya li erdnîgariya Kurdistanê digihêje şeş hezar sal berê. Bi angaşta Kadrî Cemîlpaşa beriya zayînê çar hezar sal berê Kurd li erdnîgariya Kurdistanê belav bûn (Cemilpaşa, 2014: 20). Civakên antîk ên serdemên berê ên weke Hûrî, Lolo, Mîtanî û Med pêşiyên Kurdan na rasterast weke Kurd tên pêşkêşkirin. Cemîlpaşa angaştên xwe bi dîroknûsên cûda jî dixwaze qewîtir bike. Di berhemê de Kadrî Cemîlpaşa hewldana pûçkirina angaştên neteweperwerên Tirk tê dîtin. Agahiyên derbarê dîroka Kurdî bersiva binavkirina *dağlı türkler* – tirkên çiyayî- ya dîskûra kemalîst ya rêveberiya Tirkiyeyê ye. Nivîskar bi çavkaniyên cûda dixwaze cihêbûna Kurdan destnîşan bike. Di her sê otobiyografiyê de hewldaneke bi vî rengî tê dîtin. Kurdên qedîm, neteweya qedîm parçeyeke dîskûra neteweperwer ya rewşenbîran e.

Rewşenbîrên Kurd di qada nasnameyê de avakirina sînorê navbera Kurdbûn-Tirkbûnê di honandina nasnameya neteweyî ya Kurdî de şerta zarûrî didîtin. Ji ber vê yekê cûdahiyên di navbera koma navxweyî dihat kêmkirin û cûdahiya di navbera komên din jî dihat daxuyandin, esasen bi nasnameya neteweyî re xweyekkirina endamên komê bi vî awayî derdikeve di hemû koma însanan de. Rewşenbîr di otobiyografiyên xwe de texeyyula nasnameya neteweyî hemû cûdahiyan ji holê radike. Penaseya Kurdbûnê bi herêm, ol, mezheb an jî bi zaravayek ne sînorkirî ye. Kûrdbûn raserî wan hemû cûdahiyan hatiye honandin. Ji ber ku qada wan a tekoşînê ye, nivîskar bala xwe bêtir dane bakûr lêbelê di nezerê wan de tekoşîna Kurdên iraqê û Kurdên îranê ya ji yê wan ne cûdaye. Rewşenbîr beyî ku cûdahiyek bixin navbera wan di hemû heremên ku weke parçeyeke Kurdistan binav dikin, têkoşîn dane. Di otobiyografiyan de peywirên li wan herêman jî cî digre. Xweyekkirin asteke wisa bilind de ye ku Kadrî Cemîlpaşa berhema xwe îthafî Mele Mistefa Barzanî dike. Wî weke "rêberê bêmîsal rizgarkerê gel" binav dike (Cemilpaşa, 2014: 15). Berhema wî tekoşînên serdemê yên hemû herêmên Kurdistanê dihûndirîne.

Rewşenbîriya modem a Kurdî di honandina nasnameya Kurdi de hewl dida sinoren herêmi, zimanî û oli ji holê rake. Beriya wê tekoşînên Kurdan hem bi herêmên wan sînorkirî bû

hem ji şer û pevçûnên di navbera mîrektiyên Kurd rûdanên jirêzê bûn. Bo her sê rewşenbiran jî Kurd di nav dewletên cuda de hatine dabeşkirin û xwedan zarava û baweriyên cûda bin jî her yek endamê malbata Kurdevatiyê ye. Ji ber vê yekê dema behsa Kurdan tên kirin di otobiyografiyan de Kurd weke ku civatek homojen be tên texeyyulkirin Ekrem û Kadrî Cemîlpaşa li ser ol û baweriyên Kurdan ranawestin lêbelê otobiyografiya Nûrî Dersîmî de derbarê Elewîtî û Qizilbaşiyê agahiyen berfireh balê dikşîne. Dêrsim û struktura wê ya civaki di gelemperê otobiyografiya Nûri Dersîmî de xwe dide der Ev yek dikare bi rewşa taybet ya Dêrsim were ravekirin, ji ber ku ev herêm ji herêmên din yên Bakurê Kurdistanê ji aliyê ziman û baweriyê xwedan taybetmendiyên cihê ne. Her çend Nûrî Dersîmî li ser baweriya elewîtî, qizilbaşiyê raweste jî, yek ji sedema têkçûna tevgera neteweyî ya Kurdî de bêîtimadiya di navbera Kurdên Sunî û yên Elewî dibîne. Li gor wî rewşenbîrên Kurd da ku vê bêbaweriyê ji holê rakin peywirên xwe baş neanîn cî (Dersimi, 1992: 40). Dersîmî di vê bêîtimadiya her du aliyan de aligiriya terefekî nake. Vê yekê weke kêşeyeke navxweyî yê Kurdan teşhîs dike. Ol û mezheb di otobiyografiyan de yek ji astengên li pêşberî yekîtî û hişmendiya neteweyî derdikeve pêşberî me.

Dikare were gotin her sê rewşenbîr jî li hember nasnameya neteweyî xwedan nêzîkahiyek sekuler in. Bi temamî li hember baweriyê dernekevin jî sekna rexneyî tê dîtin. Otobiyografiya Kadrî Cemîlpaşa de pêvajoya misilmanbûna Kurdan bi awayekî nixûmandî tê rexnekirin. Li gor wî misilmanbûna Kurdan kir ku Kurd ji nasnameyên xwe yên resen dûrbikevin.

> “Kurd beriya Îslamiyetê xwedî edebiyateke dewlemend bûn. Piştî Îslamê, bi demê re, bi taybetî di dema siltanên Osmanî de, dilsoziya wan a bi xilafetiyê re bû sedem ku ew kesayetiyên xwe îhmal bikin û wek zimanê niviskî dev ji bikaranîna zimanê Kurdî ku zimanekî edebî yê dewlemend e, berdan.” (Cemilpaşa, 2014: 49)

Nûrî Dersîmî asta rexneyê zêdetir dike û fetihkirina erdnîgariya Kurdan ji aliyê artêşên îslamî weke dagirkerî pênase dike. Li gor wî îslam ne tercîhek dildar a gele Kurd e, encameke vê dagirkeriyê ye.

> “Weke ku tê zanîn di destpêka sedsala 7an de êrîşa Ereban ya li ser herêma Kurdistanê dest pê kir. Di dema Xelîfe Omer de seferek li ser Îran û Kurdistanê hate destpêkirin û di encama şerê Qadsiyê de Îran û Kurdistan bi temamî ji aliyê leşkerên Ereb ve hatin têkbirin û bi zorê Îslamiyetê qebûl kirin. Kurdên ku ji bo parastina welatê xwe çek hilgirtin, bi hovîtî hatin ber şûrê, yên ku bêparastin mabûn, hatin girtin û li bazaran hatin firotin” (Dersimi, 1992: 151)

Di texeyyula nasnameya Kurdî de her sê rewşenbîr jî serî li hamasete nadin. Penaseya wan a Kurdbûnê anjî li ser Kurdîtiyê, şîroveyên wan ên derbarê nasnameya Kurdî bes bi pesindayînê ne sînorkirî ye. Di otobiyografiyan de berovajî dîskûra neteweperwer raserîbûna Kurdan nayê angaştkirin. Heta li hember civakê nêzîkahiyek rexneyî balê dikşîne. Kadrî Cemîlpaşa Kurdan bi taybetmendiyên erênî pênase dike. Li gor wî Kurd di gelek qadan de xwedan xisletên berz in lêbelê Kadrî Cemîlpaşa vê yekê beyî ku Kurdan bi civakeke din bide ber hev dike.

> "Nifşa Kurdan ya îroyîn jî, ku min bi kurtî behsa qerekter, erdnigarî û dîroka wan kir gelek balkêş e. Bi fîzyolojiya xwe xurt, zexm û saxlem; bi çalakiyên xwe ve cotkar, şivan û hilberîner; bi cewhera xwe dirust, comerd, xêrxwaz û dilovan; Kurdên îroyîn ên ku bi armanc û îdealên xwe azadîxwaz û demokrat in. ….. Mêvanperweriya Kurdan di nav gotinên pêşiya da jî tê qalkirin." (Cemilpaşa, 2014: 26)

Kadrî Cemîlpaşa tenê pozisyona jinan ya di civaka Kurdan bi civakê rojavayî dide ber hev. Bo rewşenbîrên serdemê rojava mînaka civaka îdeal e.

> "Dijminê ku bi çeka wî di dest de li dijî wî şer bike kî be, dema têk diçe, bo Kurda dibe mêvanê bi rûmet. Di mijarê heqên jinan de zîhniyeta Kurd ji zîhniyeta Rojavayî ne kêmtir e. Di şer de, aştiyê de, çi dost û çi dijmin be, Kurd destnadin jin e, bi hurmet bejna xwe li ber wan ditewînin û weke hebûneke pîroz tê nas kirin. Jina Kurd nişaneya haya û hîcabê ye, lê xwe venaşêre jî û ji civaka mêran nareve. Her tim hatiye dîtin ku jinên Kurd li gelek cihan weke şûngirên mêran postê serokatiyê digirin. Keç û jinên ku bi mêran re beşdarî dîlanan dibin, bi mêran re di şer de jî hevaltî dikin. Di nava Kurdan de hesta îteatkirina emanetê di asta herî jor de ye. Li Rojhilatê di hemû karên ku pêdiviya wan bi hestê berpirsiyariyê heye de, em Kurdan dibînin. Li ber Kurda bo qelsan dilovaniyeke kûr heye" (Cemilpaşa, 2014: 27)

Lêbelê ligel vê terîfê Ekrem Cemîlpaşa û Nûrî Dersîmî di otobiyografiyên xwe de derbarê Kurdan xwedan dîskûreke rexneyî ne. Di berhema Ekrem Cemîlpaşa de di gelek cihan têgaha kurdên cahil tê bikaranîn û li gor îmaja ku tê hêzkirin Kurd bi rêya mele, şêx an jî axayan bi hêsanî dikarin werin xapandin, ne xwedan hişmendiyek civakî û polîtîk in (Cemilpaşa, 2016: 58). Heta *Kürdistan Teali Cemiyeti* di wê serdemê bo vê probleme çareser bike, biryar digre ji bo gel hişyar bike bo vê yekê jî dixwaze xwendekaran bişîne Kurdistanê. Ji bo "riya rast nîşanî kurdên cahil bike" (Cemilpaşa, 2016: 57). Di wê serdemê helbet hem bajarîbûn hem jî perwerdeyîbûna Kurdan pir qels bû. Aktorên lokal ên weke şêx, mele, û axayên eşîretê li ser

civakê badoreke mezin bûn ligel vê xebat û çalakiyên rewşenbîriya modern ya Kurdî li Kurdistanê sînordar bû. Ekrem Cemîlpaşa derbarê rewşa civakê rexneyek li ser rewşenbîrên serdemê nake. Xebatên ku navenda wan Stenbol bû her çend nîqaşên vegera Kurdistanê kiribin jî heta hilweşîna Osmanî li dîasporayê man. Weke ku Bajalan (2010) jî destnîşan dike rewşenbiriya serdema pêşîn biyaniyên Kurdan û Kurdistanê bûn. Ji ber vê yekê dema li rewşa civakê dinêrtin civatek wisa didîtin: Kurd cahil û nezan, ji aliyê şêx û axayan an jî rêveberên dewletê bi hêsanî dikarin werin beralîkirin. Kêmasiya girseyeke biperwerde ji aliyê Nûrî Dersîmî jî tê îfadekirin li gor wî yek ji sedemên mezin ê têkçûna tevgerên Kurdî ew bû, civatek biperwerde tune bû ku li hember propagandayên dewletê raweste (Dersimi, 1992: 40).

Herçend di otobiyografiyan de derbarê rewşa civakî îmajek reşbîn derkeve holê jî nivîskar hêviyên xwe diparêzin. Ligel encamên trajik ên serhildanên Kurdî rewşenbîr di otobiyorafiyan de ji pêşerojê hêviyên xwe qut nakin. Ev yek dikare weke encameke dîskûra neteweyî bê xwendin. Lêbelê dîsa rewşenbîr ji civakê xwe bawer in. Ev bawerî motîvasyona sereke ya nivîskaran e ku bi vê baweriyê weke *rewşenbîrên Kurd* dixebitin û têdikoşin.

> “Eger tiştekî teqez hebe, tu şik û guman tune ye ku miletê kurd yê xwedî wijdan di her kêliyê de şiyar bibe. Hişyariya ku di nav miletê kurd de tê dîtin û eleqeya ji bo bidestxistina armanca neteweyî, nişan dide ku rizgarbûna ji bin nîrê tirkan ne dûr e.” (2014: 48).

> “Bi rastî jî nabe ku em bawer nekin ku ji bo me qîmeteke mezin e ku em hebûna xwe, zimanê xwe û hebûna xwe ya kolektîf li welatê xwe bi esaret û zilmê biparêzin. Ji ber ku bext û şens dê rojekê bi miletê kurd bikene; zulm wê bimire; rojê serxwebûn, edalet û azadiyê dê li ber vî miletê kurd ê qehreman ê bindest û mexdûr, ku hebûna xwe li ser welatê xwe diparêze çêbibe.” (1992: 66-67).

ENCAM

Di vê xebatê de li ser otobiyografiyên sê rewşenbîrên Kurd hate rawestan: Ekrem Cemîlpaşa, Kadrî Cemîlpaşa û Nûrî Dersîmî. Rewşenbîrên ku hemçaxê hev in, heman dorhêla rewşenbîriyê jî parvedikin. Di heman serdemê de xebatên polîtîk ên Kurdî nas kirin û têkoşînên hevpar dan. Di otobiyografiyên her sê rewşenbîr de jî nasnameya neteweyî derdikeve pêş. Vegotin li ser wê hatiye avakirin. Rewşenbîrên Kurd otobiyografiyan di çarçoveya berpisyariya civakî de nivîsîne.

Her sê rewşenbîr jî otobiyografiyên xwe bi zimanê Tirkî nivîsandine. Ji ber naveroka wan a polîtîk ji bo otobiyografiyan Tirkî hatiye bijartin. Rewşenbîrên Kurd di berhemên xwe yên siyasî û propagandîf de bi armanca avakirina rayek gîştî li Ewrûpa an jî li Tirkiyeyî, peyda bikin, zimanên biyanî bikartînin. Kurdî xwedan qadeke teng û berhemên bi vî zimanê tenê bigihêje girseyek biçûk ê xwîneran. Her sê rewşenbîr jî dikare were gotin bi vê endîşeyê bîranînên xwe bi zimanê tirkî nivîsandin, nivîsîna otobiyografî bo wan bes ne îtîraf an jî afîşekirina bûyeran bû di heman demê de bîranînên xwe weke parçeyeke veguhestina rastiyên dîrokî didîtin. Nivîsîna otobiyografiyan ji bo wan parçeyeke tekoşîna Tevgera Kurdî ye.

Otobiyografî çîrokên jiyana şexsî ne. Nivîskar bi rêya otobiyografiyan qismên jiyana xwe ya nayê zanîn, eşkere dikin. Lêbelê otobiyografiyên rewşenbîran de çîroka tevgara Kurdî tê ravekirin. Nivîskar rol û cihê yê di nava Tevgera Kurdî rave dike di berhemê de. Jiyana wan bi rêya tevgera Kurdî watedar dibe, otobiyografiyên xwe dinivîsînin ji ber ku ew parçeyeke tekoşîna Kurdî ye. Di otobiyografiyên her sê rewşenbîrên Kurd de geşedana nasnameya Kurdî bi rêya avabûna hişmendiya polîtîk derketiye holê, di destpêkê de nasnameya neteweyî, tenê weke amrazek hevgirtina civakî di navbera kesan de tê xuyan lêbelê bi tesîra perwerdehiya modern ev hevgirtin huviyetek siyasî wergirtiye. Otobiyografî pêvajoya veguherîna wesfa nasnameyê der dike. Di zayîna hişmendiya neteweyî ya rewşenbîran de bandoreke mezin ê atmosfera polîtîk ya serdemê heye. Kurdbûn ji ser tevgerên civakî yên din hatine avakirin. Dîskûra neteweperwer ya rêveberên serdemê, geşedana nasnameya Kurdî ligel rewşenbîran leztir kiriye.

Jiyana takekesî ya nivîskaran di otobiyografiyan de di peywendiya Kurdeyatiyê de tê pêşkêşkirin. Ji ber vê yekê derbarê malbata xwe de – jin û zarok- agahiyek hêja nayê dîtin, her sê rewşenbîr jî qet behs jin û zarokên xwe nakin. Malbat û zarok li ber bûyerên din weke tekoşîna nasnameyî û Kurdeyatiyê hûrgiliyên biçûk tên dîtin. Ji ber vê yêkê di otobiyografiyên rewşenbîrên Kurd de em têkîliyên malbatî, jiyana taybet nabînin. Bûyerek an jî kesek girêdayî

Kurdewariyê be hêjayî nivîsîne hatine dîtin, ev yek bo malbatê jî wisa yê. Rewşenbîr weke şexs di otobiyografiyan de nayê xuyan. Mijar hevpar bin jî sê teşeya cûda yê otobîyografiyê tê dîtin Ekrem Cemîlpaşa di berhema xwe de bêtir bala xwe dide dorhêla xwe ya biçûk û tecrubeyên xwe yên şexsî, Kadrî Cemîlpaşa hewl dide panoramayeke gîştî ya tevgerên serdemê xêz dike, Nûrî Dersîmî zêdetir li ser bawerî û strûktura civakî ya Dêrsim radiweste.

Rewşenbîrên Kurd yên pêşîn bi bandora atmosfera siyasî ya serdemê-dawiyên sedsala nozdemîn destpêka sedsala bîstemîn- bi wesfa xwe ya modern derdikeve pêş. Neteweperweriya Kurdî ya tradîsyonel ku xwe di berhemên du helbestvanên mezin ên edebiyata Kurdî de destnîşan dike- Ehmedê Xanî, Haci Qadirê Koyî- her çend bingeha vê Kurdeyatiyê pêk bîne jî rewşenbîrên Kurd bêtir ramanên rojavayî sûde wergirtine. Texeyyula nasnameya neteweyî ya rewşenbîrên Kurd xwe dispêre ramanên roşanger ya Ewrûpa-navendî. Xwedan wesfên pêşîneger û sekuler e. Neteweperwerî bes ne îqtîdarxwaziyek li terîtoryayekî ye, daxwaz desthilatdariya neteweyî ye û xwedan wesfek civakparêz e. Dewlet ango statuya siyasî bi endîşeyên civakî tên parastin. Ji ber vê yekê otobiyografiyan de kêşeyên civakî yên Kurdan girêdayî vê tê nîqaşkirin. Problema yekîtiya kurdan k udi otobiyografiyan de tê nîqaşkirin esasen nîşaneya nebûna hişmendiya neteweyî ye.

Texuyyula nasnameya neteweyî bi rêya tevgerên neteweyî yên serdemê teşe digre. Û bandora eşkere ya rewşenbîran li ser qerekterê nasnameya neteweyî ya Kurdî de heye. Haviya-yên din- nasnameya Kurdî li gor şer û mercên polîtîk diguherin. Otobiyografiyan de Kurd neteweyek bê perwerde û nezan lêbelê ligel vê egîd, merd û camêr tên sêwirandin. Bawerî û strukturên tradîsyonel astengên sereke yên li pêşberî yekîtiya gelê Kurd tên dîtin. Feraseta wan a nasnameyî sînorên sîyasî û cûdahiyên olî, mezhebi, çandî û zaravayî ji holê radike. Pênaseya wan a Kurdîtiyê berfireh û hemûgir e. Kurbûn di fîkrîyata wan de di bin banê xwe de hemû bawerî, zarava, devok û çandên herêmî dihundirîne.

ÇAVKANÎ

Aksoy, N. (2009) *Kurgulanmış Benlikler Otobiyografi, Kadın, Cumhuriyet* (Çapa Yekem). İstanbul: İletişim

Alan, R. (2019). *Keşkûl* (Çapa Yekem). İstanbul: Peywend

Altuntek, N. S. (1993) İlk Türk Matbaasını Kuruluşu ve İbrahim Müteferrika. *Hacettepe Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Dergisi.* 10 (1), 191-204.

Anderson, B. (2015). *Hayali Cemaatler: Milliyetçiliğin Kökenleri ve Yayılması* (Çapa Heştem). (İskender Savaşır, Wer.) İstanbul: Metis

Ardalan, S. (2007). *Osmanlı ve İran İmparatorluğu Arasında Erdalan Kürtleri* (Çapa Yekem). (Heval Bucak, Wer.) İstanbul: Avesta

Arendt, H. (2014). *Totalitarizmin Kaynakları 1: Antisemitizm* (Çapa Pêncem). (Bahadır Sina Şener, Wer.) İstanbul: İletişim

Aron, R. (1979). *Aydınların Afyonu* (Çapa Yekem). (İzzet Tanju, Wer.) İstanbul: Tur

Arslan, H. (2007). *Epistemik Cemaat Bir Bilim Sosyolojisi Denemesi* (Çapa Duyem). İstanbul: Paradigma

Assmann, J. (2015). *Kültürel Bellek: Eski Yüksek Kültürlerde Yazı, Hatırlama ve Politik Kimlik* (Çapa Duyem). (Ayşe Tekin, Wer.) İstanbul: Ayrıntı

Bajalan, D. R. (2010). *Jön Kürtler, Birinci Dünya Savaşı'ndan Önce Kürt Hareketi 1898-1914* (Çapa 1em). (Burcu Yalçınkaya, Wer.) İstanbul: Avesta

Bauman, Z. (2015). *Sosyolojik Düşünmek* (Çapa Dozdehem). (Abdullah Yılmaz, Wer.) İstanbul: Ayrıntı

Bauman, Z. (2017). *Yasa Koyucular ile Yorumcular: Modernite, Postmodernite ve Entelektüeller Üzerine* (Çapa Çarem). (Kemal Atakay, Wer.) İstanbul: Metis

Bauman, Z. (2019). *Kimlik: Benedetto Vecchi Tarafından Gerçekleştirilmiş Söyleşiler* (Çapa Duyem). (Mesut Hazır, Wer.) Ankara: Heretik

Baysan, G. T. (2002). Dreyfus Davası: Gerçek ve Adalet Savaşçısı Zola. *Hacettepe Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Dergisi,* 19(1), 181-195

Bedirhan, E. (1991a). Îtîzar. Di nava M. E. Bozarslan (Amd.). *Kurdistan Rojnama Kurdî Ya Pêşîn & İlk Kürd Gazetesi 1898-1902 Cild 1.*(309-316) Uppsala: Deng

Bedirhan, E. (1991b). Daxwaza Îtalyaye li ser Libyayê. Di nava M.E. Bozarslan (Amd.). *Kurdistan Rojnama Kurdî Ya Pêşîn & İlk Kürd Gazetesi 1898-1902 Cild 1.*(286) Uppsala: Deng

Bedirhan, M. M. (1991c). Bîsmîllahîrrehmanîrrehîm. Di nava M. E. Bozarslan (Amd.). *Kurdistan Rojnama Kurdî Ya Pêşîn & İlk Kürd Gazetesi 1898-1902 Cild 1.*(111- 118) Uppsala: Deng

Bedirhan, C. Â. (1997). Günlük Notlar 1922-1925 (Çapa 2yem).(Malmîsanij, Amd.) İstanbul: Avesta

Bedirxan, C. A. (1997). *Kürt Sorunu Üzerine*. (Çapa Yekem). (Taylan Doğan Wer.) İstanbul: Avesta

Bedirxan, E.C. A. (2010). *Bir Kürt Aydınından Mustafa Kemal'e Mektûb.* (Çapa Yekem) İstanbul: Doz

Beg, M. E. Z. (2011). *Kürtler Ve Kürdistan Tarihi: Tarihin Eski Devirlerinden Günümüze* (Çapa 3yem). (Vahdettin İnce, Mehmet Dağ, Reşat Adak, Şükrü Aslan, Wer.) İstanbul: Nûbihar

Benda, J. (2017). *Aydınların İhaneti* (Çapa Sêyem). (Cem Soydemir, Wer.) Ankara: Doğu Batı

Belge, M. (2007). Batılılılaşma: Türkiye ve Rusya. Di nava T. Bora û M. Gültekingil. *Modern Türkiye'de Siyasi Düşünce: Modernleşme ve Batıcılık* (3, 43-55) İstanbul: İletişim

Berkes, N. (2019). *Türkiye'de Çağdaşlaşma* (Çapa Bîstûheştem). İstanbul: Yapı Kredi

Bilgin, N. (2007). *Kimlik İnşası* (Çapa Yekem). İzmir: Aşina

Bilgin, N. (1995). *Evrenselcilik-Farkçılık Geriliminde, Kollektif Kimlik* (Çapa Yekem). İstanbul: Sistem

Billig, M. (2002). *Banal Milliyetçilik* (Çapa Yekem). (Cem Şişkolar, Wer.) İstanbul: Gelenek

Bruinnessen, M. V. (2015). *Ağa, Şeyh, Devlet* (Çapa 9em). (Banu Yalkut, Wer.) İstanbul: İletişim

Bodin, L. (2000). *Aydınlar* (Çapa Duyem). (Mehmet Dündar, Wer.) Ankara: Gündoğan

Bottomore, T. B. (1997). *Seçkinler Ve Toplum* (Çapa Duyem). (Erol Mutlu, Wer.) Ankara: Gündoğan

Boyîk, E. (2019). *Çanda Kurdên Sovyetê* (Çapa Yekem). Diyarbakır: Peywend

Cegerxwîn (2003). *Hayat Hikâyem.* (Çapa Yekem) (Gazi Fincan Wer.) İstanbul: Evrensel

Cemilpaşa, E. (2016). *Muhtasar Hayatım* (Çapa Sêyem). İstanbul: Avesta

Cemilpaşa, K. (2014). *Doza Kurdistan, Kürdistan Davası, Kürt Milletinin 60 Seneden Beri Esaretten Kurtuluş Savaşı Hatıratı* (Çapa Yekem). İstanbul: Avesta.

Celil, C. (2013). *Kürt Aydınlanması* (Çapa Duyem). (Arif Karabağ, Wer.) İstanbul: Avesta

Celîl C. (2019). *Otobiyografiya Ebdurezaq Bedirxanî* (Çapa Yekem) Diyarbakır: Wardoz

Chirguh, B. (2009). *Kürt Sorunu Kökeni ve Nedenleri* (Çapa Yekem). (Nihat Nuyan, Wer.) İstanbul: Avesta

Chomsky, N. (2013). *Entelektüellerin Sorumluluğu* (Çapa Sêyem). (Nuri Ersoy, Wer.) İstanbul: Bgst

Çağan, K. (2005). Entelektüel İmgesi Üzerine. Di Nava K. Çağan. *Entelektüel ve İktidar*. (9-22) Ankara: Hece

Çeçen, R. (2016). Di Nav Modernîzayonên Der-Ewrûpî de Tecrûbeya Kurdan. *Nûbihar Akademî*, 2 (6), 11-45.

Çeçen, R. (2017). Qonaxa Stenbolê di Edebiyata Kurdî ya Modern de. *Nûbihar Akademî*, 2 (8), 41-63.

Çiğdem, A. (1993). *Aydınlanma Felsefesi* (Çapa Yekem). İstanbul: Ağaç

Çiğdem, A. (2007). "Türk Batılılaşması"nı Açıklayıcı Bir Kavram: Türk Başkalığı; Batılılaşma, Modernite ve Modernizayon. Di nava T. Bora û M. Gültekingil (Ed.). *Modern Türkiye'de Siyasi Düşünce: Modernleşme ve Batıcılık* (3, 68-73) İstanbul: İletişim

Dersimi, N. (1992). Dersim'e ve Kürt Milli Mücadelesine Dair Hatıratım (Çapa Yekem) Ankara: Öz-Ge

Dirilen Gümüş, Ö.(2016) Çatışma ve Çatışma Yönetiminin Sosyal Psîkolojîk Temelleri. Ö.Dirilen Gümüş, (Ed.), di nava *Siyaset Psikolojisi 2* (Çapa 1em) (89-117). Ankara: Nobel

Ekinci, T. Z. (2006). *Türkiye'nin Çağdaşlaşması ve Kürtler; Makaleler, Konferanslar, Söyleşiler* (Çapa Yekem). İstanbul: Pêrî

Ergün, Z. (2015). Gotara Dijkolonyal Û Wêneyê Serdestiya Tirkan Di Kovara Hawarê De. *Monograf* (3) 400-437.

Ergün, Z. (2017). *Nerît û Helbest, Nerîta Neteweyî di Helbesta Nû ya Kurdî de (1880-1970)* (Çapa Yekem). İstanbul: Nûbihar

Eriksen, T. H. (2002). *Etnisite ve Milliyetçilik Antropolojik Bir Bakış* (Çapa Yekem). (Ekin Uşaklı, Wer.) İstanbul: Avesta

Foucault, M. (2016). *Entelektüelin Siyasi İşlevi* (Çapa Çarem). (I. Ergüden, O. Akınhay, F. Keskin, Wer.) İstanbul: Ayrıntı

Gellner, E. (2018). *Uluslar ve Ulusçuluk* (Çapa Sêyem). (Büşra Ersanlı û Günay Göksu Özdoğan, Wer.) İstanbul: Hill

Giddens, A. (1994). *Modernliğin Sonuçları* (Çapa Yekem). (Ersin Kuşdil, Wer.) İstanbul: Ayrıntı

Gleason, P. (2014). Kimliği Tanımlamak: Semantik Bir Tarih. Di nava F. Mollaer. *Kimlik Politikaları; Özdeşlik, Tanınma ve Farklılık*. (21-52) Ankara: Doğu Batı

Goff, J. L. (2017). *Ortaçağda Entelektüeller* (Çapa Duyem). (Mehmet Ali Kılıçbay, Wer.) İstanbul: Türkiye İş Bankası Kültür

Gouldner, A. W. (1993). *Entelektüelin Geleceği* (Çapa Yekem). (Ahmet Özden, Nuray Tunalı, Wer.) İstanbul: Eti

Gramsci, A. (1967). *Aydınlar ve Toplum* (Çapa Yekem). (Vedat Günyol, Ferit Edgü, Bertan Onaran, Wer.) İstanbul: Çan

Gramsci, A. (2016). *Hapishane Defterleri; Tarih, Politika, Felsefe ve Kültür Sorunları Üzerine Seçme Metinler* (Çapa Duyem). (Kenan Somer, Wer.) Ankara: Sol

Gürpınar, D. (2013). *Türkiye'de Aydının Kısa Tarihi* (Çapa Yekem). İstanbul: Etkileşim

Im Hof, U. (2004). *Avrupa'da Aydınlanma* (Çapa Yekem). (Şebnem Sunar, Wer.) İstanbul: Literatür

Issı, M. (2013). Kürt Basını ve Kürdistan Gazetesi (1898-1902). *e-şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi* (9), 127-147.

Halbwachs, M. (2016). *Hafızanın Toplumsal Çerçeveleri* (Çapa Yekem). (Büşra Uçar, Wer.) Ankara: Heretik

Halbwachs, M. (2017). *Kolektif Hafıza* (Çapa Yekem). (Banu Barış, Wer.) Ankara: Heretik

Hanioğlu, Ş. (1981). *Bir Siyasal Düşünür Olarak Abdullah Cevdet ve Dönemi (*Çapa Yekem). İstanbul: Üçdal

Hanioğlu, M. Ş. (1985). *Bir Siyasal Örgüt Olarak Osmanlı İttihad Ve Terakki Cemiyeti Ve Jön Türklük (1889-1902)* (Çapa Yekem). İstanbul: İletişim

Hassanpour, A. (2005). Kürt Kimliğinin İnşası: Yirminci Yüzyıl Öncesi Tarihsel Ve Edebi Kaynakları. Di nava A. Vali(amd.) *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri.* (135-198). İstanbul: Avesta

Hilav, S. (2008). *Entelektüel ve Eylem: Düşünceler, Tartışmalar, Söyleşiler* (Çapa Yekem). İstanbul: Yapı Kredi

Hobsbawm, E. J. (2017). *1780'den Günümüze Milletler ve Milliyetçilik "Program, Mit, Gerçeklik"* (Çapa Şeşem). (Osman Akınhay, Wer.) İstanbul: Ayrıntı

Hobsbawm, E. (2006). Giriş: Gelenekleri İcat Etmek. Di nava E. Hobsbawm û T. Ranger (Amd.) *Geleneğin İcadı.* (1-18). İstanbul: Agora

Hogg, M. A. & Vaughan, G. M. (2011). *Sosyal Psikoloji* (Çapa Duyem). (İbrahim Yıldız & Aydın Gelmez, Wer.) Ankara: Ütopya

Hortaçsu, N. (2007). *Ben, Siz, Biz, Hepimiz* (Çapa Yekem). Ankara: İmge

Hroch, M. (2011). *Avrupa'da Milli Uyanış Toplumsal Koşulların ve Toplulukların Karşılaştırmalı Analiz.* (Ayşe Özdemir, Wer.) İstanbul: İletişim

Jeannire, A. (1994). Modernite Nedir?. Di nava M. Küçük. *Modernite Versus Postmodernite* (15-25) Ankara: Vadi

Johnson, P. (2008). *Entelektüeller* (Çapa Yekem). (Ayşe Polat, Wer.) İstanbul: Paradigma

Jwadieh W. (2012). *Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi: Kökenleri ve Gelişimi* (Çapa 7em). (İsmail Çeken & Alper Duman, Wer.) İstanbul: İletişim

Kant, I. (2005). Aydınlanma Nedir?. *Liberal Düşünce,* 10(38-39), 225-230

Karpat, K. H. (2019). *Osmanlı Modernleşmesi: Toplum, Kuramsal Değişim ve Nüfus* (Çapa Çarem). (Ceren Elitez, Wer.) İstanbul: Timaş

Kedourie, E. (2017) *Avrupa'da Milliyetçilik* (Çapa Yekem). (Haluk Timurtaş, Wer.) İstanbul: Köprü

Keskin, F. (2016). İktidar, Hakikat ve Entelektüelin Siyasi İşlevi. Di nava M. Foucault. *Entelektüelin Siyasi İşlevi.* (13-28) İstanbul: Ayrıntı

Koloğlu, O. (1992). *Osmanlı'dan Günümüze Türkiye'de Basın* (Çapa Yekem). İstanbul: İletişim

Koyî, H. Q. (2004). *Dîwan.* Sweden: Nefel. 10.10.2018, http://www.nefel.com/epirtuk/pdf/haci_qadire_koyi_diwan_02.pdf?NR:79

Larrain, J. (1995). *İdeoloji ve Kültürel Kimlik* (Çapa Yekem). (Neşe Nur Domaniç, Wer.) İstanbul: Sarmal

Lazarev M. S. û Mıhoyan Ş. X. (2013). *Kürdistan Tarihi* (Çapa Çarem). (İbrahim Kale, Wer.) İstanbul: Avesta

Lewis, B. (1993). *Modern Türkiye'nin Doğuşu* (Çapa Pêncem). Ankara: Atatürk Kültür, Dil ve Tarih Yüksek Kurumu Türk Tarih Kurumu

Lévy, B. H. (2002). *Entelektüellerin Övgüsü* (Çapa Yekem). (Halil Gökhan, Wer.) İstanbul: Gendaş Kültür

Lütfi. (2007). *20. Yüzyılın Başlarında Kürt Milliyetçi Söylemine Bir Örnek: Emir Bedirhan* (Çapa 1em). İstanbul: Bgst

Malmîsanij, û Lewendî, M.(1989). *Li kurdistana bakur û tirkiyê rojnamegeriya kurdî (1908-1981)*.(Çapa 1em). Uppsala: Jîna Nû

Malmîsanij. (2011). *İlk Kürt Gazetesi Kurdistan'ı Yayımlayan Abdurrahman Bedirhan (1868-1936)* (Çapa 2em). İstanbul: Vate

Malmîsanij. (2009). *Cızira Botanlı Bedirhaniler Ve Bedirhani Ailesi Derneğinin Tutanakları* (Çapa 3yem). İstanbul: Avesta

Mannheim, K. (2002). *İdeoloji ve Ütopya* (Çapa Yekem). (Mehmet Okyayuz, Wer.) Ankara: Epos

Mardin, Ş. (1991). *Türkiye'de Din ve Siyaset: Makaleler 3* (Çapa Yekem). İstanbul: İletişim

Mardin, Ş. (1991a). *Türk Modernleşmesi: Makaleler 4* (Çapa Yekem). İstanbul: İletişim

Mardin, Ş. (2008). *Jön Türklerin Siyasi Fikirleri 1895-1908* (Çapa Pazdem). İstanbul: İletişim

Mollaer, F.(2019). *Kimlik, Tanınma Mücadelesi ve Şarkiyatçılık Edward Said'in İzinde* (Çapa Yekem). İstanbul: Metis

Morgan, P. (2006). Bir Ölümden Bir Bakışa: Romantik Dönemde Gal Geçmişinin Peşinde. Di nava E. Hobsbawm û T. Ranger (Amd.) *Geleneğin İcadı.* (51-118). İstanbul: Agora

Oran, B. (1995). Azgelişmiş Ülkelerde Aydın ve Milliyetçilik. Di nava S. Şen (Ed.). *Türk Aydını ve Kimlik Sorunu.* (385-493) İstanbul: Bağlam

Özkırımlı, U. (1999). *Milliyetçilik Kuramları: Eleştirel Bir Bakış* (Çapa Yekem). İstanbul: Sarmal

Özoğlu, H. (2012). *Dewleta Osmanî Û Neteweperwerên Kurd* (Çapa 1em). (Ali Karadeniz, Wer.) İstanbul: Kitap

Parekh, B. (2014). Kimliğin Mantığı. Di nava F. Mollaer. *Kimlik Politikaları; Özdeşlik, Tanınma ve Farklılık.* (53-76) Ankara: Doğu Batı

Renan, E. (2019). *Ulus Nedir?* (Çapa Duyem). (Gökçe Yavaş, Wer.) İstanbul: Pinhan

Rojî Kurd.(2013).Gâye, Meslek. Di nava Koma Xebatên Kurdolojiyê(Amd). *Di Sedsaliya Wê De Rojî Kurd, 1913* (98-99) İstanbul: Enstituya Kurdî ya Stenbolê

Sarlo, B.(2012*) Geçmiş Zaman Bellek Kültürü ve Özneye Dönüş Üzerine Bir Tartışma (*Peral Bayaz Charum, Deniz Ekinci, Wer.) İstanbul: Metis

Sartre, J. P. (2014). 1961 Tarihli Baskıya Önsöz. Di nava F. Fanon. *Yeryüzünün Lanetlileri.* (15-39) İstanbul: Versus

Sartre, J. P. (2019). *Aydınlar Üzerine* (Çapa Yazdehem). (Ayse Bora, Wer.) İstanbul: Can

Sebrî, O. (2016). *Bîranînên Min*. (Çapa Yekem) Diyarbakır: Lîs

Sekban, Ş. M. (1998). *Kürt Sorunu* (Çapa 2yem). (Ş.Vedat, Amd.) İstanbul: Kamer

Sennet, R. (2013). *Kamusal İnsanın Çöküşü* (Çapa Sêyem). (Serpil Durak & Abdullah Yılmaz, Wer.) İstanbul: Ayrıntı

Serfiraz, M. (2015). *Kurd, Kitêb, Çapxane: Weşangeriya Kitêbên Kurdî Di Dewra Osmaniyan De (1844-1923)* (Çapa 1em). İstanbul: Peywend

Shayegan, D. (2002). Yaralı Bilinç, Geleneksel Toplumlarda Kültürel Şizofreni (Çapa Çarem). (Haldun Bayrı, Wer.) İstanbul: Metis

Shils, E. (2005). Entelektüeller ve İktidarlar. (Salih Özer, Wer.) Di Nava K. Çağan. *Entelektüel ve İktidar*. (9-22) Ankara: Hece

Schultz D.P. û Schultz S. E. (2007) *Modern Psikoloji Tarihi* (Çapa Yekem). (Yasemin Aslay, Wer.) İstanbul: Kaknüs

Smith, A. D. (1994) *Milli Kimlik*.(Çapa Yekem).(Bahadır Sina Şener, Wer.) İstanbul: İletişim

Smith, A. D. (2002) *Ulusların Etnik Kökeni*.(Çapa Yekem).(Sonay Bayramoğlu, Hülya Kendir, Wer.) Ankara: Dost

Tevfik. (1998). . Di nava M. E. Bozarslan (Amd.). *Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesi*. (39-40) Uppsala: Deng

Touraine, A. (2002). *Modernliğin Eleştirisi* (Çapa Çarem). (Hülya Tufan, Wer.) İstanbul: Yapı Kredi

Trevor-Roper, H. (2006). Geleneğin İcadı: İskoçya'nın Highland Geleneği. Di nava E. Hobsbawm û T. Ranger (Amd.) *Geleneğin İcadı.* (19-50). İstanbul: Agora

Tunaya, T. Z. (1960). *Türk Siyasî Hayatında Batılılaşma* Hareketleri (Çapa Yekem). İstanbul: Yedigün Matbaası

Tunaya, T. Z. (1988). *Türkiye'de Siyasi Partiler: Cild 1, İkinci Meşrutiyet Dönemi 1908-1918* (Çapa 2yem). İstanbul: Hürriyet Vakfı

Ülgener, S. F. (1983). *Zihniyet, Aydın ve İzm'ler* (Çapa Yekem). Ankara: Mayaş

Vali, A. (2013*). Kürt Karihi Kimliği Ve Siyaseti, Kuramsal Bir Yaklaşım -Makaleler Söyleşiler-* (Çapa 1em). (İbrahim Bingöl, Wer.) İstanbul: Avesta

Varol, F. S. (2016) Temsil, İdeoloji, Kimlik (Çapa Yekem). İstanbul: Varlık

Veroj, S. (2018). *Du Birayên Bedirxanî: Celadet Û Kamiran Bedirxan 1913-1923* (Çapa Yekem). Diyarbakır: Dara

Veroj, S. (2017). *Mewlanzade Rifat û Rojnameya Serbestî* (Çapa Yekem) İstanbul: İsmail Beşikçi Vakfı

Volkan, V. (2015) Büyük Grup Kimliği ve Barışı Sağlama. Ö. Dirilen Gümüş, (Ed.), di nava Siyaset Psikolojisi 1(Çapa 1em) (91-111). Ankara: Nobel

Zaza, N (2017). *Wekî Kurdekî Jiyana Min.* (Çapa Yekem) (Adil Qazî, Wer.) Diyarbakır: J&J

TC
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
TÜRKİYEDE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi

KÜRT AYDINLARININ OTOBİYOGRAFİLERİNDE ULUSAL KİMLİK TAHAYYÜLÜ (1908-1960): EKREM CEMİLPAŞA, KADRİ CEMİLPAŞA, NURİ DERSİMİ

ÖMER FIRAT BAVLİ

16711032

DANIŞMAN

Öğretim Görevlisi Dr. SHAHAB VALI

MARDİN 2022

TEXEYYULA NASNAMEYA NETEWEYÎ DI OTOBIYOGRAFIYÊN REWŞENBÎRÊN KURD DE (1908-1960): EKREM CEMÎLPAŞA, KADRÎ CEMÎLPAŞA, NÛRÎ DERSÎMÎ

Yazar Ömer Fırat Bavli

Gönderim Tarihi: 26-Nis-2022 10:38AM (UTC+0300)
Gönderim Numarası: 1820699698
Dosya adı: F_rat_Bavli.docx (204.44K)
Kelime sayısı: 39113
Karakter sayısı: 204894

TEXEYYULA NASNAMEYA NETEWEYÎ DI OTOBIYOGRAFIYÊN REWŞENBÎRÊN KURD DE (1908-1960): EKREM CEMÎLPAŞA, KADRÎ CEMÎLPAŞA, NÛRÎ DERSÎMÎ

ORİJİNALLİK RAPORU

%2	%2	%0	%1
BENZERLİK ENDEKSİ	İNTERNET KAYNAKLARI	YAYINLAR	ÖĞRENCİ ÖDEVLERİ

BİRİNCİL KAYNAKLAR

1	ia601701.us.archive.org İnternet Kaynağı	%1
2	Submitted to University of Zakho Öğrenci Ödevi	<%1
3	www.ezid.ru İnternet Kaynağı	<%1
4	www.kurdipedia.org İnternet Kaynağı	<%1
5	bianet.org İnternet Kaynağı	<%1
6	acikbilim.yok.gov.tr İnternet Kaynağı	<%1
7	www.ronahiyaislam.com İnternet Kaynağı	<%1
8	Submitted to The Scientific & Technological Research Council of Turkey (TUBITAK) Öğrenci Ödevi	<%1

9	ku.wikipedia.org İnternet Kaynağı	<%1
10	Submitted to Istanbul Aydin University Öğrenci Ödevi	<%1
11	pdffox.com İnternet Kaynağı	<%1
12	www.kovaradilop.net İnternet Kaynağı	<%1
13	disa.org.tr İnternet Kaynağı	<%1
14	pt.scribd.com İnternet Kaynağı	<%1
15	www.rojev.com İnternet Kaynağı	<%1
16	Submitted to Canakkale Onsekiz Mart University Öğrenci Ödevi	<%1
17	birartibir.org İnternet Kaynağı	<%1
18	www.tandfonline.com İnternet Kaynağı	<%1
19	archive.org İnternet Kaynağı	<%1
20	sabihaotlu.blogspot.com	

İnternet Kaynağı

<%1

21 www.kovarabir.com
İnternet Kaynağı

<%1

Alıntıları çıkart Kapat

Bibliyografyayı Çıkart Kapat

Eşleşmeleri çıkar < 5 words

Tez Başlığı: **Texeyyula Nasnameya Neteweyî Di Otobiyografiyên Rewşenbîrên Kurd De (1908-1960): Ekrem Cemîlpaşa, Kadrî Cemîlpaşa, Nûrî Dersîmî**

Yukarıda başlığı gösterilen tez çalışmamın kapak sayfası, giriş, ana bölümler ve sonuç kısımlarında oluşan toplam 113 sayfalık kısmına ilişkin 26/04/2022 tarihinde Türkiyede Yaşayan Diller Enstitüsü Müdürlüğü tarafından ‘‘Turnitin’’ adlı intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtrelemeler uygulanarak alınmış olan orjinallik raporuna göre, projemin benzerlik oranı % 2’dir.

Uygulanan Filtrelemeler:

Kaynakça Dahil

Alıntılar Hariç

Açıklamalar:
Mardin Artuklu Üniversitesi ‘‘Turnitin’’ adlı intihal tespit programı sonucunda; azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içermediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Adı Soyadı: Ömer Fırat Bavli
Öğrenci No: 16711032
Programı: Tezli Yüksek Lisans
Statüsü: Mezun

Tarih ve İmza
05.05.2022

Danışman Adı Soyadı
Dr.Öğr.Üyesi Shahab VALI

İmza